



bang a h e q j i kelhaamed

kovara Îslamî çandî û hunerî

Sal: 2 • Jimar: 4 • Bihar 2010 • Biha: 5 TL


Wîladeta Pîroz e Em xwe berdin meydana



Hevpeyvîn:
Abdulkadir Badıllı



Qewmîyet



Elfaba Kurdî



سَرخوَبوَن

Serî Hildane Xortê Me

*Erê qurban eger ku tu musulmanî
Ji xew rabe bes e îdî perîşanî
Binêre çar teref wek şêr lî ber kufrê
Serî hildane xortê me dîlovanî*

*Lî Kurdîstan û Keşmîr û lî Lubnanê
Fillistîn û Cezayîr qewmê Çaçanê
Diçin mirnê weke ku herne dîlanê
Jî xwe zîndan tije kirne bî mêranî*

*Dirêj nakim lî ber çavê te ye dînya
Heger guh dêre exbara dîkî zanî
Weke şêra tu jî rabe bikev rex wan
Xwe nişan de tu jî ma qey ne wek wanî*

*Bes e vê kufr û zulmê pîr 'umur kîr bes
Bes e bêgîretî ger tu bî îmanî
Wekî ecdadê xweyî pêşî ser hilde
Bî Quranê heger bî jî dil ku tu jî wanî*

*Jîbîr kirne te ew bapîrê wek şêra
Ketî rex dujminê wan de bî dostanî
Bilîndke ala 'ilmê Nursiyê Nurî
Tivînga Şêx Seîdê Palo Pîranî*

*Tuwê hingî wekî şahîn û wek baza
Bilînd bîfrî dî her meydan û zozanî
Kîye wê dem bikarbe-j ter were meydan
Bîra wek Heyderê Kerrar dî her şanî*

Dengê Ummeta Îslam



بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

Ji Weşankar

B

ismihî Subhanehû

We in min şey in illa yusebbihû bihemdihî

Bihar e... Di destpêkek nû de em ji rebbê 'alemê re, hemd û şukrê xwe teqdîm dikin. Ew e, ê ku careke din, di biharekê de em gihandin hevdu. Ew e, ê ku di demsala biharê de navên xweyî xweşik û delal bi me dane/dide temaşekirin.

Em ji biharê hezdikin. Lewra wek Bediuzzeman dibêje: "Hezkirina biharê jiber temaşekirina sen'etên îlahî ye." Belê "Di her demsala biharê de, bi Hakîmtî, bi Besîrtî, bi Kerîmtî fe'alîyet destpêdikin û sen'etên muhteşem tene çêkîrin. Û tê dîtîn; ku ev fe'alîyet hemû bi sur'et, rihetî û ahengdar çêdibin. Aha! Ev fe'alîyetên muhteşem mohrê zatekî wilo ne; ku ne li tu ciyî ye, belê li her derê bi 'ilm û qudreta xwe hazir û nazir e." (Bediuzzeman, Mesnewî-î Nûrîye)

"Bizanbe ey 'ezîz! Di 'alemê de tesaduf tune. Belê, bîlxasse di demsala biharê de, di bexçê dunyayê de, di hemû şagên dara de, di pelên çiçeka de, di simbilên mezru'atan de bilbilên hikmetê, ayetên hikmetê dixweynin. Heger bi guhên baweriyê, bi çavên basîretê bêne guhdarîkirin, ewê şeytanên tesadufê jî, qebl bikin û bibne heyran." (Bediuzzeman, Mesnewî-î Nûrîye)

"Ev heyata dinyayê, riknê baweriyê bi axretê qet'î îspat dike û di her biharê de ji sêsed hezarî zêdetir nimuneyên heşrê nîşanî çavê me dide... Ji biharê bipirse, bê çawa tê van nava sehbike: "Ya Hannan, ya Rahman, ya Rahîm, ya Kerîm, ya Latîf, ya 'Atûf, ya Musawwîr, ya Munewwîr, ya Muhsîn, ya Muzeyyîn" (Bediuzzeman, Peyva Bîst û Çara)

Şêx Ahmedê Xanî jî berya Seydayê Bediuzzeman bi çend sed sala wiha gotiye: "Di fesla nûbeharê da digel dilber biçin geştê/Ji ew xweştir 'umir nabit, li min ew hal qewî xweş tê."

Belê; bihar mihabbeta îlahî ya heqîqî dixwaze. Şahî û xweşî jî di mihebbetê de ye. Her çiças sohtin û derd û cefa hebe jî. Ji lew seydayê eşqê Melayê Cizîrî dibêje: "Muhbetê mihnet di zor in, hub dibêm bêşek bela ye/'Umir jî xweş pê diborin, sotin û derd û cefa ye"

Xweşiya 'umr, wek seydayên mezin anîne ziman, bi naskirin û hezkirina Allah te'ala ye. Xweda vê xweşiyê bike nesîbê me teva. Îro em dilgeşî û şahîyêke din te'm dikin. Ew jî wek Seyda Mela Mizgîn dibêje: "Behara me xemilî/ Bi gula pir kemilî/Xortê meyê Musliman/Dixweynin wek bulbulî"

Belê; piştî zivistanek şedîd, elhemdulillah bihareke Muhammedî bi ser me de hatiye/hino hino tê. Di meha biharê de "Wiladeta Pîroz" jî heye. Wiladeta mehsulê muhebbetê... Wiladeta Hezret-î Muhammed 'eleyhisselat û wesselam... Divê em bi xatirê, vebûn û çêbûna vê gula Muhammedî, bihara ebedî ji rebbê xwe bixwazin. Ew jî bi girêdana sunneta pêxember mimkun e.

Digel teqdîma vê jimara "Kelhaamed" ya biharê, ku di xwe de nivîs û helbestên li ser eşqa pêxember, tewsiyên Resulullah, şîretên qenc, fikrên bi îstîqamet û bîranîna hinek salvegera, dicivîne, em banga pîrozkirina "Wiladeta pîroz" li xwendevanên hêja dikin. Elhemdulillah eva çend sale ku gelê Kurdistanê "Wiladeta pîroz" bi "Civîne 'Umumî" bibîr tîne, kêfxweşiya xwe îlan dike, 'ehd û soza xwe bi resulê Xweda re nû dike. Îsal jî, wek çend sala ku tê kirin, em hevîdarin ji rebbê xwe, ku ewê milletê meyî musliman li Diyarbekir, li Batmanê, li Edenê, li Mêrdîn, li Cizîrê, li Wanê, li Stenbol û hemu bajar û qezayan; hetta belkî li gundên xwe, kêfxweşiya "Wiladeta Pîroz" bi "Civîne 'Umumî" îlan bikin.

Naxwe werin, bi eşqa Muhammedî di vê biharê de jî "Em xwe berdîna meydana" û kêfxweşiya xwe teqdîmî ruhanîyeta "Şahê Nubuwwetê", "Hebîbê Xweda", "Bavê Hesen û Huseyn" bikin. Bi civîn û kombûnê xwe em bêjin: "Tu bi xêr û serçava hatî ya Resulullah! Rohniya çavê me, heyata dilê me, gul û çiçeka bihara me... Tu bi xêr hatî..."

✍ M. Tahir Soranî

Banga Me Yekîtiye.....	'Emerê Wezrînî.....	3
Mezandina Me.....	M. M. Bêcirmanî.....	4
Kelîme ê Qewm in.....	Abdulkadir Turan.....	10
Divê Elfaba Kurdî.....	Necat Özdemir.....	11
Dildar.....	M. Maḥmud Kılıç.....	14
Hêdîsên Pêxember.....	M. Saîd Varol.....	16
Ji Rîsaleyên Nûr.....	Ken'anê Nisêbînî.....	17
Ji Munebbîhata.....	Mela Kerbela.....	18
Ew Hatiye.....	M. Xalîd Bağdu.....	19
Heftaya Musted'efa.....	Muḥammed Zanyar.....	20
Wesjeta Şêx Ahmed Yasîn.....		24
'İlmê Tewhîdê.....	Îbrahîm Êlîhî.....	26
Îsmailê Yusufî.....	M. Salim Fidancı.....	27
Jiyana Gundayî Berê.....	Ferhad Bagasî.....	28
Rojhilatî.....	Abdulcelîl Dilşad.....	29
Serê Dehlê.....	Mîral Tuxubî.....	30
Hevpeyvîn Bi Abdulkadir Badîllî re.....		31
H.z. Adem.....	Abdulcelîl Dilşad.....	34
Îmamê Însanîyetê.....	Mela Mucahîd.....	35
Rehberê Heq.....	Mela Mizgîn.....	36
Xwedayê Min.....	Selamiyê Bilêderî.....	37
Durkirina Ji'Emelê Salîh.....	M. Emînzade.....	38
Gur li Dora Mene.....	Ferzan Muḥammed.....	39
Exlaqê Xebatê.....	Muḥsîn Canan.....	40
Mêvan û Ma'zuban.....	Fexreddîn Şemrexî.....	41
Qurefî.....	Huseyin Olam.....	42
Bira Pozê Wî Bişewite.....	O. Faruq Şîpkanî.....	44
Sebr û Nimêj.....	M. Hecîezem.....	45
Li ser Bedîuzzeman.....	Mela Alî Zîla el-'İlmî.....	46
Padişah û Wezîr.....	Mela Kerbela.....	47
Allah Sehergaha Ezel.....	Melayê Cizîrî.....	48
Tifik.....	Mamoste Çiyayî.....	50
Ma bi Dunya Nêxapeyî.....	Adem Gonul.....	51
Ehlê Quran.....	Îbrahîm Çabakçurî.....	52
Keynaya Şenik.....	Muḥammed Seydan.....	53
Kam o Huseyn.....	Bîlal Nêribij.....	54
Serxwebûn û Azadî.....	Abdussamed Hîlmî.....	55
Îman û Bawerî.....	Abdulkuddus Hîlmî.....	59
Bexçê Zaroka.....		60
Ji Xwendevana.....		64



Çavek li rojê Yê din li xetê...

Her roj...
Piştî nimêja sibê
Diya min beroşa nîskê
Didanî ser sobê
Îce...

6

✍ Zinnur Zivingî

Di Dîrokê De Kurd

Li gor lêgerîn û tehqîqatên li ser dîrokê hatine kirin, Gutî, Hurî, Mîtanî, Kardayî, Kirtî, Kardakayî, Bahtî, Kimmer, Kassît û Med, dewlet û medenîyetên ji nav milletê Kurd derketine tene zanîn.



7

✍ Cevdet Karaman



Tew Dinyayê

Gelî Xwendevanên hêja! He-ger Xwedayê te'ala destûrê bide emê ji vê jimara kova-ra "Kelhaamed" dest pê bikin û rêzenivîsek dirêj pêşkêşî we xwendevanên hêja bikin.

22

✍ M. Maḥmud Tıbyatî

Salvegera Qetlî'ama Halepçe

Em ummeta Îslamê mezlum û mehrum in, ku di dirêjîya tarîxê de leqayî zulmê bune. Jibil Xweda tu kes û kesekî me tuneye.



25

Sal (Yıl) : 2 ❖ Jimar (Sayı) : 4 ❖ Biha (Fiyat) : 5 TL

Bihar (Adar - Nisan - Gulan) 2010

❖ Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran (Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN

❖ Ciyê İdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL

❖ Têkilî (İletişim - Sipariş):

Tel : 0212 646 21 72

Gsm: 0530 226 99 63

Web: www.kelhaamed.com

Mail: kelhaamed@kelhaamed.com

❖ PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91

❖ Yayıncı Süreli

❖ Çapxane (Matbaa):

Şan ofset : 0212 289 24 24

❖ Nişe (Not): Mesuliyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîsaran e. Berhemên tene şandin nayên veğerandin.



Ê ku rehmê li însana
neke xweda jî rehmê
lê nake.
(Hedis)

Banga Me: Yekîtî ye

Gelî misilmana! Belê banga me yekîtî ye. Yekîtîya hemî misilmana... Çimkî hêz û serfirazî tenê bi yekîtîyê ava dibe. Dema yekîtî tune be, misilman wê ji hev perçe perçe bin. Ne hêz dimîne li holê ne jî serfirazî. Ev heqîqata hanê di Quran a pîroz de wiha tê ferman kirin:

“Îta’a Xweda û Resulê Wî bikin. Ne kevin qirka hev. An na (dema hun bi kevin qirka hev) wê hêza we (ji destê we) here. Sebir kin. Bêguman Xweda bi wan kesê bisebr re ye.” (Enfal: 46)

Îxtîlafê di navbeyna Misilmana da ne di mijarê eslî da ne. Di mijarê ferî da ne. Di mijarê eslî de -ku esesatê îman û Îslamê ne- îxtîlaf tune ne. Mijarê ferî jî ji xwe bê îxtîlaf nabin. Îxtîlafa di mijarê ferî de rehmet in. Firehîne ji bo Misilmana. Ne tengasî û sedema cîdal û berberîye ne. Ji ber vê, em divê tu carî îxtîlafa di mijarê ferî de nekine dewsa mijarê eslî de. Derdê me teva Îslam e, Quran û sinneta Pêxember e. Ka em çiqasî ji bo Îslamê, Quran û sinnetê dixebitin. Jiyana xwe çiqasî li gorî van berdewam dikin. Emr û nehyê Xweda bi çi awayî pêk tînin? Esil derdê me divê ev bin, ne mijarê ferî bin.

Îro ehlê kufîrê digel ku di nav hev de perçe perçe ne jî, dema dijminantîya Îslamê dikeve holê tev dibin yek û êrişê didin. Hêzê xwe dicivînin û îxtîlafa xwe dideynine kêlekê. Ji bo Îslamê û misilmana bikne bin hikme xwe her yekî ji alîkî ve dixebitin. Lê çiqasî hezî e misilman ji bo mijarê ferî di qirka hev da ne. Şixwe kemîneke kafiran jî ev e. Yanî ku misilmana ji hev bifeşkilînin, hêza wan bela bikin û wan bi hevî bidin kuştin. Bi vi awayî jî hêza wan ji destê wan derxin.

Dema ku derdê me Îslam û Quran û sinneta Resulullah ‘eleyhîssalat û wesselam be, mijarê ferî ti carî nabine asteng ji bo yekîtîyê. Belkî ewê bibine wesîla alîkarîyê. Bibne deriyê derketina ji tengasî ya. Çimkî di xebetekê da

alavê meriv çiqasî zehf bin, kêre meriv jî hewqasî hêsan dibe.

Em tevek di avayîya Îslame da ne. Mezelê me ji hev cihê jî bin, awayîya me yek e. Em Misilman tev ehlê vê avahîyê ne. Heger ev avahî xira bibe, emê tev dibin de bimînin. Emê tev bixisrin. Kesek ji me jî xilas nabe. Dema kafir êrişî misilmana dikin, li meşreb û terîq û nava nameyzênin. Gava bomba bi ser me de dibarînin, me ji hev naveqetînin. Hedefa wan Îslam û Misilman hemî ne. *Madem rewş ev e, ew çax divê misilman jî li mezheb û meşreb û terîqê xwe meyzênekî, hevî wek gulê di bexçekî da bibînin û bibne yek.*

Helbet ewê îxtîlaf derkevin. Lêbelê divê ev îxtîlaf nebine sedema tefriqayê û di demê êrişê dijmanan de bêne rakirin. Îro êrişê kafira ji her alî ve bi ser me de tînin. Ji ber ve li herkesekî ji me, ji dehma xwe de em hevî di îxtîlafê ferî de mazur bibînin û pişt girîyê bidne hev. Ev hedîsa ha ji bo yekîtîya misilmana re dibe tava heyvê. Resulullah ‘eleyhîssalat û wesselam wiha dibêje: **“Meriv bi birayên xwe bihêz e.”** (Cami’us-sağir: H: 9189)


Ûstad Bediuzzeman mîsalekî li ser yekîtîye tîne û dibêje: *“Tayîkê ziraf dema bi tenê bin pir qels in. Zehf zû tene qetandin. Lê dema 20-30 tayîkê ziraf bêne ber hev, zexm dibin û dibine wek werisekî qewîn...”* Her wiha dema meriv tene cem hev û tifaq û yekîtîye di nav hev de ava dikin, hêz û qeweta wan zêde dibe. Dibine wek kelheke nederbasbuyî. Xweda ‘ezze we celle wiha ferman dîke: **“Di qencî û teqwayê de bibne alîkarê hev.”** (Maîde, 2)

Resulullah ‘eleyhîssalat û wesselam wiha dibêje: **“Alîkarîya ‘evdekî rokê bibal birayê wî ve, bixêrtir e ji mana wî yî mihekê di camiyê de.”** (Cami’us-sağir: H: 5644)

Divê Misilman alîkarê birayê xweyî misilman be. Werin, em di qencî û teqwayê de alîkarê hev bin. Derdê me, kula me, êşa me yek e. Ew jî Îslam e. We dispêrima Xweda...

'Esabîyet (Gelperestî)
ew e; ku di zulmê de
meriv alîkarîya qewmê
xwe bike.
(Hedîs)

Mezandina Mevî Li Qewmîyetê



Hemd, şûkûr û pesin hemû ê Xweda ê "alemê ne. Salat û selamê bêjimar li mezinê me Muḥammed bin. Û li al û eṣṣhab û peyrewiyên wan bin, hetanî roja qiyametê.

Gelî Xwendevanên heqperest!

Di jimara çûyî de, me mezandina xweyî li gel û qebîla ji we re nivîsîbu. Di vê jimarê de jî, emê mezandina xweyî derheqê qewmîyet û hemîyetê de ji we re binvîsin. Xweda ê 'alemê tewfîqa me tevde ji a heq û rast re bide.

"Allahummehdî qewmî fe innehum la ya'lemune", "Ya Rebbî! Tu Qewmê min hîdayet bikî. Bê guman ew nezan in." Qewmîyet û hemîyet; du qism in. Qismê Îslamî û yê cahilî heye. *Heskirina mirov, di daîra hukm û şerî'et a Xweda de, qewmîyet û hemîyeta Îslamî ye.* Ev qewmîyet meşrû' e. *Heskirina ku ne di daîra şerî'et û hukmê Xweda de be, ew hemîyet û qewmîyeta cahilî ye.* Ev qisim jî ne meşrû' e, heram e. Ji qewmîyeta meşrû' re tê gotin: "**Sile ê rehîmê û gîret**" Û ji a cahilî re jî tê gotin: "**'Esebiyet û hemîyeta cahilî.**" Muḥafezekirina nesebê û silê rehîmê ferz e, gîret e. Birrîna van, heram e û deyyûsî ye.

Rêza pîrbûna millet û qebîla, reng û zimana, mal-

bat (aile) û bavika, ji aliyê Xweda ê 'alemê ve hatiye danîn. Ji ber vê yekê parastina wê lazim e. Lewra **Xweda tu tiştî 'ebes (bê feyde û sebeb) naxuliqîne.** 'Adet û sunneta Xweda ye, tiştê kû bixuliqîne gelek hikmetê mezin û mûhim, lê bardike û pê wan pêk tîne. Vêca ji bonî muḥafezekerina vê rêzê û hikmet û fêdên ku pê têne pêkanîn, Xweda ê 'alemê bi Quran a xweyî pîroz û pêxemberê xweyî dilsoz -selat û selam lê bin- gelek hukm û ferman daniye holê. Ji me jî tetbîq û 'emelkirina wan xwestiye. Divê em jî, wan bicî bînin.

1 Mesela ji bonî tu millet û qebîle hevdu înkâr nekin, serê hevdu winda nekin û bi cahilî xwe ji hevdu çêtir nebînin, ayeta 13 (sêzda) ji sûrê Hucûrat nazil kir û pê rêza pîrbûna gel û qebîla, û şeklê çêtirbûna wanî ji hev, xistiye bin emniyeta Quran ê de, û Quran jî, xistiye bin hîfza xweyî ezeli de.

2 Ji bonî kes, ji rengê kesî nefretê neke û bîzê xwe nebe, kes zimanê kesî yasaq û menî' neke ayeta bîst û duduyan (22) ji surê Rûm nazil kirîye. Ji ber ku di wan jimarên derbasbûyî de me ev ayet çend car anîne ziman, me vêcarê ihtîyac nedî bi nivîsana wan.

3 Ji bonî rêz û 'adetê bavik û malbatîyê bête muḥafezekirin û neseb nekevîna nava hev, kê kurê kê ye, ji mala kê ye, bê zanin Xweda ê 'alemê ev ayet nazilkirîye: "Hûn wan (nisbetî bavê wan bikin) bi bavê

wan gazî bikin. Ev li cem Xweda 'adiltir e û rasttir e. Vêca heger, hûn bavê wan nizanibin, êdî ew di dîn de birayên we ne..." (Eh̄zab 5)

4 Ji bonî nîzama aîle, bavik, 'eşîr, qebile, qewm û milleta bêne mûhâfezakirin û parastin, pêxemberê Xweda jî wiha ferman û kerem kirîye: "Çi kesê ji bavê xwe pê ve, xwe bi zanabun nisbetî yekî din bike, cennet lê heram dibe." (Camî'us-sağîr / İmam Suyutî H: 8370)

5 Pêxemberê Xweda -selat û selam lê bin- xwe nisbetî kalê xwe, eşîr û qebile û qewmê xwe kirîye. Gotiye: "Ez Mûhamedê kurê 'Ebdullah im, kurê 'Ebdulmuttelib im." Û bi vî hawayî heta bi bîst û yek bavî, bi rîwayetên sahhîh hatiye riwayetkirin. Xwe nisbetî Hz. İbrahîm û İsmâ'îl (selamên Xweda li wan bin) jî kirîye. Gotiye: "Ez 'Erebî me, Qureysî me, Haşîmî me, Kin'anî me" û bi vî hawayî... (Ji rîwayet û eserên muxtelîf û cuda, me civandîye.)

6 Sile ê reh̄mê (xweyî derketina li xweyî, eqreba, pismam, lêzim û mirovan) ferzek ji ferzên İslamê ye. Birrîna vê yekê heram e. Bi hûkmê gelek ayet û hedîsa sabit e.

7 Pêxemberê me; serok û ser'esker ê her qewmekî ji wan dineqand û tayîn dikir. Beyreq û ala a wan, dida destê yekî ji wan.

8 Muslumana jî, ji hingî ve heta îro, li pey vî sunnetê meşiyane. Wan jî xwe nisbetî qewmê xwe, qebîla xwe, bavê xwe, gundê xwe, bajarê xwe û memleketê xwe kirine. Hatiye gotin: Bîlalê Hebeşî, Suheybê Romî, Selmanê Farisî... Razîbûna Xweda li wan be. İmamê Buxarî, Şahê Geylanî, İmamê 'Esqelanî, Celaledînê Romî, Se'îdê Kurdî... Reh̄meta Xweda li wan be.

Bi van hukm û, emr û 'adeten İslamî neseb û, qewm û eşîr û reng û zimanê herkesî di bin sîya hukmê dewletên İslamî de hatine parastin. Pê, hevdu naskirine, alîkarî kirine û berberîya di xêrê de kirine. Tu fikr û dozên beşerî, bi vî şeklî tedbîra muhâfezekirin û parastina qewm û neseb û gela nestendîye. Nexasim dozvanê qumonistiyê -parastinê deyne vir- bi xebata xweyî ji bonî rakirina nikahe û serbestkirina zîneyê, bumba xistine bin esasê qewmîyetê. Heyranê Kafirên Ewropa û kafirên xelqê ne. Xwe ji wan re dikine ax û erd, belê dijminê muslumanê qewmê xwe ne; tevî ku ji sedî not, qewmê wan musluman in.

Werhasil însanê li ta'îmatê İslamê û li tarîxa muslumana meyzeke, guman nake ku tu kes, weke muslumana bi milletê xwe re nerastin û ne xêrxwaz in. Ti dîn û fikra weke İslamê tedbîra milliyeta însan nestendîye; lewra İslam dîne Xweda ye. Xweda, tiştê xuliqandî diparêze. Evên din; din û dozên şeytan in, şeytan jî, neyartî û xerakirin jê re rêze.

9 Pêxemberê me -selat û selam lê bin- du'a ji qewmê xwe re dikir, digo: "Xweda ê min! Qewmê min hîdayet bike, bê guman ew nezan in." Dema Mekkeh

fetiħ kir, tamamên ê ku bi sala pê re neyartî kiribun 'efu kir. İntîqam û heyf ji wan nehilanî. Pêxemberê me -selat û selam lê bin- di hedîseke şerîf de wiha kerem kirîye:

"Qenctirîne we ew e, kû mûdafê'a 'eşîra xwe dike. (wan ji neheqiyên dijmina diparêze) Bi şertê xwe gunahkar neke." (Di zûlmê de alîkarîya wan neke.) (Ebu Dawûd / C. Fewaîd / Rudanî H.7802)

Pêxemberê me -selat û selam lê bin- ewul (pêşî) dîne heq û rêya rast ji qewmê xwe re heta bi emrê Xweda ji 'eşîra xweyî nêz re gotiye. Di pey re li 'umum însana tebliğ kiriye. Ji ber vê yekê; ji sehabîya bigre (razîbûna Xweda li wan be) hetanî muslumanên îro, ê ku li pey sunneta pêxember meşiyane, xêra eqreba û qewmê xwe xwestine, pêşî doza Xwedayî heq ji wan re gotine, ji wan re du'a kirine, heyf ji wan nehilanîne, wan 'efu kirine, heq û hûqûqê wan mudafê'e kirine parastine.

Belê mirovên musluman ji ber kû zanin û bawerî ku xaliq û xwediyê her tiştî û herkesî Xweda ê 'alemê ye; her tiştê xwe li gorî rîza a Wî û emrê Wî avadikin û 'eyar dikin. İdî ji bona ku Xweda ê 'alemê ticarî emir nekirye bi zûlmê û pê razi nebûye û kufur neyave mirovên musluman, alîkarîya eqreba ê xwe û qewmê xwe li ser zûlmê û kufrê nakin. Heskirina qewmê xwe li ser dijminatiye hinek qewmên din avanakin. Belkî tevên qewmên musluman ji xwe re bira û dost dibînin û xweyî dizanin. Alîkarîya muslumana ne ji qewmê wan tenê re ye. Belkî ji temamê muslumanan re ye; heta ji temamên mezluman re ye. Gava bikevine tengiyê jî alîkarîyê ji temamê muslumana dixwazin, ne ji qewmên xwe tenê. Di van xûsûsa de binêrin bê ka Xweda û pêxemberê wî çî ferman û kerem kirine:

"Tu, qewmekî ku bi Xweda û roja axretê bawerî tînin peyda nakî; kû ew ji ên li hember Xweda û pêxemberê wî derketine hesbikin; her çiqas ew bavên wan; yan kûrên wan; yan birayên wan; yan jî ji 'eşîra wan bin..." (Mucadele 22)

"Hûn li ser qencî û teqwa ê alîkarîya hevdu bikin û li ser guneh û neyariyê jî alî hevdu nekin. Hûn ji Xweda birtirsin. Bê gûman, Xweda 'ezab dijwar e." (Nîsa 2)

"Kesê li ser 'esebîyetê (rehtarîyê) şer bike, ne ji me ye. Û kesê li ser 'esebîyetê bimre ne ji me ye." (Ebu Dawud 5121)

Ji Wasîle b. el-Esqâ -Xweda jê razî be- hatiye rîwayetkirin: Min go: "Ey Resûlê Xweda! 'Esebîyet çiyê?" Ewî wiha keremkir go: "Alîkarîya teyî ji qewmê te re ye, li ser zûlmê (zordestiyê)" (Ebu Dawud / Cem'ul fewaîd / Rudanî H.7803)

"Bê gûman tenê mûmin (bawermend) birane, nexwe hûn di nava birayên xwe de sülhê (levhatinê) bikin." (Hucûrat 10)

Xweda ê 'alemê me tevde ji rêya heq û rast şaş neke. Ez we emanetî dergahê reh̄m û kerema Wî dikim.



Çavek li rojê Yê din li xetê...

Her roj...

Piştî nimêja sibê
Diya min beroşa nîskê
Didanî ser sobê
Îce...

Hindîru dihimhimî
Piçuk û mezin
Tev dirabun...

Ma xewa kê dihat?
Wey li wî!
Biçênê nîskê
Nanê sar,
Pîvaza tûj,
Û şorba germ
Heft xwezî bi hingî...

Piştî taştê
Dikevim rê...
Gayên reş û belek
Li pêşîya min dibezin.

Wekî "Sofî Mîrze"
Devê ga hişk girê didim.
Da ku luqma heram
Nekeve nav keda me.

Hem divê;
Ez neslên tahir,
Çîyayên bilind,
Ava bikim...

Da ji zemîne re
Bibin sîng.
Û ji binê xwe
Ava zelal diyarî bikin
Ji bağ û bostanê ummetê re

Kêfa dilê min
Li ciye...
Haletê min
Nakê zîq zîq
Gêsinê min
Herî nagrê...

Û dengê xwe
Li ga dikim
"Weree!
Gayê beleko!"
Hey bi qurbana milê ga bim
"Dunya li ser milê ga û masî ye"
Rizqê însan,
An ji behrê ye
An jî ji bejê ye.

Îce cotkarên hesûd
Ji min hesedê dikin...
Lewra;
Axa beyar
Ji min direvê
Û axa me'mur
Bi minre dikenê
Û dibêjê:

"Bê çawa
Te ez îhya kirim
Ji giraniya beyartiyê...
Û ji xewa ğesletê xelas kirim
Ezê jî nêrgîz û bilbiza
Zad û sumbulan
Bênder bi bênder
Ji bo te diyarî bikim."
Ey cotkarê ked helal!
Ey rênçberê bextewar!

Bimeşe, bimeşe
Li axa sola xwe
An kevirê ber xwe
Ne nêre...

Lewra,
Ew ax,
Mîna toza ber piyê mucahida ye
Û ew lat û kevir
Îmtihana li pêşya mumina ye.
Lê emanet ha!
Tu xetê şaş nekê
Û tu nimêjê derbas nekê...
Ji bo vê;
Bila çavekî te
Li rojê
Û çavê din
Li xetê be...

Dî Dîrokê De Kurd

✍ Zînnur Zivingî

Li gor lêgerîn û tehqîqatên li ser dîrokê hatine kirin, Gutî, Hurî, Mîtanî, Kardayî, Kirtî, Kardakayî, Bahtî, Kîmmer, Kassît û Med, dewlet û medenîyetên ji nav milletê Kurd derketine tene zanîn.

Dîroka gelê Kurd heta berya 6000 (şeş hezar) sala tê tesbîtkirin, ku li Mezrabota Jiyana xwe domandine. Kurda jî, weke milletên din, di çêkirin û lêkirinê de cîh girtine û hinek eserên wan heta îro hatine.

Mehmudê Qesgerî di kitêba xweyî “Dîwanu Luğatit-Turk” de, wexta xerîta dinyayê dide, herêma di navbera Şam, ‘Azerbeycan, ‘Iraq, Misr û Hicazê de bi navê **“Ardul-Ekrad”** yanî “Welatê Kurda” qeyd dike. Bi vê jî tê fêmê ku Mezrabota ji berê de erdê Kurda ye.

Kurdistana, hê ji zemanê Hezretî Nuh de, yanî ji destpêka însanîyetê de buye cîh û war, ji boy heyat û Jiyanê. Lewra dema Xweda ‘ezze we celle di Quranê de behsa tofana hezretî Nuh dike dibêje: **“Hate gotin: “Ey erd**



ava xwe biqurpîne, ey asîman! Tu jî ava xwe bigre. Av hate kişandin, îş qedîya. Gemî (keştî) li ser çîyayê Cudî sekinî.” (Hûd, 44) Ji vê ayetê tê fêmê ku, keştîya Hezretî Nuh piştî tofanê li herêma Kurdistan ê, li çîyayê Cudî, ku di navbera Cizîrê û Şernex de ye, sekinîye.

Heta, li gor ku me, ji Seyda Mela Abdullahê Botî yê Dergulê bihistiye; di salên 1970yî de carekê Mela Abdullahê Dêrşewî rojnameke (qezete) Misrê nîşanî Seyda dide. Seyda dibîne ku dibêje: “Lêkolîner yanî araştırmacı yê İngîlîz, li çîyayê Cudî dema lêkolînê dikin li kevirêki bi nivîs rast tên. Dibine İngîltere û bi mîqroskobê wê nivîsê tehqîq dikin. Fêm dikin ku ev nivîs, bi zimanê Kurmancî ye û wesiyeta Hezretî Nuh e. Di wir de Hezretî Nuh wesiyeta xwe gotiye ku; dema wefat bike bila wî li Cizîrê veşêrin û berê wî bidne Mekkê yanî Beyt-ul Hêramê. Hezretî Nuh gotiye; lewra ewê ji Mekkê ewladekî min derkeve ku wê nav û deng bide ‘alemê.” Heger rast be, li gor ji vê riwayeta Seyda Mela Abdullahê Botî (Xweda jê razî be) jî baş tê zanîn ku hê ji zemanê Hezretî Nuh (‘aleyhîssalam) de Kurdistan ciyê însaniyetê buye û bi zimanê Kurdî hatiye xebirdan...

Marco Polo wexta behsa Îranîyan dike, dibêje; qraltîya Kurdistan yek ji heşt qraltîyê di herêma Îranê de bu. Ewliya Çelebî jî di Seyahetname xwe de dirêj dirêj behsa gelê Kurd dike û ji boy dewama wan du’ a ji Xweda dike.

Bê şek, dîrok û heyîna milleta ji hev ne cihê ye. Lewra bi zewac, koç û mirina, millet geh belawela bune, geh di nav hev de reng qulubandine, bune millet û medenîyeteke nû. Jiber vê tesbîta milletekî ji temamê milleta cihê pir zor e. Weke sosyolog û civaknas ‘Elî Şerî’etî gotiye: “Medenîyeta Yunan, medenîyeteke ku Kurdê mihacir avakirine. Vê medenîyete bi çûna Kurda yî Yunanê destpêkir.” Spengler jî heq dide Şerî’etî û wiha dibêje: “Medenîyeteke wexta dimre medenîyeteke nû destpêdike. Weke ku çawa ji dunde û nesla Medenîyeta Hind a medenîyeteke din derketiye. Her wiha ji medenîyeta Mezrabota Medenîyeta Manî, ji medenîyeta Manî medenîyeta Kurd, ji medenîyeta Kurd medenîyeta Yunan, ji medenîyeta Yunan jî medenîyeta Roma çêbuye.” (Şerîatî, Alî, Medenîyete ve Modernîzm, s. 57) Îro em dibînin ku medenîyeta Roma jî qedîyaye û ji wê medenîyete, medenîyeta Vatîkan û dewletên wek Emerîqa derketine.

Di dîrokê de hemu millet geh li ser bune, geh ketine. Hinek hunda bune û di nava milletên din de helîya ne, hinek jî heta îro reng û awazên xwe mihafeze kirine, gihîştine roja me. Weke em ji gotina Seydayê xweyî mezin Bedî’uzzeman fêm dikin gelê Kurd jî di zemanê Asurî û Keyaniyan de rêbertî û meznatîya milletên der û dora xwe kirine. Dîsa bi navê Merwanî û Eyyubîyan jî Kurd bune ê li ser û him xwe him jî milletên dora xwe îdare kirine.

Belê dewran qulubîye. Lewra rengê dinyê ev e. Geh li jêr geh li jor... Ya qenc milletek li kur be xwedîyê xwe û temamê ‘alemê, Xweda jibîr neke.


Belê heger em werne serî, emê bibînin ku Allah te’ala, yê temamê hebun û însan û millet çêkirine, milletê Kurd û zimanê Kurdî jî weke millet û zimanên din, ji qudreta xwe çêkirîye û ji meznatîya xwe re kirye delîl û nîşanek. Jiber vê, heta ev millet û ziman Xweda bi bîr bîne bi qîmet e, wexta dev ji bîranîna Allah berda, ji qîmeta xwe dikeve...

Îslam û milletê Kurd

Seydayê mezin Bedî’uzzeman dibêje: “Dîn heyata heyatê ye. Hem Nûr û hem esasê heyatê ye. Bi sağıkirina dîn dibe, sağıkirina vî milletî” (Leme’at)

Helbet Xwedayê Subhān, ji 124.000 pêxember û qasidan, hinek ji Kurda re jî şandine, da ku rîya heqîyê nas bikin û bimeşînin, ji xaliq û rebbê xwe dûr nekevin. Pêxemberên wek Hezretî Yûnus, Hezretî Şu’ayb, Hezretî Îshāq û Hezretî Îbrahîm (Selamên Xweda li ser wan bin) di herêma Kurdistanê de jiyana xwe derbas kirine...

Dîsa dibe ku kesên di nav Kurdan de îro navê wan hebin pêxember û qasidên Xwedabin; belê dîrokê axa jibîrkirin û dîrketinê bi ser wan dakiribe. Em navên wan kesa zikir nakin. Lewra dibe qenc bin û dibe neqenc bin. Şixwe hewceyî bi tesbîtkirina huwîyeta wan kesane tune ye. Em li ihtîyacên xwe dinêrin.



Di “Diwan-u Lugat-i Turk” a Mehmudê Qeşgerî de Welatê Kurdistanê

Gelê Kurd, berya Îslamîyete nas bike weke hemu gel û milletan di bin qanun û daxwazîyên însanê weke xwe de dihatine îdarekirin û em dikarin bibêjin zulm didîtin. Lewra ji geynî îdare û qanunên Xweda pêve hemu qanun û îdare, îdarê zordest û koledara ne. Însan li gor kêf û xwestekên hinek însana tene îdarekirin û ê bi qewet be, mezin û bilind tê qebul kirin. Belê di qanun û şerî’eta Allah, di qanunê rebbê temamê millet û însana de hemu insan li gor daxwazîyên rebbê xwe mesul in. Yê biheq ne ên bi qewet û hêzin. Heq ê kolekî be, ê mirovekî zencî be weya ê pîrek û zarokekî be jî xweyê heq ew e, bilind ew e.

Jiber vê piştî di ser pêxemberîya ‘Îsayê Mesîh de zemanekî dirêj derbas bu, dîne heqîyê hunda bu û zordar bune xweyî qanun û qewet li temamê cîhanê. Êdî piştî rohnayîya dîne heq welew bi navê dîne ku Hezretî ‘Îsa anîbe jî, tarîf û reşahîyêkê dest pê kiribu, insan ji rebbê xwe dûr ketibun. Bi navê rebbîyê, bîya hinek insan û putan dikirin. Weya hinek tiştên weke agir ku Xweda ji boy fêda insan çekiribu, ji xwe re bilind qebul dikirin û li dor wan bawerîyê şaş, teşîyên xwe dirêsandin.

Xwedayê mezin ji kerema xwe carekê di ji nav însana qasid bijartin û ji boy banga însana bibal heqî û rastîyê bikin pêxember şandin. Pêxemberê me, rohnîya çavê me, Hezretî Muħemmed, bû pêxemberê axir zeman û careke din ji rohnî û nûra Xweda, weke rojê di ser ‘alema

Kelîme, ê Qewm in; Lê Istilah, ê Ummetê ne

Her zimanêk ayetekî Xwedê ye. Însan çiqas di çêbûna tabî'etê de dimêne heyirî, ewqas di çêbûna ziman de jî dimêne heyirî. Çawa ku heta meriv baweriyê bi Xwedayê Te'ala neyne ne mumkun e ku sirrê çêbûna însan îzah bikê, heta meriv bi Xwedayê Te'ala baweriyê neyne ne mumkun e ku meriv çêbun û pêşveçûna ziman îzah ke. Ê ku di sirrê ziman de hineki bifikire -bi fikrekî rast- mi^heqqeq ewê bigihê Xwedayê Te'ala. Ji bo van kesa; winda bûna zimanêkî li ser rûyê 'erdê, winda bûna ayetek jî ayetê Xwedayê Te'ala ye; ku ti Misilman razi nabin bi vî halî. Madem ku em ne razîne be vî halî, divê vî zemanî em li hember vî halî î'tirazê xwe bikin (î'tiraza rast, ne bi dev e) belê bi gavi^l avetinê. Îro ev gavi^lê di heqê Kurmancî de; ku em bi vî zimanê delal biştegîlin û binivîsin û em bi zarokê xwe bidin zanîn.



Ji bo ku zimanê Kurmancî hatiye îhmalkirin hinek qaîdê wî jî winda bunê. Û îro gelek gûrubên Kurmanca ku laîq in, weke gelek gûrubê jî qewmên din, dixwazin ku zimanê Kurmancî bêru^h bihêlin; yani çiqas istilâhê(terim, navlêk) Îslamî hene jî zimanê Kurmancî bavêjin. Bi nave paqijkirinê dixwazin vî karî bikin. Evana dibên dewletek laîq, jiyaneke laîq û zimanek laîq. Yani her tişt laîq. Yanî dixwazin dîn ji her alî de, ji nav însana rabe. Însan gav bi gav bimênin bêdîn.

Di heqê dîn û ziman de gotina rast ev e: **"Kelîme ê Qewm in; belê istilâh ê Ummetê ne."** Istilâh nayên avêtin. Wextê ku em istilâhê Îslamî jî zimanê xwe bavêjin, wî wextî emê bimênin bêdîn. Çi zirar heye ku Kurd bêjin; **"Şefqet, merhemet, hesed, gîybet..."** Hege hinek kelîmê Kurmancî li hember van hebin, em nabêjin van kelîma nenivîsin û nebêjin. Belê ev kelîme jî bila hebin, bila ev istilâhê Îslamî jî hebin.

Di vê meselê de zimanê Kurmancî li gor zimanê Tirkî, li pêş e. Di zimanê Tirkî de istilâhê dînî tevde ya bi 'Erebî ne; yan jî bi Farisî ne. Ê Kurmancî weke **"Nimêj,**

rojî, destmêj..." gelek hatinê wergerandin. Em karin bêjin ku zimanê Kurmancî li hember zimanê din xwe diparêze û wexta ku li rasta kelîmakî gîrib tê, li hember wê kelîmê kelîmekî dide çêkirin.

Lêbelê ev çend sale ku zimanê Kurmancî li hember televîzyonê kême maye. Ev parastina wî ya tebi'î li hember zimanên di, li hember hucumê mezin ze'îf maye. Û muhtace ku em lê bibin xwedî, arîkariyê bikin de ew kelîmê ku têne navê bèn avêtin. Ku ev jî encex bi çêkirina kelîmeyekê li hember wê kelîma gîrib e. Hege em Misilman vî karê ha nekin wê hinekê din bikin û ew jî wê li gor zanebûn, bawerî û armancê xwe bikin ku îro wilo dikan. Istilâhatê Îslamî bune malê zimanê Kurmancî û xweşik e ku devlemendiya zimanê Kurmancî ne.

Parastina zimanê Kurmancî divê li hember wan kelîmê nû, ê çî Tirkî û çî Ewropaî ye. Em dibînin evê ku jî istilâhê Îslamî ne razî ne û dixwazin kelîmên Îslamî jî Kurmancî bavêjin li hember istilâhê Ewropaî, weke tiyatro, weke psikolojî de tiştêkî nakin. Ti xebata wan li hember van kelîma nexuyaye.

Dibêjin; *"kelîme ê qewm in, lêbelê istilâh ê medeniyetê ne. Madem em îro dixwazin medeniyeta Ewropaî bînin nav xwe, divê em istilâhê weke demokrasî û sosyalîzm jî bînin nav qewmê xwe."* Ev jî derdixê pêşçava ku ev jî paqijkirina zimanê Kurmancî bêhtir li ser avêtina istilâhê Îslamî dixebitin.

Misilman divê ne weka wan bin. Ne ku çî kelîmê Ewropaî û Tirkî hene bavêjin. Lêbelê çî ê 'Erebî hene dest li wan nedin. Gav avêtina bi vî şeklî weke gav avêtina vayê Laîq e. Emê istilâha û kelîma jî nav hev derxin. Weke hat gotin çî kelîmê 'Erebî, kevn yan jî nû ye ê Qewmê 'Ereb in. Û çî istilâhê Îslamî hene ew jî ê Ummetê nê. Ev istilâh çiqas ê 'Ereba ne, ewqas jî ê me ne. Divê em ji hindikî ve bi qasî 'Ereba li wan istilâhê Îslamî bibin xwedî.

Dîvê Elfaba Êurdî bê mihafezekirin

⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆
⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆
⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆
⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆
⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆ ⋆

↳ Necat Özdemir

Di navbera nivîskarên Kurd de, li ser elfabê minaqeşe û cihêbûn ji berê de heye. Ne di elfaba latînî tenê de; belkî li ser elfaba 'Erebî jî minaqeşe û cihêbûn heye. Belê minaqeşa mezin li ser elfaba latînî ye. Lewra Kurda nêzî 100 salî ye ku dest bi bikaranîna elfaba latînî kirine.

Di vê nivîsa xwe de em dibêjin:

-Divê muesseseyek bê tesîskirin. Û civîn ji boy ziman û elfaba Kurdî bêne kirin.

-Divê Elfaba Kurdî bi rastî bê tesbîtîkirin û mihafezekirin

-Elfaba 'Erebî, ji ber ku dewlemendiyeke û elfaba dînê gelê Kurd e, divê ji ber çava neyê dîrxistin.

-Piştî vê tesbît û xwedî derketinê, divê di bikaranîna elfabê de wekhevî û tifaq bê kirin.

Bila ev nivîsa me ji boy xebirdan û tefekkureke li ser elfabê bibe destpêk. Lewra ev mewzu'êke pir muhim e. Ji ber ku di vî warî de jî kemasîyek di nav me Kurda de

heye, divê em werne bal hev û li ser vê mijarê bipeyvin.

Berya Îslamîyetê Elfaba Kurmanca

Di derheqê elfaba berya Îslamê de, me'lumateke baş tune. Wexta em lêgerînekê li ser elfaba Kurdayî berya qebulkirina Îslamê dikin, li kitêba zanyarê Keldanî Îbnî Wahşîyye rast tên. Ku ev kitêba wî, li ser elfabên berê yên antîk e. *Îbnî Wahşîyye*, di dema 'Ebbasîyan de ji zimanê Keldaniyan û Kurmanca pir eser, bi bal 'Erebî ve wergerandine. Di sala 908an de mirîye. (*Îbnu'n-Nedim, Kitabu'l-Fihrist, thq. Rıza Teceddüd, Tahran 2003, 305, 372, 379, 419-424; İbnu'l-Ekfani, İrşadu'l-Qasid İla Esna'l-Meqasid, thq. Mahmud Fahvi, Beyrut 1998, 68, 70, 73*)

Îbnî Wahşîyye di kitêba xweyî bi navê "**Şewqu'l-Musteham Fi Marifeti Rumuzu'l-Aqlam**" (Xwesteka kesê ku dildayî ye ji boy hînbuna sembolên qelesa) li ser hâlê Kurmanca wilo dibêje:

"Keldanî di dema xwe de, di zanist(bilim), felsefe û teknîkê de li pêşya hemu însana bun. Kurdên dema antîk, dixwestin wek wan bibin û bi Keldaniya re berberî (reqabet) dikirin. Belê di navbera van herdu milletan de wek erd û asîman dûrbun hebû. Digel vê, Kurdên dema antîk, ji aliyên "Zira'et" û "botanîk"ê ve li pêş bun. Kurda digotin em ji nesla "Pînoşad" tîn. Di nav wan de kitêba "Zira'et"ê ku digotin a *Hezret-î Adem* e, û kitêbên "Safarîs" û "Kosamî" meşhur bûn û tim murace'etî van kitêba dikirin. Digel heft kitêba digotin *Muşhefa "Dewanay"* jî a me ye. Û xwe ji aliyê *sihrê* ve li pêş ditîtin. Li gor qene'eta min, ev ne wilo bu. Lewra zanist û huner bi wesîta Keldaniya gihîştîye Kurda. Di van zanist û ilma de Keldanî ji Kurda pêştir in. Jiber vê yekê ji berê de di navbera Keldanî û Kurdan de dijminantî û zikreşî heye."

Di pey van gotinê xwe de Îbn-î Wahşîyye beħsa eserên bi elfaba Kurdî dike û dibê min carekê nêzî sih kitabê Kurdî ditiye. Em guh bidnê: "Nivîseke dema antîk jî, a Kurda ye ku di nav de hinek herf hene, di elfabên din de tune ne û li gor îddî'ayên Kurda kalên wan "Pînoşad" û "Masî es-Sorati" bi vê elfabê eserên xwe nivîsandine. Hinek herfên wan hene ku ne di 'Erebî de ne jî di elfabene din de em nabînin. Heqîqeten, ev elfabe pir balkêş û gerrîb e. Dema ez li Beğdayê bum, min di nava lahîtekî de, 30 kitabê ku bi vê elfabê hatibun nivîsandin dît."

Navê hinek kitêbên ku Îbn-î Wahşîyye ji Kurdî vegerandine 'Erebî ev in: "-Eflahu'l-Kermî we'n-Naxl, -ilelu'l-Miyah we Keyfiyyetu Istixraciha we İstinbatîha mine'l-Eradî'l-Mechuleti'l-Asl" Anîha ev eserên ku ji Kurdî hatine wergerandin di desta de tune ne.

Ji van gotinê Îbn-î Wahşîyye tê zanîn ku berya Îslamîyetê jî, elfabake Kurmanca hebû û pê kitêb hatine nivîsandin. Hinek ji van kitêbên Kurmancî di dema 'Ebbasîyan de bi bal 'Erebî ve hatine wergerandin. (Çavkanî: *Gazetekurd, İbn Wahşîyye, Şewqu'l-Müsteham Fi Marifeti Rumuzu'l-Aqlam, thq. İyad Xalid et-Tebba, Beyrut 2003, 202-203; İbn Wahşîyye en-Nibtî, "Şewqu'l-Müsteham Fi Marifeti Rumuzu'l-Aqlam" En-Nedwetü'l-Alemiyetî's-Samine Li Tarixi'l-Ulum inde'l-Arab, idad, Yahya Mir Alem, Muhammed Hassan et-Tayyan, Muhammed Mir Ayatî, Kahire 2004, s.9-11*)

Wexta em li elfaba ku di kitêba Îbn-î Wahşîyye de derbas dibe, dinêrin em dibînin ku ji "37" herfa û belkî zêdetir, çêdibe. Di nav van herfa de herfên wek "Ta, h, sad, dad, zê a peltek, 'eyn, geyn û zal a peltek" jî hene. Lêbelê îro ev herf kanî? Herê di nav millet de hene û tene bikaranîn; belê çima di weşan û nivîsan de tune ne?

Piştî qebulkirina Îslamîyetê Elfaba Kurdî

Elfaba 'Erebî ji berê de heye û bi pirî tifaq li ser hatîye kirin. Piştî qebulkirina Îslamê Kurda dest bi elfaba 'Erebî kirîye. Jibêr vê yekê berhê û eserên herî kevn bi elfaba 'Erebî ne.

Milletê Kurd, di elfabê de, piştî qebulkirina Îslamê "Elfaba 'Erebî" neqandiye. Belê li gor hewceyîyê zimanê Kurmancî çend herf (tip) pêvekirine. Wek herfên "P, Ç, J, V, G" hinek herf îlaweyî elfaba 'Erebî kirine û bikaranîne. Digel van herfan, elfabe ji "34" herfa çêbuye. Em dikarin bibêjin; piştî tarîxa 637ê heta niha; yanî eva li dora 1370ê salîye ku Kurmancî ve elfabê bikartûnin, îstî'mal dikin. Di tarîxeke nêz de "Xelîl Xeyalî yê Motkî" li gor vê elfabê "Elîfbêya Kurdî" amade kiriye û ev "Elîfbêya Kurdî" ji teref

seydayê mezin **Bedî'uzzeman** ve hatîye teqdîrkirin.

Di dema Paşî de Elfaba Kurdî û Minaqeşên li ser

Piştî Cumhuriyetê çewa ku Tirka dev ji elfaba 'Erebî berdan, hinek nijadperest û millîyetçiyê Kurda jî, ji boy elfaba latînî dest bi xebatê kirin. Kesên ku li dor kovarên "Rojî Kurdê" û "Hawar" ê civîyabun, li gor fikr û zihniyetên xweyî "laiq" hinek elfabe çêkirin. Hino hino ji boy teswiyekirina Îslamê, herfên ku bi hezar sala -heta berya Îslamîyetê jî- di zimanê Kurmanca de hebûn derxistin. Wek herfên "H, 'Eyn, Ğeyn, Sad, Ta" ji ziman dûr kirin. Bi vî hewayî elfabake ku ji "29" herfa çêdibe derxistin û tîpên wek "ê" îlawe kirin. Belê "ê" ne ku di ziman de tunebu, hebû; belê di elfaba 'Erebî de tîpeke ji boy "ê" tunebu.

Di nav kurdên laiq de jî, tifaq li ser elfaba latînî heta demeke pir dirêj çênabe. (Di vir de divê em bînine ziman ku ev Kurdên laiq bi jimar bûn û pir pir kêmbûn. Belkî jiber kû kesên xwendevan û maldar (xwey malbat û ağa) bun, ji boy mijulbuna vî karî musa'id bun.) Minaqeşa di nav van kesa de, ji kovarên wan jî tê derxistin. "Kovara Rojî Kurdê" (1912) vê minaqeşe û bêtifaqîya li ser elfaba latînî dide ber çava. Xebatên wan li dora reforme kirina elfaba 'Erebî bu. Di wê demê de M. Saliħ Bedirxan elfabake ku ji "40" tîpî çêdibe, pêşniyar (teklîf) dike. Nivîskarê "Kovara Hawar"ê Celadet Bedirxan di jimara 27an de dinivîsîne ku ew ji xwe ji sala 1919an de li ser elfabeya latînî dixebite. Di wan dema de, kesên weke **Tewfiq Wehbî** jî li ser elfabake latînî dixebitin. Dîsa di wan dema de hinek kesên wek **Orbelî** u **Maragulov** li **Sovyet** (Rus) ji boy elfabake latînî dixebitin û ew jî elfabake cihê çêdikin.

Di nav van elfaba de îro elfaba herî belavbuyî ya "Kovara Hawar"ê ye. Di pirên kovar, rojname, pîrtuk û weşanên dinî Kurmancî de, ev elfabe tê istî'malkirin. Belê dîsa tifaqêke bi temamî tune ye. Û minaqeşe dewam dike...

Çima destpêka vî karî Muslumana nekiryê?

Di nav vê şewatê de, ba û bahozê de, Kurdên Muslumana bi belavkirina heqîqetê îmanê ve meşgul bûne. Wek Seydayê Bedîuzzeman gotiye: "Li pêşberê min şewateke

آ	Aa
ب	Bb
پ	Pp
ت	Tt
ث	Ṡ ṡ
ج	Cc
چ	Çç
ح	Hh
خ	Xx
د	Dd
ذ	Ḍḍ
ر	Rr
ز	Zz
ژ	Jj
س	Ss
ش	Şş
ص	Ṣṣ
ض	Ḍḍ
ط	Tt
ظ	Zz
ع	Ḍḍ
غ	Ğğ
ف	Ff
ڤ	Vv
ق	Qq
ك	Kk
گ	Gg
ل	Ll
م	Mm
ن	Nn
ه	Hh
و	Ww
ي	Yy

felaket heye. Alav û pêtiyên wê, bilindî asîmana dibin. Di nav de zarokê min, îmana min pêketiye, dişewite. Ez baz didim ji boy wê şewatê bitefinim, îmana xwe xelas bikim... Li ber wê şewata felaket, çi qîmeta van hadîseyên biçuk heye? Fikrên teng, dîtîne teng..." Belê, wexta ev minaqeşên li ser elfabê hatine kirin, êdî milletên musulman bêxwedî mane. Ji teref neyarên gërbî ve hatine perçekirin û perçiqandin. Nesl, bi dûrxistina ji îmanê û bi Xwedênenasîyê hatine herimandin, di agirê menfe'et, irq û şehwetê de têne şewitandin... Di demeke wilo de, dahî, 'alim û seydayên mezin wek Bedî'uzzeman, wek Şêx Seîd, wek Salih Begê Hênî, wek Mela Huseynê Kîçik, wek Şêx Eyyub û Şêx Şerîf bi xelaskirina îmanê ve meşğul bûne û elhemdulillah zefer û serkeftîneke mezin ji bidest xistine.

Îro û Banga Me

Belê îro... Îro êdî divê hinek ji me, li vê mîrasa ku hatiye tarumar kirin xwedî derkevin. Divê em ziman, elfabe, çand û welatên xwe ji fikrên nebaş û laîq biparêzin, mihafeze bikin. Emê bi meşeke Îslamî û Muhammedî vê rê bimeşînin. Emê mekteba Seîdî û Huseynî di nav milletê xweyî mezlum û belengaz de deynin û milletê xwe di bin sîya Quranê de îhya bikin. Wek Şêx Ahmedê Xanî, wek Melayê Bateyî, wek Melayê Cizîrî, wek Feqiyê Teyran, wek Mewlana Şêx Xalidê Kurdî û wek Seyda Mela Ahmed Hilmî el-Koğî...


Di axir de em dibêjin û em banga heqîyê li hemu nivîskar, weşankar, weşîner û xwendevanên musulman dikin: Werin em di bin sîya bawerîya heqîyê de destê xwe bidne hevdu! Werin em xwe bi emrê Xweda bigrin ku dibê "Te'awenû 'el'el birrî we-t teqwa" yanî alikariya hev, li ser xêr û başîyê û teqwaê -xwe parastina ji xerabiyên- bikin. Werin em bi dilsozî û durustî, rîya Şêx Ahmedê Xanî û Melayê Cizîrî bimeşînin, guhê xwe bidne Seîdê Kurdî û bi nûrên heqîqetê heyatdar bibin û vê heyatê bi milletê xwe re par bikin... Dev ji rîyên çep û xwar berdin. Dev ji rîyên materyalîst û laîq berdin. Di ziman de, di elfabê de û di her tiştî de, em razîbuna rebbê xwe bikne gâye û bi vê hessasiyetê hareket bikin. Felaketa ku hate serê milletên dinî musulman bila neyê serê me jî. Em xwe bi şopa xweda bigrin, bi şopa Mewlana Şêx Xalidê Kurdî, Şêx Seîd û Seîdê Kurdî bigrin da em jî bilind bibin.

Gelî birayên musulman û kesên xwey hemîyet! Mîraseke pir mezin, giranbiha û hêja, di destê me de ye. Ne hewceye ku em herin li ber deriyê xelkê gerokiyê bikin. Ne hewceye ku em teqlîda gërba gemmar û teqlîda gûlamên gërbê bikin. Ne hewceye ku em teqlîda materyalîst, ataîst, qominîst û laîqa bikin. Heger elfaba latînî be bila be; belê li gor çand û tarîxa gelê me, li gor razîbuna rebbê me be. Divê, elfaba Quranê di xwe de himbêz bike. Ne ku jê bireve, bi hinek nava... Ev elfaba bi hezar sala hatiye bikaranîn bila hunda nebe. Bila zarokên me ji xwendina "Suretê Fatîhê" mehrûm nebin, gëlet nexweynin.

Gelî zanîngeh, kovar, rojname, weşanxane, enstîtu û televîzyonên Kurdî! Ev banga me li we ye. Kanî herfên H, 'Eyn, Ğeyn, Sad, Ta? Ma hun dikarin bêjin evana ji berê de nîn in? Ma hun dikarin bêjin Şêx Ahmedê Xanî evana bikarneanîne? Naxwe divê em heşê xwe bidne serê xwe, li vê mîrasa dewlemend xwedî derkevin... Ne emê kêmbikin, ne jî zêde... Emê mihafeze bikin, biparêzin... Evêna mesûliyeta me ye...

ا	ب	پ	ت	ث
ج	چ	ح	خ	د
ذ	ر	ز	ژ	س
ش	ص	ض	ط	ظ
ع	غ	ف	قا	ق
ك	گی	ل	م	ن
ه	و	(لا)	ي	

Elfabeya ji teref Xelil Xeyalî ve hatiye amadekirin



Di Kitêba İbn-î Wehşîyye a bi navê "Şewq-ul Musteham Fî Marîfetû Rumuzul Eqlam" de elfaba Kurda ya berê



Evîna Resul
M. Mahmud Kiliç

Dildar!

Dildar! Tevê hezkirina bi te destpêkir, ku te dest dayê xweşik bu her tişt, ku te hezkir hat hezkirin. Navê eşqê tu ye, ji eşqê çî hebu tev li ba te kombu... Dar, devî, ruhber, heyewan, teyrik bi navê te jiyan dîtin, tên cezbê ku dema navê te tê gotin melekê asîmana. Ji tahtê pir hişk jî kanî derdibin jibo xatirê navê te... Ey Resul! Ji bo xatirê navê te çolê qemer dizivirin mêrg û çayira...

Berdilk! Dil coş dibin çağa navê te tê gotin. Bi can bê can li kaînatê her çî heye bi hezaran selat û selama li te tînin...

Ji bo hürmeta ava wechê te dadikeve çipkê baranê ji asîmana. Da ku tu bêhn bike, hilma herî xweş bi xwe dadikin şiklo şiklo gul û beybun. Bulbul ristê herî xweşik rast dîkin da ku ji te re binuhurînin. Gul û reyhanê bêhnxweş hilma xwe ji te distînin Ey Resul!

Aşiq! Aşiq bi hezkirina te mecnun in. Bi hezkirina te serşur bune ê ku dilê wan bi îman ê coş dibin. Wêjekar daim te dibêjin, hozan xweşikbuna xwe ji navê te distînin. Can tu ye, canan tu! Li cem te jiyan ê dibîne Ey Resul! Ê ku di îdraqa hezkirinê de ne...

🌸 Berdilk! Xaliq ê Rehman navê te bi yê n xwe re anî ziman. Hê tu tişt tune bu, navê te hebu. Qelesa ji mexluqa ewil te nivîsand. Cennet bi nûra te hat eşqê û xwe xemiland. Navê te bu tiştê bu wesîla qebula toba Adem... Heft qat asîman li hêvîya te seknandî mabun. Hesretê ji bona te hatin kişandin oqyanus tijî kirin. Ê ku ji eşqa te mecnun bun heyyîbîn çola. Tevê pêxembera mizgîna hati-na te da pêxemberê piştî xwe. Ji bo dîtina te ey Resul, dilê qemer bubun, ava heyatê dîtin.

🌸 Dildar! Encax qîzikê sağ sağ ketne binê axê te bi heqqî nasdikin. Bi te dest bi ken kirin zarokê sêwî û yetîm. Însanbuna xwe bi te naskirin pîrekê weke ma'denekî sivik dihatne dîtin. Hêsirê çavê situxwar û bîndesta hew bi te sekinîn. Jar û birçîya ji destê te av vexwarin. Ji kanîya dilê te av vexwarin bêava. Yê çermê wan reş bi te ji koletîyê hilkişîyan meqamê bilind. Bi te ta'm kirin êşa zilletê Ey Resul! Yê ku nefsa xwe kiribun îlah!

🌸 Berdilk! Piştî zivistanek bişid te germ kir însaniyet weke tava biharê. Şewqa nûra te qetandin tarîstanî. Weke çemê şefqetê dorhêl te şên kir. Derîyê tobê bi te vebun. Di halekî nebihîstinê de bun însan bi bangdana te guh ê wan bihîst. Dîtin te pêş wan kir. Qelbê reş û tarî bubun, bi rêdanê te ronî bun. Tu bu Ey Resul kanîya rehmetê ji bo însaniyetê...

🌸 Dildar! Tu îmam ê rêya hîdayetê ye diçe ba Rebbê me. Di silsîla hîdayetê de, tu pêxember ê herî bişewq e. Tu kanîya sîrrê ewan ê bilintirê bilinda ye. Li cem te civîyan tevê heqîqetê îmanê. Herî qencê yê berya xwe tu ye, û herî qencê dawîya xwe dîsa tu ye. Qulpa zincîra nubuwetê bi te qedîya. Ji kaînatê re bi ruken e Ey Resul! Ji Rebbê me yê bilind re...

🌸 Berdilk! 'Izzet li cem te, şeref li cem te, şan û rûmet her li cem te ye. Li hember artêşê zor-nebir serkeftinê qahrkir tim û daim yê te ne. Tirs dilê bağîya yê ku ji mehekê alabora dikir li cem te ye. Sebebê zilleta gîrbê heqîya ji te belabûye. Şurê heqîyê di destê te de batil ji hev bela kir. Tu berê xwe bide kê, li hember 'ezameta te zordest bi hurmet situyê xwe xwar dikin. Tu ye Ey Resul! Rehmet û şûr nîşanê pêxembertîya te ye...

🌸 Dildar! Welî ji te digrin kanîya hikmetê. 'Alim bi tiştê ji te dipijiqe tîjî dikin tasa 'ilmê xwe. Tu

ye kanîya muwahidayî wahdetê. Rêwîyê riya heq ji te nasdikin riya xwe... Ê ku di heqqî ba wan de qutê teqwê heye bêselewat nînin ziman navê te... Çav encax ji te distînin nûra xwe. Qelb bi hezkirina te davêjin. Dil bi coş dibin ku dema navê te dibhîzin. Navê te ye Ey Resul di 'alema hebunê de sitêrka herî rewşen.

🌸 Berdilk! Ê ku ji bo kuştina te hatin li cem te sağbun. Hêsirê nefse di bilindbuna te de helîyan. Dîgel tu qumandarê muzafer jî bu inya te ji secde ranedibu. Gah li vir û gah li wir herdem tu bi rebbê xwe re di hev dîtinê de bu. Êvara hetanî sibehê di qîyamê de di bala 'ebdîtiya xwe de bu. Ewqas li te fikir mezinantî û bilindbun Ey Resul! Wiha li kesekî nekiribu ev meqamê Mehîmud.

🌸 Dildar! Bîtehqîq! Tu ji dildayê xwe re ji canêwan jî hê li pêştir e. Îta'eta ji te re kifîta Îslamê ye. Tu şahidek mizgîndanek û hem banokek e. Ê ku ji xilatê te re teslîm nebin bera jî însaniyeta xwe ar bikin. Meşa li du riya te navekî tunebunêyî dine. 'Ezabê mezin ji wan re ye ewê ku zulm li te dikirin. Ji zorevar re heye ey Resul 'ezabekî mirêsdar.

🌸 Berdilk! Ziman nuqşan dimînin nikarin te bibêjin! Qelem bi 'ecz

situ-yê xwe xwar dikin nikarin te binvîsin. Şiteğaliya te bêimkane; kanî ew bêjêyên te bibêjin? Di kurbuna oqyanusekê de fetisandine pesindana wesfê te. Tu Resulullah e Ey hebîbê Allah! Ji ezel de tu dildar bu ji wî re, di ebed de dîsa tu berdilke. Hew ji te bi tenê re hatiye dan Ey Resul! Efendîtiya herman û bêmanê.

🌸 Dildar! Xweda yê qedirbilind dibêje: **"Bêguman! Xweda û milyaketê wî selat û selama li ser pêxember tînin. Gelî ehlê îmanê! Hun jî selatê li ser bînin û bêkêmanî selam ê lê bikin."**(Ehîzab, 56)

Her hebun bi eşqa xwe bi milyona selat û selama ji te re xilat dikin. Selatê bi rê dikin hêvîya şefa'etê ye, û hem di qatê Allah de 'îbadet e.

Ji ber vê yekê Ey Resul! Bi milyonan selat û selam li ser te be.

Allahumme sallî 'ala seyyidîna Muħammedîn we 'ela alihî we seħbihî we sellem! Eşhedu en la îlahe îllallah we eşhedu enne Muħammeden Resulullah.

"Bêguman! Xweda û milyaketê wî selat û selama li ser pêxember tînin. Gelî ehlê îmanê! Hun jî selatê li ser bînin û bêkêmanî selam ê lê bikin."(Ehîzab, 56)

Dilopên ji nûra Muhammedî

(selamên xweda lê bin)

Şiteğali, cîran û mêvan

Hatîye rîwayetkirin ji Ebu Hureyre (Xweda jê razî be) ku gotîye Resulûllah (selat û selamê Xweda li ser bin) wiha gotîye: *“Kesê îmanê bi Xweda û roja axretê tîne, bila xêrê bêje yan jî sikût bike (neşteğile). Û kesê îmanê bi Xweda û roja axretê tîne bila xatirê cîranê xwe bigre. Û kesê îmanê bi Xweda û roja axretê tîne bila xatirê mêvanê xwe bigre”* (Buxarî û Muslîm)

Dilxwaziya ji birayên Musulman re

Ji Ebu Hemze Enes ê kûrê Malîk (Xweda jê razî be) hatîye rîwayetkirin (xizmetkarê Resulûllah, selat û selamê Xweda li ser bin) ku pêxember -selat û selama Xweda li ser bin- gotîye: *“Mirovek ji we îmanê nayne hetta ku tiştê ji xwe re dixwaze, ji birayê xwe re jî nexwaze”* (Buxarî û Muslîm)

Emr û nehîyê Resulullah (s.x.l)

Ji Ebu Hureyre ‘Ebdurrehmanê kûrê Sexr (Xweda jê razî be) hatîye rîwayetkirin ku gotîye: min ji Resulûllah -selat û selama Xweda li ser bin- sehkir wiha digot: *“Tiştê min nehîya we jê kir, xwe jê dûr bikin (nekin) û tiştê min emrê we pê kir, pêk binin. Tiştê kû ûmmetên berîya we helak kiriye ew e ku zahf pirs dikirin û heqqê pêxemberê xwe de îxtîlaf dikirin (yanî herkesî tiştekan digot)”* (Buxarî û Muslîm)

Tirsa Xweda û kirina qencîyê

Hatîye rîwayetkirin ji Ebuzer, Cundub ê kûrê Cuna-de û ji Ebu ‘Ebdurrehman Mu‘az ê kûrê Cebel -Xweda ji wan razî be- ku Resulûllah (selat û selamê Xweda li ser bin) wiha gotîye: *“Tu li kur dibê bila bibê, ji Xweda bitirse. Piştî te tiştekan neqenc kir heman di pey re tiştekan qenc bike. Wê ew qencî neqencîyê paqij bike. Û bi însana re bi exlaqê qenc mu‘amele bike.”* (Tîrmîzî rîwayet kiriye û gotîye ev hehdîs hesen e. Di hinek nusxa de gotîye hesene û sehîh e)

Rastî

Hatîye rîwayetkirin ji Ebu ‘Emr -hinka gotîye Ebu Emr e- Sufyan İbnî Ebdullah (Xweda jê razî be) gotîye ku min go: *“Ya Resulê Xweda! Di îslamê de ji min re peyvekî bêje ku ji te pêve ji ti kesî ne pirsim.”* Resulê Xweda (sellellahu

‘eleyhî wesellem) go: *“Bêje min îman bi Xweda anî û piştî rast be -di tevî îşê xwe de rast be-”* (Muslîm rîwayetkiriye)

Qencî û guneh

Ji Newas İbnî Şem‘an (Xweda jê razî be) hatîye rîwayetkirin kû Pêxember (sellellahu ‘eleyhî wesellem) gotîye: *“Qencî exlaqê baş e û gûneh ewe kû dilê te li ser runanê û ti naxwazî kû însan pê bizanibin.”* (Muslîm rîwayet kiriye)

Hizkirina Xweda û ya însana

Ji Ebul ‘Ebbas Sehl İbnî Se‘d Es-Seïdî (redîyellahî ‘enhu) hatîye rîwayetkirin gotîye kû; zilamek hate ba Pêxember (sellellahu ‘eleyhî wesellem) û go: *“Ya Resulê Xweda! ‘Emelî bikim ewê Xweda ji min hizbike û îhsan jî ji min hizbikin.”*

Go: *“Di dînyê de zûhdê bike (çave xwe bernede dînyayê) wê Xweda hiz ji te bike. Û çavê xwe berî destê însana nede wê însan ji te hiz bikin.”* (Hedîs hesen e. İbnî Mace û wekî din jî bi îsnadekî hesen rîwayetkiriye)

Musulman birayê musulman e

Ji Ebu Hureyre (redîyellahu ‘enhu) hatîye rîwayetkirin gotîye kû; Resulê Xweda (sellellahu ‘eleyhî wesellem) gotîye: *“Ji hev hesedê nekin. Bi hîle qiymeta (fiyeta) eşya li hev zêde nekin (yanî ji bo kufiyet zêde bibe xwe wekî mişterîya nîşan nedin) ji hev ne qehîrin (buğz nekin). Piştî xwe nedin hev. Li ser bazara hev bazarê nekin (yanî weke kû bêje “ji wî ezê bihatir bikirim). Û bibin ‘îbadê Xweda, birayê hev. Musluman bîrayê misilman e; lê zûlmê nake, wî bi tenê nahêle, wî virek (derewçî) dernax e û wî biçuk nake. Teqwa di virde ye (îşaretî bibal sînga xwe ve dikir sê cara). Besî mirovekîye ji neqencîyê kû birayê xweyê misilman biçuk bike. Her tişkê misilman li ser misilman heram e: Xuna wî, malê wî û irza wî (namusa wî). (Divê xuna wî bê heq nerjîne, malê wî bê îzna wî negre û namusa wî talan neke, bi çav kî xerab li namusa wî nenêre)”* (Muslîm rîwayetkiriye)

Kesê ku...

Hatîye rîwayetkirin ji Ebu Hureyre, wî ji Pêxember (sellellahu ‘eleyhî wesellem) rîwayetkiriye kû wiha gotîye:

“Kesê ji muminekî kederek (zehmetî) ji kederê dinyayê îzale bike, Xweda ewê kederek ji kederê roja qiyametê ji wî îzale bike. **Kesê li yekî destteng fireyîyê çêke**, wê Xweda li dinya û axretê li ser wî fireyîyê çêke. **Kesê misilmanekî star bike** (‘eybekî wî veşêre) wê Xweda, li dinya û axrete (‘eyb û gunehê) wî star bike. **Heta kû mirovok di arîkariya birayê xwe de be**, Xweda jî di arîkariya wî de ye. **Kesê ji bo teleba ‘ilîm di rêkî de here**, Xweda di muqabil vê de wê rîyekî bibal cennetê ve wê rê rehet bike. **Çi wexta ku qewmek di malekî ji malê Xweda de, kom bibin û kîtaba Xweda (Quran) bixwînin** îllehîm dê sekîne (hizura gelb) bi ser wan de birêje û dê sekîne wan (hemêz bike) gercî xwe bike û milyaket li dor wan kom bibin û dê Xweda behsa wan li ba yên cem xwe bike (yanî wê behsa wan ji milyaketa ra bike). Yên kû ‘emelê wî, wî bipaş bixe, neseba wî, wî bipêş naxe (yanî yên kû bi ‘emelê xwe li paš be, li ba Xweda neseba wî menfê’et nade wî û wî nade pêş)” (Muslîm ‘eynî bi van lefza ev hedîs rîwayetkiryê)

Nîşanê Minafiqa

Ji Ebu Hureyre hatiye rîwayetkirin ku Pêxember (Sellellahu ‘aleyhî wesellem) wiha gotîye: “Nîşanê minafiqa sîsê ne: Wexta diştegîle derewa dike, wexta soz dide soza xwe dişkîne û wexta emîn tê dîtin xayintîyê dike.” (Muħeddîsa li ser tifaq kirne)

Îman û hizkirin

Hatiye rîwayetkirin ji Ebu Hûreyre, gotîye kû Resulê xweda (Sellellahu ‘aleyhî wessellem) gotîye: “Ez sond dixwûm bi wîyê kû canê min didestê wî de ye; hetta hûn îmanê neynin wûn naçin cennetê. Û hûn îmanê naynin; hetta hûn ji hev hiznekin. Ez tiştêkî ji we re bêjim ku wexta hûn wî tiştî bikin hûnê ji hev hizbikin? Selam dayinê di nav xwe de belav bikin. (kî rastî kî hat bila selamê bide)” (Muslîm)

Alîkariya jinebî û feqîra

Hatiye rîwayetkirin ji (diya me) ‘Aîşe (redîyellahu ‘enha) ku Pêxember (sellellahu ‘aleyhî wessellem) wiha gotîye: “Mirovê kû ihtîyaciye jinebî û miskîna (feqîra) pêk bîne –alî wan bike– weke mirovê di rîya xwedê da cîhad dike (yanî di dereca wî de ye).” (Diya me ‘Aîşe (r. ‘enha) go: “Ez zen dikim wiha jî go: “Û weke mirovê ku şeva xwe bi ‘îbadetê derbas dike qet nasekine û weke mirovê ku her tim bi rojîye qet nafitire (yanî di dereca wan daye)” (Buxarî – Muslîm)

Cîran

Hatiye rîwayetkirin ji îbnî ‘Umer û (diya me) ‘Aîşe (redîyellahu ‘enhûm) gotine kû Resulê xweda (Sellellahu ‘aleyhî wesellem) gotîye: “Cebraîl, hewqasî tewsiya cîrana li min kir hetta min zen kir wê wî bike waris ji wî ra (yanî min texmîn kir kû piştî mirina cîran wê mîrasa wî ji cîranê wî re bihêle)” (Muħeddîsa li ser vê hedîsê ittîfaqî kiriyê)


Dê û Bav

Hatiye rîwayetkirin ji Enes (redîyellahu ‘enhu) ku Pêxember (Sellellahu ‘aleyhî wesellem) wiha gotîye: “Pozê wî bi erdê ve bixirike, pozê wî bi erdê ve bi xirike, pozê wî bi erdê ve bixirike! Ew kesê kû bighêje yextiyariya dê û bavê xwe yan jî ê yekî ji wan; û neçe cennetê.” (Mûslîm)

Kengî min xwe bi sinneta pêxember digirt, rê rohnî dibu

“...M in baş temaşe kir ku; hemî meselên sinneta senîyyê, heta edebên biçuk; wek van pisulayên di gemîyan de ku xeta rast nişan didê, bê hed li nav riyên reş û tarî û gelekî bizirar min weka miftakê (bişkovkekê) didît. Hem di wê gera ruhanî de, di wexta ku mi xwe dibin barê giran û zor de didît, tabî’bûna sinneta senîyyê temamê barê minî giran li ser mi sivik dikir. “Gelo ma ev tevgerî heqq e, fêda wê ma heye?” **Bi sinneta senîyye, ez ji teredût, weswesan û ji endîşa xelas dibum.**

Wexta mi destê xwe jê dikişand, min didît ku te’de û zorî pir dibê, riyê ku meriv nizanê ku rê derkeve pir hene. Bar, giran e; û ez jî ‘acizim. Nêrina min kurt e. Rê jî reş û tarî ye. Kengî min xwe bi sinnetê digirt rê rohnî dibu. Rîya bi selamet xuya dibu. Bi halê xwe dihisîyam ku bar sivik dibê û zor û te’deyî radibu.” (Bedîuzzeman, Wergêr: Ken’anê Nisêbînî)



Ji “Munebbîhat” a Îbn-î Hecer ê ‘Esqelanî

🌹 **Du tişt hene ji wan qencîr tu tişt tune:** Yek, baweriya bi Xweda ye; A duduya feyda ji musulmana re ye.

🌹 **Du tişt hene ji wan xerabtîr tu tişt tune:** Yek, şirikatiya ji Xweda re ye; A dududiya zirara li musulmana ye.

🌹 **Hz. Ebu Bekir (Razîbuna Xweda lê be) dibêje:** “Kesê bê ‘emelê(zad) salih bikeve qebrê, weka bê gemi bikeve behrê (siwar be, here ser behrê)”

🌹 **Hz. Osman (Razîbuna Xweda lê be) dibêje:** “Çem û derdê dinyê tarîtiye di dil da. Derdê axretê jî ronahî û nure di dil da.”

🌹 **Hz. Ali (Razîbuna Xweda lê be) dibêje:** “Ew kesê di gera ‘ilmê de be, cennet jî di gera wî da ye. Ew kesê di gera guneha da be doj (cehennem) jî di gera wî de ye.”

🌹 **Sufyanê Sewrî dibêje:** “Çi gunehê ji şehwetê be, bexşandina wî tê hêvîkirin. Feqet çî gunehê ji qurretîyê be, ew bexşîrî jê nayê hêvîkirin; lewra serhildana şeytan li ber Xweda koka wê ji qurretîyê û şemitandina Hz. Adem (Razîbuna Xweda lê be) jî, koka wê ji îştîhaê bu.”

🌹 **Gotinên hinek hekîman:** “Kesê ku wehm di dil de çêke, bike ku ji Xweda dosttir dostê wî hebe wî Xweda hindik naskirîye. Û kesê ku bawer bike ku ji nefsa wî neyartir neyarê wî hebê wî xwe baş nasnekirîye. Bi tehqîq şehwet miluka dike kole. Sebr jî kola dike miluk. Ma nanêrî li serpêhatiya Hz. Yusuf û a Zelêxa.

Mizgîn li wî kesê ku eqlê wî jê re bibe serok û kêfa wî jê re bibe hêsir. Û weyl li wî kesi be ku kêf û zewqa wî ji wî re bibe serok û eqlê wî bibe hêsirê wi.

Kesê guneha terk bike dilê wî tenik dibe.

Kesê terka herama bike û ji helal bixwe fikra wî pak û paqij dibe.

Kesê bi ta’etê xwe nêzîki Xwedê bike, ew di nav xelqê de gerib e.

🌹 **Çar tişt hene rindî; feqet çar tişt ji wan rindtir in.**

1- Fedi-edeb-heya di zilama da be rind e. Lê ji pîreka re rindtir e.

2- ‘Edalet, rind e lê ji reîsa re rindtir e.

3- Poşmani-tewbe, rind e ji kola re; lê ji xorta re rindtir e û xweştir e.

4- Camêrî-merdîtî, ji maldara re xweş e; lê ji feqîran re xweştir e.

🌹 **Çar tişt hene çepel e-pis e; lê ji hineka re çepeltir e:**

1- Guneh ji ciwana re çepel e; lê ji kola re çepeltir e

2- Meşgultiya bi dinê re ji cahila re çepel e; lê ji ‘alima re bêtir çepel e.

3- Kislanî-tiralî; ya di ta’etê da ji herkesî re çepel e; lê ji ‘alim û feqîyan re çepeltir e.

4- Qurretî-kibr; ji maldara re çepel e, lê ji feqîra re çepeltir e.

🌹 **Çar tişt di cennetê de ji cennetê xweştir-qencîr û bi xêrtir e:**

1- Ebediyeta li cennetê, ji cennetê bi xêrtir e

2- Xizmeta meleka li cennetê ji cennetê xweştir e

3- Cîrantiya pêxembera li cennetê ji cennetê xweştir e

4- Razibuna Xweda li cennetê ji cennetê xweştir e

🌹 **Çar cewher hene, dîn, aqil, heya, ‘emelê salih; feqet çar tişt ji wan zail dike:**

1- Aqil cewherek e; feqet hêrs wî zail dike

2- Dîn cewher e; feqet kîn (çavnebari) wî radike

3- Heya-edeb cewherek e; feqet çikôsî (tematî) wê radike

4- ‘Emelê salih cewherek e; feqet paşgotinî wê radike, wê xêrê winda dike.



Ew Hatîye Bihar Anîye

Zivistanbu...

Sal 571... Cezîretul ‘Ereb wek her aliyê dinyayê di tarîtiyeka wisadebu ku heta wî çagî dinya nebubu şahid û nedîtibu. Tarîtiya kufr û zulm û şîrkê însana hawîrdor girtibu. Fisq û fîcur ta’de û zordestî, zina û dizî qetl û qutul, hîle û xapandin faîz û perçiqandina qelsa di nav wan de bubu ‘adet. Li gor van rûreşa keçîkên qîzî rûreşîya wan rûreşa zêde dikir, ewan keçîkê bê gune û bê qebahe, bisağî dixistin binê erdê û dîkuştin.

Însanê wê dewrê ji însaniyê derketibun, ketibun dereca esfelessafilîne. Weka tamamê însaniyê Cezîretul ‘Ereb, digel kevir û dar, digel erd û asîman digel xêlî û kûrmîkê bin erdê jî, li hêvîya taveka Rehmanî, li hêvîya taveka ku ronayî bide ser dinyayê û ser Cezîretul ‘Erebê û wan ji tarîtiya kufr û zulmê fisq û fîcur û neheqî û zordestiyê xelas bike.

Însan ji însaniyeta xwe derketibun. Li her hêlê xwedênenasî û zulm peyde bubu. Ji boy tiştê biçuk û beradayî însana qestî canê hev, malê hev, xwîna hev dikir. Tarîti li ser tarîtiyê hatibu dinyayê nexasim tarîti li ser Cezîretul ‘Ereb zêde bubu. Temamê însana li hêvîya nûr û ronahiyekê, li hêvîya tavekê bun. Lewra şev çîqa çûbu, tarîtiya xwe zêde kiribu û hêdî hêdî bi bal sibeheke nû, bi bal sibeheke bixêr, bi bal sibeheke ronahî ve diçû.

Zivistanbu... Lewra zivistan çawa digre ser dinyayê qeşem û cemed ta’de û ezîyetê bi xwere tîne însana di mala wan de di mezela wan de hepis dike; bi vî hewayî jî zivistan kufr û zulm û şîrkê û îlhade; ya fisq û fîcurê, însana di nefis û şehweta wan de hepis kiribu. Lewra zivistaneka wusa bi şiddet û ezîyet, wîsa zêde bu; ku eql û qelbê însana ujdane û merhemeta însana qeşem û cemed girtibu. Îdî însan bi rehmet, bi şefqet li hevdu nedinêrî. Lazimbu ku tavek derkeve biharek were qeşema û cemed dilê wan bihelîne, carek dî wan bike însan.

Zivistanbu... Çawa ku tarîbu şevbu, bi wî hewayî jî zivistanbu... Çavê însana li rê, dilê însana bi hêvî bu. Li hêvîya bihareke xweş, li hêvîya bihareka ku gul kulîlka



bide. Tavek derkeve rehmetê bibarîne û wê cemed qelbê û dilê wana bihelîne. Zivistan hêdî hêdî şiddeta xwe zêde dikir. Zivistan hêdî hêdî qeşem û cemed xwe zêde dikir... Le çîqa zivistan zêde dibu, mizgînîya bihare dida. Çawa şevê mizgînîya fecreka bixêr dida, zivistan jî bi cemed û qeşema xwe mizgînîya biharekê dida.

Nûr dertê, Bihar Tê...

Belêsal 571e... Bihare, Nîsane... 12ê Reb’ulewwelê...

Şevbu, tarîbu... Tarîti hêdî hêdî bi bal ronahiyê ve diçû. Wê rojê tavê zû dikir, lez dikir ji boy ku zû were û sibeh lêxe. Wê rojê tavê ‘ecele dikir, ji boy ku zû nura Muhammedî bide ser dinyayê. Şewq û şemala xwe bide ser însaniyê, wan qelbê wan, ujdane wanî ku bi qeşem û cemed kufrê û şîrkê û îlhade cemidandîye, kirîye qeşem, kirîye kevir, da bi helîne û nerm bike. Tavê lez dikir bêsebr bu, ‘ecele dikir, lez dikir, zû dikir; ji boy sibeha Muhammedî mizgîn bide. Tarîti îdî hêdî hêdî radibu. Lewra tav çawa ku ji derketinêre zû dikir, bi vî hewayî tarîti jiber tavê direvîya.

Sibeh lédabu. Fecra sadiq, fecra Muhammed ‘aleyhîsselat û wesselam di roja 12ê li ber destê sibehê

ji dinyayêre çavê xwe dişkand. Şewq û şemala wî, da tamamê cihanê; da sala 571 û piştî wê... Heta qiyametê tava Muhammedî, da dila. Wan qelbê ku cemidibun, wan ujdane ku hişk bubun, wan ujdane ku qeşem girtibun, bi tava Muhammedî îdî hêdî hêdî nerm dibun...

Mizgînîya çebûnê û wîladeta Hz. Muhammed, li tamamê cihanê nav da û deng da. Melaîketa li asîman, cinna û însana li erdê û zîrruhê di dinyayêde temama heta kevrê û dara mizgînîya wîladeta fexrê kaînatê didan hevdu. Hevdu hemêz dikirin û xêr hatin didanê. Di gotinê **“Tu bi xêr hatî! Tu li ser ser û çavê me hatî! Merheben merheben merheben...”**

Belê! Nûr derketîye û bihar hatîye. Ê heta roja qiyametê jî ewê bihar be. Her çîqas di hinek ciya de û di hinek dila de cemed û qeşa dewam bike jî, bihara Muhammedî heta roja qiyametê berdewam e. Heta cenneta ebedî ji yê dil biharre biwelidîne...



Hefteya Musted'efa û Newroz

“**Newroz**”, roja nû ye. Serê biharê ye. Azadiya ji bindestî û koletiyê ye. Newroz, şefeqlêdan e, tekbîr anîn e, serhildan e... Newroz roja bilinbûna ala biratiyê ye. Newroz xelasiya ji hêmu qeyd û zincîra ye.

Newroz, di serî de xelasiya ji hêsrîtiya nefsê û xwestekên heywanî ye. Newroz, xelasiya ji qeydên neyartîyê û şehwetê ye. Piştî xwenaskirin û xelasiya ji qeyd û bendên ferdî; êdî newroz xelasiya ji ‘evdîtiya ‘evdan e. Newroz, naskirin û hişyariya li ser gurên di cilê mêşina de, ye. Newroz naskirina însanên zalim û Xwedênenas e. Newroz, naskirina kolên ku hêsrê şehwet û mal û meqamên dunyayê ne; belê xwe azad û reb dihesibênin li ser însana.


Newroz naskirin û şikandina puta ye. Putên ku rebbê hemû însana înkâr dikin û li ser rûyê erdê de’wa seroktî û qanûn û nîzama dikin. Newroz naskirina Dehaq e, Nemrud e, Fîr’ewn e...

Ewê ku bi naskirin û ‘evdîtiya rebbê xwe azad nebube, welew navê roja wî newroz be jî, di heqîqetê de li dunya û axretê rojên wî “**narroz**” in. Weke newrozên agirperesta û xwedênenasa ne. Narroz; yanî rojên ku dinya û axreta meriv

dişewitênin. Belê kesên ku ji ‘evdîtiya nefsê û ‘evdan azadbune, newrozên wan “**nûroz**” in. Nûroz; yanî li dunya û axretê rojên rohnayî û bi şahî...

“Newroz” Çewa dibe “Nûroz”

Heger a ku hatiye bihar be, gul û çiçek bin, qedandina tarîtiyê û derketina sibehê be; ewê rohnayî be û heqîqeta rojê “**Nûroz**” be. Her wekî ku xaliq û xwediyê Kurda û hemû însana, hetta xaliq û xwediyê hemû hebûnê, gotiye: “**Allahu nûr-us semawatî wel-erd.**” “Allah nûra asîmana û erdê ye.” Ma ji boy heqîqeta newrozê ji vê xweşiktir îzah heye... **Ê ku çavê xwe bigre li xwe dike şev. Bi çav girtinê roj hunda nabe...**



Em Newrozê ji Şêx Ahmedê Xanî hîndibin...

Nivîskar û danaskarê newrozê, bê şek Şêx Ahmedê Xanî û “**Mem û Zîn**” a wî ye. Navê newrozê, wî bi me daye hînkirin.

Di roja nû, serê biharê de rêwîtiya eşq û evîna heqîqî bi cilê mecazî destpêdike...

Hemû kesên heş li ser û xwey eqî, dizane ku Şêx Aħmedê Xanî weliyekî xweda bûye û bi zehrê tesewwifê gihîştina xweda, rêwîtiya eşqa heqîqî, bi **“Mem û Zîn”**ê daye hînkirin. Belê, ma’etteessuf, moza hinguv, **avê** veduxwe hinguv derdixe, **mar**, **avê** veduxwe jehrê derdixe.

Ê ku dixwaze heqîqetê bi çavê xwe bibîne bila muraca’efî eslê **“Mem û Zîn”**ê bike û bixweyne... Belê bi vexwarina moza hinguv...

Wexta em guh didine Şêx Aħmedê Xanî, di serî de dibêje: **“Sernameyê nam e, namê Allah...”** Wexta em ji Şêx Aħmedê Xanî dipirsin, dibên Newroz çewa ye? Dibê: **“Lêkin ne bi tuhmet û bi minnet/Belkî bi terîqê Ser’ û sunnet”**

Newroz ev e gellî xuşk û birayan. Newroz, rêwîtiya bi ber cema û kemala xweda ve ye. Newroz, evîndariya xweda ye, bi dîtina xweşikahî û cemala wî, di ayîne û neynik a hebûnê de. Her wek Xanî dibêje: **“Kes nîn e ne talibê cema/ Kes nîn e ne rağibê wîsalê”**

Madem cemîl Allah e, yên herî xweşik û xwedî her xweşikahîyê ew e, yên bê dawî ew e; de werin em jî, îda newroza xwe bikin...

Hefteya Musted’efa

Wek tê zanîn berya newrozê heftîyek, **“Hefteya Musted’efên Cihanê”** hatiye îlan kirin. Ji bo ku roja nû destpêbike, çend roja mezlum, meħrum, meħkum, sêwî û belengazên gelê me û yên cihanê tene bîranîn û ji rebbê ‘alemê, bi xebata xelqê Musted’ef, rojên nû; yanî newroz tene xwestin. Weka ku Rebbê ‘alemê di Quranê de dibêje:

“Em dixwazin qenciyan bikin li wan kesên di erdê de hatine bêhêz kirin (musted’ef) û em wan bikin rêber û em wan bikin waris.” (Suretê Qeses, 5)

Naxwe piştî ku me mezlumiya gellê xwe û ummeta Îslamê fêmkir; divê em zanibin ku rebbê me dixwaze me, li ser ruyê erdê bike wêris û xelîfe. Xweda dixwaze ku **Musted’ef** şoreş û dewrima xwe pêk bînin û cihanê ji zalim û zordesta paqijkin. Aha ew roj newroz e. Ew rojê nû ye. Lewra ew roj wê destpêka biharê û rojên azad be...



Ya Rebbî! Tu Bidî Xatirê Mezinahîya Navê Xwe

“Ey azadî! Ez ji te hezdikim. Ez muhtacê te me. Ez aşiqê te me. Bê te Jiyan pir zehmet û dijwar e. Bê te ez jî tune me. Ez bi evîn, dostî û dilovanîya te têr bûm e.

Ey azadî! Ez ji zulmê kerixim, ji hêsîrîyê kerixim. Ez ji zincîrê kerixîme, ji zîndanê kerixîme, ji hikûmetê kerixîme. Ji mecbûrîyetê nefret dikim. Ez ji wan tişt û ji wan kesên ku dixwazin te hêsîr bikin û girêdin kerixîme. Jiyana min ji bo te ye. Ciwanîya min ji bo te ye. Hebûn a min ji bo te ye.

Ey azadî! Pîroz azadî! Ez dixwazim te li textê bidim runîstandin. An tu gazî min bike, An jî ez gazî te bikim!


Ey azadî! Çûka min a delal a bask şikestî. Xwezî min te ji notirvanên wehşetê û ji kesên ku dîwaran, sînoran, qelan û zîndan çêdikin bikarîya rizgar bikira. Xwezî min qefesa te bişkanda û te di hewayaya sibehê ya paqij, bê ‘ewr û bê toz de bikarîya bifiranda. Lêbelê... Destên min jî şikandine, zimanê min jî jêkirine. Zincîr avêtine lingên min û çavên min girêdane.” (‘Elî Şerî’efî, Xwe Şoreşvan Gihandin)

Gelo ez pir tiştê nebaş dixwazim? Ji kerema xwe hûn bibêjin bes nîne bindestîya çend sed salan? Heta kengê dê ev bindestî berdewam bike? Çi gav li mizgeft û camîyên me gundî, bajarî, memûr, xwendekar, karker, cotkar bi kurtasî hemû gelê min... Çi gav dê li Cum’ek, xutbeke bi zimanê xwe guhdarî bikin.

Gelo zarokên me jî, rojê dê derkevin, ji bo azadîya gelê xwe û dewleta Îslamê helbestan bixwînin? Siba roj dîtina, tevî welatê minî Kurdistanê cihanek Îslamî, bi van çavên gunehkar dê mumkun be? Ez nava dil û cigerên xwe hawar dikim. **Hawar, Hawar, Hawar ya Rebbê ‘alemê!** Hawar ya Xaliqê hemû cihanê, Hawar ya xwedîyê hemû celal û îkramê, tu bi xatirê mezinahîya rehmet û ‘edaleta xwe bikî tu di’ayên van feqîr û bindestan qebûl bikî.

Ya Rebbî, tu me wekî dewra se’adetê, azad û serfiraz bikî. **Ya Rebbî** tu me ji bindestîya nijadpestan û faşîstên zalim rizgar bikî. **Ya Rebbî,** tu li dijî top û sîlehan, îman, quwet û aqilek wekî Xalid Bin Welîd bidî. **Ya Rebbî,** li hemberê tîrsa van zordanan, ên ku dixwazin dilên me bi tîrsa mirin û îşkenceyê tijî bikin, her wiha ji îman û evîna azadîyê re cih nehêlin, tu îman û cisaretek wekî Hz. ‘Ûmer bidî.

Ya Rebbî, di vê dewra xerab de, ji bo ku em bikarin li ser pîyên xwe bisekinin, tu îmanek wekî Hz. Ebûbekrê Sidîq bidî. **Ya Rebbî,** tu Jiyanek li gor Quran û Sunneta Resulullah nesîbê vî gelfî bikî. **Amîn ya Rebbî,** tu bidî xatirê mezinahîya navê xwe tu di’ayên van ‘evdên xwe yên bindest û gunehkar qebûl bikî... (M. Norşênî)



Rêzenivîsek Li Ser Hinek Stranên Nêzdîroka Me

Tew Dinyayê



Li ser Serhildana Şêx 'Ubeydullahê Nehrî

Gele Xwendevanên hêja! Heger Xwedayê te'ala destûrê bide emê ji vê jimara kovara "Kelhaamed" dest pê bikin û rêzenivîsek dirêj pêşkêşî we xwendevanên hêja bikin. Kurtehiya vê rêze nivîsê nêzdîroka me ye. Ji ber ku dîrok ji hêla zordestan ve bi awayekî resmî hatîye nivîsandin bê şek tê de geletiyên curbecur hene. Ji lew em di vê rêzenivîsê de xwe davêjin bêxtê dengbêja, gazî wan dikin. Da ku bîna hawara me. Û bi nalîn û nuhurandinên xwe destanê nêzdîroka bav û kalên me ji me re bi nuhurîn.

Wekî hûn jî dizanin mêtîyê dîroka Kurda, nexasim dîroka nêz di stranên de veşartîye. Şîna wan, şahîya wan, herba wan, cenga wan, derdê wan, dermanê wan di sitranan de hatîye hûnandin. Geh destanê mîrxasîyê, geh şerê birakujîyê, geh nalîna evîndarek, geh bêbextîya xayîn û kevne neyarek, geh halê kalî û koraniye, ehwale terkîwelat û gerîbîyê, hesreta mal û mal-

bat, derdê dîrketina ji al û ewlad, war û welat, jîna li dorhêla çiya weya qeraxê behr û geliya, geh reva ji koledar û axayek... Geh starbûna li nêk mîr, şêx, beg û melayek. Bi kurtî demek stran kurtejiya Kurda bû. Çavkanîya dîroka wanbû. Her wiha stranbêj jî...

Deka werin em bikevin nav pelên dîrokê. "Dewleta Alê Osman" serberjêr bûye. Wekî şerek extîyar nikare li pey nêçîrê bi beze. Ji ber çavbirçîbuna xwe çiqas nêçîra xwe direvîne. Di dewsê de heyfa xwe ji Kurda distîne. Rumeta ağa, şêx û pêşîvanên wan nahêle. Ji lew ew jî serî hildidin. Ser hildan li pey serhildanê... We lê ji bil vê qirna paşîn di tu serhildanên Kurda de şopa nijadperestîyê û doza irqê ne xwiya ye. Daxwaza wan her ev e. Biratîya musulmana, jiyaneke serbilind û azad, parastina şer'a Muhammedî. Bi kurtî jiyaneke serbilind û wekhevî di gel qewm û nijadên musulman...

"Şêx 'Ubeydullahê Nehrî" jî yek ji wan

pêşvîna ye ku li dij "Dewleta Alê Osman" û Îran serhildaye. Lê mixabin serhildana wî ji hêla dewleta Îran, Êris û "Alê Osman" ve hatiye vemirandin. Kurte dîroka vê serhildanê wihareng e: Li dor hêla sala 1880 mîladî "**Şêx 'Ubeydullahê Nehrî**" û digel murîdên xwe ji bo; ku ji bo Kurda jînekî azad li gor Îslamê bikar bînin, ewil li dij şahê Îranê serhildanekî li dar dixin. Di demeke kurt de ev serhildan hetta Tewrêz a Îranê bi ser dikeve. Şahê Îranê dikeve tengasîyê û gazî û hawara xwe bi ser "Dewleta Alê Osman", Uris û dewletên ğerbî de dibe. Bi tevî ku ev dewletên han ji hev re neyar xwiyanin jî, lê li dij "**Şêx 'Ubeydullah**" dibin yek. Lewra "**Şêx 'Ubeydullah**" musulman e. Ê li Kurdistanê rê nedaye damezrandina komara Ermenîyan. Ev dibe sebebê neyartîya Êris û dewletên ğerbî. Ji ber ku hukumraniya "Alê Osman" ketiye talukê, ew jî dajon piştî şahê Îranê. Kevne neyar ji hev dibin yar û bi serê Musulmanê Kurd de agir dibarînin. Çar ali li "**Şêx 'Ubeydullah**" digrin û serhildana wî vedimînin. Şêx bi hîlekari li Stenbolê dîl tê girtin. Ê dewleta "Alê Osman" bi emrê "Abdulhemîdê Duduyan" wî terkî welat dike û dişîne Medîne. Şêx dibe şehîdê ğurbetê. Bi hesreta welatê xwe li wir dimre.

Lê li alîyê din hinek mêrxas wekî Hemze û hevalên xwe hêj jî serhildanê didomînin û teslîm nabin. Ji lew emir Nîzam dikeve pey dek û dolaba. Bi Quranê sond dixwe dibê (ji çîya dakevîn ezê we bibexşînim. Hetta ez li ser erdê bim nahêlim kes têkilî we bibe.) Mixabin Hemze û hevalên xwe ji ber ku yeqîna wan bi Quranê zêde ye, gûman nakin ku kesekî musulman wê Quran a mubîn bike perda derewkarîya xwe. Ji lew teslîm dibin. Bila kalam li vir bimîne emê veşerin qonaxa kafirê emir Nîzam. Bê ka çî dek û dolab li wir dikelin...

Emir Nizam di qonaxa xwe de çalekî dide kollandin û dikeve bin axê. Ê li dor çalê kemînek dide girêdan. Dema Hemze û hevalên xwe dikevin qonaxa emir Nîzam ji rast û çep paş û pêş ve berê gûla li wan tê girêdan û ev mêrxas hemî bi bêbextî tèn kuştin. Emîr Nîzam ji goya 'ehda xwe bi cih anîye lewra wexta ew hatine kuştin ew ne li ser erdê di bin erdê da buye. Li gor qene'eta me klama Cewher begê li ser vê buyera reş hatiye hûnandin. De ka werin em guh bidin nuhurandina stranbêjê xwe. Bê ka bi çî hawayî vê buyerê tîne ziman keremkin:

*Heywayêêê... Heywayê hey wayêêêê
Mu'teberêêê... Korê bi Nemayêêê...
Ez nemînim ji "Tewrêz" ê
Heyyanî "Têran" ê*

*Agirê kule bikeve
Qewl û qirar û soz û bextê şahê vê Îranê
Çawa bi destê bavê "Gulîzer" ê
Siwarê rîşal girtin
Li qonaxa kafirê "Emir Nîzam"
Çotekî gulê tekelya bi dest berdanê
Nemînim ax nemînim nemînim
Nemînim li dinyayê... Wayê wayê ax
Hê hu hêêêêy aaa...x*

*Heywayêêêê... Heywayê hey wayêêêê
Mu'teberê korêbi Nemayêêê....
Ezê bi "Diyarê Kela Çaliyê" diketim bi birrekê
Min dî
Ji malê siwarbu bavê "Gulîzer" ê
Siwarê rîşal
Tevdalî "Cewher Beg" e
Herê Cewher Bego
Te malik xirabo
Ûcaği koro
Temîn û wesyeta min li te be
Gava diçî qonaxa kafirê Emir Nîzam
Ax lê gidî
Destê xwe bide ser tetika leganê
Bişkokê veke
Nemînim nemînim...
Ax nemînim nemînim
Nemînim li dinyayê wax ayêêêê
Ezê bi rebena Cewher Begê mîrê ziravim
Loy loy lo lo li min lo ay waaax aaaay
Hê Hu hêêêê...y aaaaax*

Gelî birayên 'ezîz! Her çiqas "Dewleta Alê Osman" li Kurda zulm kiribe jî, dema "Dewleta Alê Osman" li ber hêzên kufrî ğerbî ketiye tengasîyê Kurda ew tenê nehiştine û ajotine piştî wê. Wekî Ermen û hinek nîjadên din de'wa ji hevqetîna bi "Dewleta Alê Osman" re nekirine...

Heger Allah te'ala îzna me bide emê di rêzenivîsa duduyan de dewam bikin û geh herin "Geliyê Zîla", geh bikşên serê "Kela Xînus" ê, geh li "Dêrsîm" ê, geh geh "Liser Xetê" û geh "Libin Xetê" stranbêja bidin nuhurandin. Hetta jimara dî bimînin di xêr û xweşîyê de. Spartî Xweda bin.

Wesiyeta Şêx Ahmed Yasîn

Ezim ku yextîyerekî hizhizî me. Du destê minî pûç, ne qelemê digrin û ne jî sîlehê! Û ez ne xetîbekî Ezim ku porê min sipî buye, û rojê 'umrê xweyî dawî dijînim, nexweşiyê şiklo şiklo ez girtime û belayê zeman bi ser min de bariya ne. Hew xwestinek min bi tenê heye ku muslumanê weke min ji zê'afiyet û 'ecza min mutesîr bibin û binvîsînin.

Hun gelî musluman! Miriyê bê ziman 'aciz û helak buyî! Li hember van felek û bobelata ma hê qelbê we nacîfile! Ma xelkek tuneye? Ma kesek tuneye ku jibo xweda û jibo namusa vê ummetê biqahere? Ma kesek şervannî bi hember vanê ku; dîgel em şervannî bi 'izzetin, me bi terorîstî didhe navdank bisekinînin? Ma ev Ummet şerm nake li hember şerefa xweyî d'ecîqe?

Ma qey taqeta we naghê ku hun tev derkevin meydana û jibona me du'ra bikin bibêjin **"Ey Rebbê me! Qeweta me bicivîne serhev, kêmasiyê me rake û me daxilî nava 'îbadê xweyî salîh bike!"** Qey hun nikarin vêna jî bibêjin?

Di nêz de hunê mirinê me yî mezin bibhîzin! Wê wextê liser înya me ev wê bê nivsandin: **"Li hember îsraîl me liberxwe da, me şerkîr, û ji meydana herbê em nerevîn."** Û dîgel me zarokê me, jinê me, îxtiyarê me û ciwanê me wê bimrin. Emê wan ji vê ummeta bê zimanre bikin şewat.

Hêvîya ku emê teslîm bibin û beyreqê sipî biçikilînin ji me nekin! Lewra em baş dizanin ku em vêna bikin jî emê bimrin. Bihêlin em bi

Temenîya me ji xweda eve ku heç kesê emaneta vedşêrin xweda heyfê ji wan bigre. Em bawerin ku hunê nekevin 'eleyhê me. Ey serokê ummetê! Ey gelê musluman! Nekevin 'eleyhê me dîsa jî em doza tu tiştêkî li we nakin.

Ya Rebbî! Em halê xwe hewaleyî te dîkin. Em gilî û gazinê hew bi te dîkin. Em giliyê kê m quwetbuna xwe, hindik buna însana hew bi te dîkin. Li hember însana hew bi te dîkin. Ma tê me bi destê kê ve berde? Qey bi destê dujmin ve?

Ya rebbî! Ez giliyê wan xwînê têne rijandin, irzê têne 'edem kirin, hurmetê têne cutin, zarokê yetamî têne namusê payîmal dibe, diyên zarokê xwe winda dîkin, pîrekê jinebî têne hiştin, malê têne xirakirin, mehsulê diçin fesadê, li cem te dîkim. Ez giliyê vana teva li cem te dîkim. Qeweta me bela bu, yekîtiya ji hev qetîyan. Ez kê m me ji hev ket, rê û rêçê me quwetbuna xelqê xwe û 'eczîyeta ummetê li cem te şikayet dîkim.

Wergêr:
M. Mehmed Tîbyatî

Salvegera Qetlî'ama

HELEPÇE

(1988–2010)

Em ummeta Îslamê mezlum û mehrum in, ku di dirêjîya tarîxê de leqayî zulmê bune. Jibil Xweda tu kes û kesekî me tune ye. Ku cesedê me bi hezaran perçe parî bikin jî, em musluman dîsa destê xwe ji mucadela li hember zalima nakişînin... Ne yek, ne deh, ne sed, bi hezaran buyer... Xwîn dirije, can dişewite, çav digrîn, bajarê Îslamê bi serhevde xira dibin, hêjayê me yî qudsî têne cutin... Ku hêstirê diherikin bighêjin hev wê lehî rabe, ku ziman van qetlî'ama bibêjin wê lal bibin, ku pêçî dikaribin binvîsin wê felç bibin... Van êşa... Van elema... Van qetlî'ama... Van rehqelandina... Talan, zindan, qetlî'am, nefî, qeyd û zincîr, bi hezaran şeniqandin... Armanca wan neslê bi Qurânê mezin dibin, mehu bikin, mejîya ji bawerîya tewhîdê bişon, hêjayê Îslamê biqelînin...

Bi dirêjîya tarîxê serok û rêzanê zalim û xwedênenas, qewet û îqtîdara xwe liser xwîn û xebata mezlum û mustez'efa avakirine. Jibona textê xweyî zulmê mihafeze bikin û hebuna xwe bidomînin divê ku her roj qulpikekê bi zincîra zulma xwe ve bizeliqînin. Divê ku tovê fitne û fesadîyê dinava 'alema Îslamê de biçînin. Lewra ew hebuna xwe liser xwîn û xebata mezluma dom di-

kin. Qutê wanî pê dijînin xwîn, zulum, îşxal, û rehqelandine... Weke kena devê xwe dixin xwîna mezluma. Hetanî neba'ecin jê dernaxin. Çunkî ew bi talana bi qetlî'ama, bi îşğala, û bi rehqelandina hebuna xwe dewam dikin...

Qetlî'ama Hîroşîma, Negasakî, Qudus, Sebra-Şatîlla, Deryasîn, Darul beyza, Tîbet, Humus Hema, Duceyd, Bosna, Çezze û Helepçe rûreşîya tarîxêyî vî sedsalê paşî ye. Ev qetlî'amê civakî wehşet û hovîtiya medenyeta wanî bi qirêj û zeng girtî, carekî din li pêş çavê însaniyetê raxistiye. Qetlî'am û rehqelandinê îro têne kirin mel'aneta ehlê Xaça ku salibên zefîtkar careke din di mejîya de bican dike.

Pêla zulma kufre yî ku dunya mehu kiriye; di 16ê Adarê sala 1988de behra însaniyetê carekî di şolî kir. Lewra fer'ê destarê zulmê bajarekî Kurdîstana Iraqê yî bi navê Helepçe, vê carê dinava çerxa xwe de hur dikir. Belê bajarekî Kurdîstana Iraqê yî bi navê Helepçe di 16ê Adarê, sala 1988de bi sîlehê Kîmyasal ji binîde ji dar dihate danîn. Bi navê ruhbera çî hebu ji binîde dihatne qetil kirin. Zarok, pîrek, sebîyê di pêçokê de, îxtîyarê hizhizî, xort, qîz, şervan, heywanê hayim tayim, nebatê erdê, dar û devî; bi kinna yî temamê ruhber û camida ji vê zulmê ji vê qetlî'amê, ji vê wehşetê,

ji vê hovîtiyê, ji vê rehqelandinê, ji vê xwîn xwarîya zalima nesîbê xwe girtibun. Qetlî'ama Helepçe ne tesedufbu. Lewra zalima pir bi zana-bun liser vê qetlî'amê xebitîbun, asasê vê qetlî'amê avêtîbun. Çungî bajarê Helepçe derguşa berxwedana Îslamî bu. Bi êrîşkirina Helepçe ê armancê xwe pêk tanîn. **A pêşî;** zalima teesîra jahra xwe liser xelqekî musluman diceribandin. **A Duduya;** Xelqekî bi Îslamê re pev hatibu kelandin, ji binîde reha wan diqelandin. **A Sisîya;** Bi wesîla vê qetlî'amê çavê tevê Kurda ditirsandin.

Bi rastî qetlî'ama Helepçe wehşeta û hovîtiya 'alema gîrbê û gulamê wan dide pêş çava. Nexasim maska wanî bi qirêj daxistiye durutiya wan li pêş çavê însaniyetê raxistiye.

Li Helepçe nêzî 7000 însanê mehsûm û mezlum bi xwîn xwarî hatîye qetil kirin. Feqet ev qetlî'am dawîya zalima anîye, nexasim neyartîya ehlê kufir û şîrkê hê bêtir bi gelê belengaz daye naskirin. Gelê Kurd bi vê qetlî'amê fêhm kiriye ku jibil Îslamê, jibil hêjayê Îslamê yî qudsî tu çare û dermanê wî tune ye. Û girêdana xweyî bi Îslamê bêtir qewî kiriye.

Di salvegera vê qetlî'amê de, em şehîdên xwe bi rehmet bibîr tînin û hişyariya gelê Kurd ji Rebbê 'alemê dixwazin. Da ku rîya rast nasbike û karibe ji hemu zalima hîsab bipirse...



‘İlmê Tewhîdê û Derketina wê



‘İlmê tewhîdê ev e ku; ji zat û sîfat û e’alê Xweda û ew meselên bi pexembertîyê re ‘eleqedarin, di wezna Îslamê da, bahs dike û dide hînkirin. Yanî bi gotineka kin ku em bêjin, ‘İlmê Tewhîdê; tiştê ku dîne Îslamê tîne holê û tiştê ku însan ji meselê ‘ilmî, fikrî, exlaqî, maddî û ma’newî ‘eleqedar dike, dispêre delîlê neqlî (Quran û sunnet) û delîlê aqlî û vêna bi me dide hînkirin.

Wêxtê ku; muslimanê piştî wefata Resulullah (silavên Xweda lê bin) welatê kafira fetih kirin, çandê kafira jî nas-kirin û di wê dewrê de felsefa Yunan guherandin zimanê ‘Erebî û bi vî şeklî ev felsefe di nav muslimana da belav-bun. Li ber vî halê hana ‘alimê Îslamê jî, ji bo ku ‘eqîda Îslamê jî van çand û ‘eqîdê ziddê Îslamê bê muhâfeze kirin, pir mucadele dan û şugulîn. Hinek ‘alimê Îslamê wextê ku vê tekoşînê dan bizanîn; yan bê zanîn di tesîra van çandê geyrî Îslamî de man. Jiber vê, gelek ‘alimê Îslamê ev ‘ilmê Kelamê ku felsefe û çandê gayrî Îslamî ketîye navê, bi dijarî redkirin. Hineka ji wan jî qebl kirin û rast dîtin.

Îmame Ğezalî (Xweda jê razî be) di kitêba xweyî “İhya” ê de, di heqqê kelamê da wiha dibêje: “İlmê kelamê, ku meriv bi çavgirtî zenn û medh bike ne tişteki baş e. Ev di şibîne wê meselê ku hinek tişt hene zatê wan heram in. Wêka ‘eraq û mirarê heywana. Û hinek tişt jî hene ku jiber tişteki di ve, heram bûne. Weka xwelîyê ku jiber zirarê dide laşê însan xwarina xwelîyê herambûye. Ev qismê diduya jî dibe di qisim:

1- Tiştê ku hindikê wê û zehfê wê jiber ku zirarê dide laşê însan û însan dikuje, heram e. Weka jahrê.

2- Tiştê ku zehfê wê zirar, hindikê wê li feyda însan e. Ev jî xwarina wê mubah e. Weka hungiv. Hindikê hungiv ji însan ra pir feydên wê hene. Lêbêle pir xarina hungiv ji însanê hêrsak ra zirar e.

‘İlmê kelamê jî wiha ye. Tê de hem feyde heye; hem jî zirar heye. Cîyê ku feyda wê heye li gora xwe dibe mubah, mendub hetta dibe wacîb. Lê belê cîyê ku zirarê wê heye yanî bi wê ‘ilmê kelamê ku derheqqê ‘eqîdê de şubhê însan zêde bike, ‘eqîda wî helweşîne hingê dibe heram. Lewra bi vî şeklê ‘ilmê kelamê destê kafira û ehle bîd’at qewî dibe.

Feydê ‘ilmê kelamê jî hene. Divê ê ku bi ‘ilmê kelamê re meşgul dibe weka hekîmekî be. Çawa ku ê hekîm, li gora nexweşê xwe derman û tedawîyê nîşanî wî dide, ‘alimê kelamê jî her meselê li gorî dewr û cîyê wê û li gorî ku hewce pê heye bahs bike.”

Piştî ku me bi kurtayî behsa ‘ilmê tewhîde û ehemmiyeta wê kir însaallah li gorî nesiheta Îmam Ğezalî, ewê bi vî şeklê kurt bê fêmkirin. Armanca me ji bo ku em fikr û bawerîya ku di nav me û gellê me de belavbune û ne li gorî ‘eqîda Îslamî û ehlê sunnetê ne texîne şuna van. Û ji bo ku em dilê xwe ji fikr û bawerîya qelemşe û şolîne pakîj bikin.

Û ji bo ku li hember komela ku li ber emr û nehyê Xweda serî hildane, bune asî û tuğyan kirine em komeleka musulman bînin holê me milê xwe hildaye.

Ê ku di roja me de bi navê azadîya haqqê gelê me derketine û dev ji dîne xwe berdane û bune murted, pêşî dixwazin ku gellê meyî musliman ji ‘eqîde û bawerîya wayî ku Îslamî ne, wan jê dûr bikin û ji bo ku ‘eqîda wan xirabikin dişugîlin. Temamê zaman û geypeta xwe li ser vî avayî serf dikin. Baş dizanin ku, hetta ev gellê meyî musulman ‘eqîda wan rast be û bi dîne Xweda bigrin, nikarin hefsarê wan texîne destê xwe. Ji ber vê pêşîyan di ‘eqîde û bawerîyên ku Îslamî ne, dixine şubhê û bi vî şeklî dixwazin ku wan ji Îslamê dûr bikin. Lewra zanin ku piştî însanekî ji Xweda dûr bikin, bi vî însanî dikarin temamê bawerîya xweyî wek jahrê di nava gellê musulman de belavbikin, wan bixapînin. Wan texîne xizmeta xwe.

Înşallah li gorî ku em dikaribin emê bawerî û ‘eqîda xweyî Îslamî bînin bîra hev û şubhe û bawerîya geyrî Îslamî ku di dilê me da hebin/cî girtibin emê bavêjin ji bo ku em vê meqseda xwe bibine serf. Em alîkariyê ji Xwedayê Te’ala dixwazin. Lewra ê ku meriv digîjîne meqseda meriv, ew bi tenê ye.



Îsmâîlê Yusuîî

Pir dewlet û zalim,
Hem hukumdar û şahân,
Bi ser me da çân
Va çend esr û dewran.
Em talanbûn,
Em koçbûn,
Li her çiyayê Kurdistan...

Xwîna me rêtin,
Em bi hezara kuştin
Em li hev parî kirin.
Ji bo Jiyana xwe,
Ji bo bilindayîya xwe,
Em tim kirin bin palet û solê xwe.

Bi hezar û bi hezar,
Hem milyon û bê jîmar,
Tevî sebî û pîra,
Jin û kala,
Em kuştin bêdeng,
Û kirin bin axê...
Xwîna me bun newal,
Newalên xwînê...

Eva şahide Zilan: 50 hezar,
Eva şahide Dêrsim: 100 hezar,

Şahide Pîran, Amed,
Hênê û Farqîn...
Tevî Batman û Nisêbîn,
Û Çebaxçur û Semdîn,
Bi hezar û bi hezar;
Şehîd û hem fidan...
Ya Rab ji tere sed hewar,
Sed hewar ey Rebbê Qahhar...

Em mezlumin, em yetîmin,
Em mustezef in ya Rehman...
Ev tev ji bo te,
Ev tev ji bo navê te,
Resulê te, Îslama te,
Û Quran a pir bi şanbu,
Ya Rehman.

Ju li gêrîne me werî,
Ju li gêrîne yetîmê me,
Dê û kal û pîrê me werî.
Eva Îsmâîlê me êdî bun Yusuf jî...
Ji tere bubun qurban şixwe...

Lê îro va di birê da,
Di tarîyê da,
Bi masumîyeta xwe,

Bi paqîjîya xwe;
Lê ne berî îftîrayê dunyayî
Û zîndana Yusuîî.
Lê belê, bi tevî wan,
Bi tevî îmtîhan û zorî û çerîbî...

Ya Rab, hewar û sed hewar,
Ju li gêrîne me werî,
Me xelaskî,
Me azadkî,
Bi Îslam û Quran.
Me serfirazkî liber
Jağut û şerwan,
Xwînxwar û Haman.

Em li hevîya te,
Em bi hevîya te,
Li hember dujminê te,
Bi berxwedan, bi izzet,
Û bi serbilindî û cesaret,
Emê li pîyabin her daîm
Bi ebed û bi ebed...

Muhammed
Salim Fidanci

Jiyana Gundayî Berê

Bi navê wî Xwedayê Rehman û Raḥîm... Salat û silav li ser Muḥammed û heval û rêçvanê doza wî be.

Gelî xwendevanê heja! Ku Xweda bê herê emê li gora zanebuna xwe çend şiteğaliya binivîsin ji boy kovara **“Banga Heq ji Kelhaamed”** Em bawerîn ku emê jî kevirekî deynine serhev ji boy xaniyê kovara me, ji boy ku em jî bibne piştekan.

Xwendevanê hêja! Emê hinekî behsa zamanê berê bikin. Ê pêşiyê me; yanî bav û bavpîrê me... Çimkî însanê meyî vêga hema ku dişteğilin dibêjin: **“Dewra berê, soza zilamê berê... Heft xwezîya me bi berê ne bi vêga.”**

Xwendevanê hêja! Kî bixwaze dewra kevin, dewra gunda, jiyana wan, bihar û çilleyê wan, zayîna pez, nalenalê karik û berxika, zîrezîrê çûka, ‘orînê gura, zûrezûrê kuçika, qebqeba kewa, huke huka kevoka, xwendina bilbila, şîke şîkê teyra, reke rekê ‘ewra û biruskvedan, şîpe şîpa baranê...

Kar û barê xwe bikin, destê xwe bidne distê hev. Bi hev re herne wê jiyane... Em herne jiyana gunda... Xaniyê bi kevir, ronahîya çira, fanosa û lempa. Em herne gunda, şikefta, zivînga, keleha. Dewra tinebûnê, kêmbûnê... Nexasim wexta pez ji çolê êvarkî ku dihate axura. Xelk dihate pêşya pezê xwe, wa divegerand. Herkesî heywanê xwe dibire axo di hewandin. Kêfa gunda piştî limêja meğrîbê hê nû destpêdikir. Yanî çûna nav mêşina, bizina, berxika, karika...

Dema wextê dohtina wan ku dihat pîr xweşbu. Dayikê me dirastîne sîtilê xwe û çira xwe jî pêdixistin û dadiketne nav pez, ji bonî dohtinê... Ji duwê çirayê birhê me, ruwê me, bêvilê me tev reş dibun. Çavê me sor dibun. Pêxistina wê gelek zorbu. Lêbelê zehf bi te’mbu. Dipeyre fanos derketin. Ev tişteki gherîbbu, rîhettirbu.

Her tişt wilo ye, pêşî zehmet e peyre rehet dibe. Berê li hindi-


ruwa “lempê sênimro” bun. Peytir da ê “çarnimro” derketin. Her tişt ji piçukayî dest pêdike û bi ber meznayîyê ve, ber firehiyê ve diçe. Ê berya me gelek zehmet û zorî dîtin. Ê vêga ketine xweşiyê. Me zû jibîr kir dewra berê, dewra jiyana bav û bapîrê me. **Dewra ku dayik û xuşkê me dirastîne sîtilên xwe dadiketne nav pez.** Mêşin, bizin û çêlekê xwe didohtin. Piştî dohtinê karik, berxik û golikê xwe diberdane ber diyê wan. Peytir da emê wan û ava wan hazir dikirin. Diberdane delavê wan. Ê kera ne alifbun, cuharbun, didane serê kerê.

Me, alî wan dikir, dirastîte sîtilê wan û em diderketine jorê. Lêbelê carna ta’ba me bi avê de diçû. Carna wexta ku şîr didotin heywanê piyê xwe li sîtilê dixist. Şîr tev didirjand. Belê ku yek tişteki bike û neçe serî birastî gelek nexweş e.

Jiyana gunda û berê çiqazorbu jî birastî gelek xweşbu **wexta ku baran dihat xaniyê bi axê dilop dikirin**, me li hundir û tepsik û senîk didane bin dilopa. Li ser xanî jî gindor dikirin. Derdê xaniyê kerpîça jî nedihate kişandin. Belê gelekî germbun. Lêbelê tûpişk û sirsirkê wan zehf bun. Wexta ku berf dihat, li ser xaniya, malberfkê paqij dikirin. Hingî ta’ma berfedimskê jî nayê jibîrkirin. Erê me behsa xirecir a gunda kir. Ku yek ji derve ve dimeyizêne gund sar xuya dikan. Lêbelê însanê wan gelek germin, merdin ji mehvanê xwe re. Ê ku li wan bikeside wê wana bi çavê serê xwe bibîne. Ev tev, ji edeb û tora Îslamê ne, ku me ji xwe re zemkirine.

Şevgêrkê wan jî gelekî xweşin. Ku tu here nava gund bi mêhvandarî, wê tev werine bal te. Wê kilama ji hev re bibêjin, wê behsa çîrokê Mîrze Miḥemed û ya sê bira ji tere pêşkeş bikin.

Belê, heyata dunyayê wilo ye. Bi temamê zehmetî û te’mxweşiyê xwe li paş dimîne. Me behsa fanosa, lempa, çira û ronahîya wan û zehmet û zorahîya wan kir. Lêbelê behsa ronahîke xweştir, mestir bikim... Ronahîke wiloye ku xera nabe, xelas nabe, natefe, dewra wê



naçe, melul nabe. Ew jî ronahîya Xweda û pêxemberê Wî ye. Çira, lempe, fanos, agir, ceryan liber şewqa wan ne tu tişte. Tiştê ku Xweda çêke ma qey weke ya ‘evda ye? Li tavika Xweda meyzênin, li sitêrkê Wî, şewqa wan ne xera dibin ne ditefin, ne jî dohnê wan

xelas dibe. Me behsa şewqa çira, lempa kir. Lêbelê werin ji were behsa şewq û ronahîya Nebîyê Xweda bikim. Ew şewqa ku xaniya, rîyê însana ronî dike. Xelk pê rîya hîdayetê dibîne. Behsa şewqa Huseyna û Seîda. Erê ‘esil şewq û ronahîya xweş ewin. Şewqa wan, dewsa wan, bihara wan xuya ye...

Belê! Bi carekê re bû bihar û şînayî û kêfxweşî. Xwezîya min ji Xweda ku li ser me daîmî bîharbuna. Bi ziman gotina wê zehf rîhet tê. Çewa ku her sal carekê bihar tê, der û dorê me tev dibine gul û kulîlk û şînayî, xwezîya ku di jiyana me de carekê me bihar bi çavê serê xwe bidîya. Ma di jiyana me de her demê wê çile be. Her demê serma, qeşem, berf û bahoz, xweşî be? Lêbelê em bawerîn ku carekê bi ser me de bihareke din wê were.

Rojhilatî

*Li Rojhilatê ev bê zanîne
Şiyar û zana lê pir hatîne
Dî vê rîyê de xebatkarîne
Bî rastî ew tev Rojhilatîne*

*Bangdarê her dem hewarkarîne
Pawanê doza me-l dirokîne
Peymanekî qenc li her derîne
Dev jê bernadîn Rojhilatîne*

*Ji Misrê derket him hemdemîne
Me seh kir ew dengê Yekîtîne,
Hawar û gazîya vê Ummetîne,
Seyyid û Hesen Rojhilatîne.*

*Îqbal Ebul-A'la ê Mewdudî ne,
Li pêy wan rabun Ebu-n Nedwî ne
Him berxwedan him jî Teygerîne,
Sazkirin Pakistan Rojhilatîne.*

*Li rojava derket Siraceddîn e,
Îzzetbegowîç û hem Carudî ne,
Usifê İslam Ingilîzî ne,
Bê şek vana tev Rojhilatîne.*

Abdulcelîl Dilşad

*Demekî digel Selaheddîn e,
Ronahî dike geh dibirqîne,
Serhilda hemberê van Nesranî ne,
Parêzkerê Qudsê Rojhilatîne.*


*Jirê me pirin bê hejmarî ne,
Ji ber gelê me gelek ketîne,
Şexmus, Şex Seîd ê Amedî ne,
Şiyarê vê dema Rojhilatîne.*

*Kufrê ser me girt ji nezanîne,
Ji ber vê yekê wan bazdanîne,
Hatin û saz kirin yek teygerîne,
Edîban ji bo me, Rojhilatîne.*

*Gulîstan êdî ma bê kes nîne,
Şoreşger rabun bi hezarîne,
Mizgîn, Husêyin ev pêk xistîne,
Evînek honand Rojhilatîne.*

*Dilşahî derket tava evîne,
Doza heq ji mere pir şîrîne,
Kafir û zordest pê qeherîne,
Ew jî dizanin em Rojhilatîne.
Ew bê zanîn ku em Rojhilatîne
07.07.2002*





Bi navê herî Pîroz.

Hemd ji Xwedî kewn û kaînatê re, silav û selat ji herî heskirîyê Wî re.

Dinya gasina (meydana) ceribandina mirova ye. Xweda ê zûlcelâl bi xulq kirin û afirandina însan ew xistîye rêke wilo. **“Min cin û însan çekirye encex ji bo ji min re ‘ubudiyetê bike, ‘ebdîyetê bike”**(Zariyat, 56) Dîsa: **“Çaye û armanca çêbûna tevê mexluqa ‘ebdîtiya Xweda ye.”** (Sâf, 61/1) Bi van ayetên celîl armanca xwe ‘eyan û beyan kirîye, rebb ê ‘âlem a. Jixwe Resul ê Xweda, ronîya çava jî dibê: **“Dinya dehla axretê ye.”** (el-Aclunî, Keşfu’l-hafa, î/412, H. No:1320) Mehbub ê dila rast gotîye.

Madem însan ji bo ‘ebdîtiyê hatîye çekirin û dinya ji gasîna ‘ebdîtiyê yanê dinya dehla axretê ye. Emê jî li dor vê hedîsa pîroz rê û şopekê bi domînin. Hem dinya dehla axretek wiloye ku heyatek, Jiyanek bê dawî ye. Ew çax hewceye ku em li dehla xwe xwedî derên û em lê miqate bin. Lewra em li vê dinya betal û bidawî çî biçênin, ê li Jiyanê bê dawî derê peşîya me. Kesê ku li dehla xwe ne miqate be û wexta hesada bê kar û bê fekî bimîne gazina wî ji kê ye? Em tev zanin mirov ê karkir ê li dehla xwe miqatene, ku dişibandîne gîletî tûnebe, tû dibê qey bexçek ji bexçê bihiştê ye, dehla wî.

Ji alîkê di jî dehla di nav gelê Kurd de, perçek ji Jiyanê aqlebê wan e. Ji wan kesê ne li gûnda dijîyîne jî kesê ne di nav dehla mezin jî dibê, dîsa jî bi hesrat û bêrîkirna jîn û Jiyanê nav dehla dijîye. Jiber wê di ser ê wê da gelê Kurd û pişt ra kesê di dehla de karkirin zanin bê dehla çiqas miqatebun ê û pêwendiyê dixwaze.

Li ser vê mijarê mi ji bapîrê xwe xwest ji min re behsa dehla û xebatê wanî berî nuha bi deh salan bike. Hun jî zanin ku wek her tiştî dehla û xebat û şuglê berî nuha çil sal, pencî sal jî ne wek ê nuhaye.

Bapîrê mi bi axînekî kişandîna ji dil destpêkir: *“Ax ax, ka ew zeman? We ku tû jî zane, em li “Tuxub”ê dijîyan. “Tuxub” gûndek çîyê bu, berê bi bajarê “Mêrdîn” ve girêdayî bu. Belê îro ev çend zemanê, bi navçe (îlçe) a Rişmilê ve girêdane. Jiber ku Tuxub gûndek çîyayî bu, ‘erdê wênî çandinyê û dehla*

Serê Dehlê

wê bi kêmayî bu. Dehlên wê ewqas kêmbu ku maldarî a malbatna bi çend mişarî bu. Jiber ku aborî ya (debar, geçîm) gûnd li ser heywan û dehla bu, Belê qîmeta çend mişar a çend kuleka qen’eta li ser dila bu.

Kurê min te dîsa derdê mi bi birîn kir, birîna mi bixwîn kir. Ku dibe behsa dehla; ser dilê mi digre keder û xem. Hiş ji serê mi diçe ez dibim serxweş û sersem. Nav û dilê min dişewite. Mejyê mi bêqey ji cî dilebite. Erê însan wê zemanê bêtir dixebitî di dehla, sal û zeman diborandin li koçerîyê li çola. Çuna her der ya bi peya bu, ya bi kera bu. Jiber wê li reya bajêr derbas dikirin roj û şev. Xîyar û bacan li bajêr difrotin heb û heb.”

Se’et xweş bavo! Te çiqas xweş bi ziman anî, ev mijar. Belê bavo tû jî zanî Qasidê Xweda (canê me jêr feda) dibê: **“Dinya dehla axretê ye”** Li ser ve tû çî dixwazî ji min re bêjî?

“Erê bexê min! Wexta em dijîyan li nav dehla li gund. Hinek mirov bubune kund, hinek jî bêqey gul û bilbil bun bi sund. Kesê kund bun qîmeta dehla nizanî bun, bê kar û îş bun. Kesê din bi dehla re dinalîn, qasî bilbil bi evîn bun. Hem kesê li dehla û heywanê xwe derdiket xwedî. Dibune mîr û serbilind û sermendî. Kesê nizanî bu qîmeta dehla û welat, Dibu berdoş û serserî û jê dûr nedibun afat.

Piştî dehla dinyê dixwaze evîn û xebat, bo dehla axretê pir bik silav û selat. Di dehla axretê da bexçîwanê mezin Muhammed e, rê û rêzan dide zanî ji ‘alema re rehmet e. Kesê li du Muhammed bijîne vê Jiyanê, îzzet e; kesê ji xetta wî dûr be, dawî jê re delalet e. Lawkê min! Ger tû jî bixwazî vê dinyê bi fêde bike dehla axret; bixwîne, bimeyzêne bê Qasidê Xweda çewa derbas kirye jîn û Jiyan û mûddet. Însan di dehla axretê da ya diçîne xêr, ya jî şer.

Jibîr neke **“Winda nabe ne misqalek, zerrek xêr, ne jî misqalek şer.”** (Zilzâl, 7-8) Kesê kund bun îş û karê wan şer bin, wê di dinya û axretê da rezîl û şerpeze û şermezar bin.

Kesê bulbulê heq bin, îş û karê wan xêr bin, ê di dinya û axretê da mîr û şer bin.

Belê lawo piştî Xweda em çêkirne ji bo ‘ebdîyetê, em çî rebenin ku em jê re nekin îta’etê. Lazim e, em der û dor şîn bikin bi limêj ta’etê. Demsal wê bizîvre em jî ji dehla axretê biçînin xweşî û şahî û se’adetê.”

Xweda ji te razî bavo te ez mest kirim.

“Xweda te jî bibexşîne û te ji qenca binvîse bexê min.”

Gelî xwedevanên hêja, bapîrê min ji min re peyv nehişt. Weka bilbilê ku ‘aşîq û evîndarê gule, bi xwezîya ku em jî ‘aşîq û evîndarê ‘ebdîtiya Xweda û çandinyê dehla axretê bin.

Heta nivîsek meyî din, bimînin di xweşî û şahîyê de.

Bi “Abdulkadir Badîllî” re

Çare û Xelasîya Milletê Kurd...

Bismîhî Subhanehû, Seyda, em dixwazin bi we re li ser reçeta xelasîya Kurmanca hevpeyvînekê çêkin...

Keremkin...

Çima divê em li milletê xwe xwedî derkevin?

Cewaba me ev e; ku însan madem însan e, lazim e ku ebnaê cinsê xwe tefekkür bike, mûlaheze bike. Teraqqî û refaha wan bixwaze. Heger ku vêya nevê, ewîya ne însan e. Însantî ev e; ku tu milletê xwe, eqreba ê xwe, ‘eşîreta xwe nîhayet milletê xwey ku tu di nav de mezin buye, yê ku tu di nav de di’eyîşî (ma’îşet û heyata xwe derbas dike) lazim e ku tu van tefekkür bikî, refaha wan bixwazî.

Hezretî Ustad di “Xutbe a Şamîye” de gotiye ku: “Înel însane medenîyyun bi-t teb’î” yanî Xweda fitraten însan medenî çêkirye. Medenî ew e; ku bes şexsê xwe tenê na, ‘umumê tefekkür bike. Ê ku vêna neke ewya ne însan e.

Madem em di nav vî milletî da mezin bun, Xwedayê Te’ala em di nav vî milletî da çêkirin, ev zimanê meyê Kurmançî bi me da hînkirin; lazim e ku em li van Kurda (tevlî yê ku bi hemû lehçeyan xeber didin) xwedî derkevin, ev li ser me ferz e. Her wekî Ahmedê Xanî; lewra ew hem ‘alim bû, hem welî bu, hem ‘aşîqê resulullah bu, digel vana xelqê xwe tefekkür kir, reçete dan, reçeta xelasîyê nîşan kir.

Bedî’uzzeman jî wisa ye. Di kitêba xweyî bi navê “Munazarat”ê behsa çareyên xelasîyê dike.

Wek xelasîya milletên din, çima xelasîya milletê Kurd jî Îslam e?

Ji wan re jî, xelasî Îslam e, lewra hê ew jî xelas nebûne. Îro kî dikare bêje ku milletê Tirk xelas bûne?


Lazim e ku dewleteke Îslamî çêbibe. Lewra ku dewleteke Îslamî çêbibe hem dîn hem dunya xelas dibe. Wî çagî ewê mecala me hebe ku em bêjin evana xelas bûne. We îlla xelas nebûne.

Milletê Kurd jî divê zanibe ku çara wan Îslam e. Berya her tiştî Îslam e, lewra lazim e ku însaniyeta xwe fêm bikin. Paşî milletê xwe tefekkür bikin. Yanî hem dîn hem dunya. Hem fitreta însan jî vêya dixwaze.

Belê. Em dibînin ku eva bi deh salan, belkî bi sed salan millet li pey felsefe û îdeolojîne geyrî Îslamî çûne, belê bi wan xelasî nedîne. Bi wan felsefa hizura dunyayê nedîtine. Ji ber ku înkara axretê dikin hizura axretê jî nabînin. Jiber vê ye, ku em dibêjin li dunya û axretê hizura milletekî bi Îslamiyetê ye; lewra Îslamiyet tiştê ku Xweda; yanî rebbê hemu milleta dixwaze, ew bixwe ye. Jiber wê em dibêjin Îslamiyet e.

Bedî’uzzeman dibêje “Îslamiyet însaniyet-î Kubra ye.” Yanî însaniyeta herî mezintir e.

**Abdulkadir Badîllî:
“Milletê Kurd jî, divê zanibe ku çara wan Îslam e. Berya her tiştî Îslam e, lewra lazim e ku însaniyeta xwe fêm bikin.”**



Dîsa em dibînin ku milletê Kurd ji demeke dirêj de dibin mezmûnîyeteke wisa de ye ku pirê milletan ne dibin tiştêkî wiha de ne... Divê em çewa li mezmûnîyeta milletê Kurd binêrin?

Bedüzzeman dibêje; Kurd ji dema ku zaruyên Selaheddîn bi hevdu ketin heta niha raketîne. “Ey beşyüz seneden beri yatan...” dibêje Bedüzzeman. Yanî hewaleyî hineke din kirine. Ketine mûlahaza aḥwalên xweyî şexsî. Bi şexsên xwe mûlahaza milletê xwe û refaḥa wî nexwestine. Milletêkî sadiq e. Ku îman û bawerî bi hineka anîn bi temamî jê re dibine sadiq. Mesela ji çar sed salî bêtir bi Osmaniya re ḡayet bi sedaqat man. Tu cara îsyan dernexistin. Heta wexta ku “İttîhad-Teraqqî”yê de’wa qewmîyete kir... Wî çaqî cî bî cî de’wa qewmê Kurdîyete çêbu.

Tarîx jî şahidin ku kêm kêm çar sed salî bi sedaqat gotin ev dewleta İslamê ye, padîşahê me musulman e, îsyan nekirin. Belê Bedüzzeman dibêje divê ne wisa be. Divê meriv hişyar be. Dîsa jî tabî’ê xelîfe bî, îta’etê jê re bikî, wexta mucahede dujminan bû, pê re alîkarî bikî. Evana heq e, belê lazim e ku dîsa di nav xwe da hişyarbana. Bedüzzeman wan na’ecibîne.

Seyda li gor tê behskirin; demekê hinek ji bo de’wa ‘esebîyet û qewmîyete tene ba Ustad. Ustad ji wan re dibê: “Heger ku Kurd bi vê nexweşiya

re dibêje: “Di pêş de ewê Kurd bibine wesila yekîtiya ummeta İslamê.”

Yanî ji van rîwayeta em derdixin ku Xweda wezîfa yekîtiya Musulmana û ummeta İslamê xwest ku li piştta Kurda bike. İcar ê ku vê wezîfe bicîbîne divê ne zulumkar be. Zulum nekirbe. Neyartî nekirbe. Tebî, ev milletên ku bûne dewlet, bi dewletbûna xwe hem zulm hem jî neyartî kirine. Mesela dewleta Surî hem bi Tirka re, hem bi Farisa re hem jî bi Kurdên li wî welatî ne, neyartî û zulm kiriye. Dewleta İranê bixwe bi dewletî dibe ku kiribe. Tirka bixwe bi ‘esebîyeta milletê Tirk zulm û neyartî kiriye.

Bi vî çavî jî em dikarin li mezmûniyeta Kurda binêrin? Yanî Hikmeta İlahî xwest ku Kurd mezmûn û bindest bin da ku nebne zulumkar û bibne wesila yekîtiya ummeta İslamê.

Ev teşxîsa te xweş e. Xweda wisa teqdîr kir, dewleteke ‘umumî çênebû. Elbet ê ku dewlet û îdarê bi dest xwe xe, mutleqa ê hinek zulm jê çêbibin. Ne dewletên mezin tenê, carna hinek aḡayên ‘eşîra jî di îdara ‘eşîreta xwe de zulmê dikin.

Ev teşxîsa te teşxîseke xweş e. Feqet Hezretî Bedüzzeman ji min re gotibu. Ziyareta minî duduya bû. Ez çûbume “Barla”yê, şevêkê li wir bûme mewanê Ustad Bedüzzeman. Ji min re lihefa xwe û hinek xwarina xwe şand. Wê êvarê pir ‘esebî bu. Ji tiştêkî ḡeyidîbû. Heta “Zubeyr ağabey” go: “Heger Ustadê me hişk-sert xeber bide mehẓûn nebe.” Feqet di sibê da bi temamî ‘eksê wê êvarê bû. Ewqas kêfxweşbû; ku me temama dersa “Rîsale ê Nûr” xwend, dema dor-sira hate min go: “Zimanê vî weke ê min e...” Paşê go: “Di milletê Kurd de du secîye henin. Yek cesaret e, yek fedakarî. Heger evana bi îmanê-Rîsaleyên Nûr hişyar bibin, inşaallah tu millet nikare li ber wan bisekine. Heta ê Rus jî fetih bikin.” Ji min re jî go: “Telebeyên minî berê, nezî pênc-şes hezar hebûn, hema temamê wan şehîdbu. Bi îşareteke min tenê, rihe xwe feda dikirin. Feqet îro telebên min (ne go Tirk) heyata xwe weqf dikin. Evana meqbûliyeta van hê zedetir e.” Şixwe di mektubeke xwe de jî dibê: “Temamê wîlayatê şerqê telebeyên Nûrê ne.” Yanî xwenda, ne xwenda; heta yên ku ziddê wê bin jî temam “Nûr telebesî” ne.

Ê hinek sebeb hebûn. Mesela di zemanê Osmaniya

‘esebîyete nexweş nekevin, jiber ku hem di nava ‘Ereba, Farisa û Tirkan de belav bûne, inşaallah berê çewa bûne wesila ittîhad û yekîtiya musulmana.” We jî behsa rîwayeta Muhsîn Alev ağabey kiribu. Behskirye ku demekê hinek tene ba Ustad û dixwazin pê re bi Kurmancî xeber bidin. Ustad li ser Tirkî israr dike û dibê: “Evanê ba min hemû Tirk in. Divê em li bal wan bi Tirki xeber bidin.” Di axir de jî, ji boy îltifatê, ji wî şexsî

Îro em dibînin ku di nav milletê Kurd de, felsefe û dozên mixalîfe İslamê pir bi pêş ve çûne? Sebebê vê îlhade çîye?

Ê hinek sebeb hebûn. Mesela di zemanê Osmaniya



da daîma **“Kürdistan Eyaletî”** “Eyaleta Kurdistanê” digotin. Wî çağî ‘Urfa daxilê “Erebîstan Eyaletî” bû. Yanî tu mehzur nedidîtin. Serbest û aşikare digotin “Kürdistan” paşê ev cumhuriyet ku çêbu; weke ku ev millet tune, çênebûye, gotin “Herkes Türktür.” Ji bo vena bicî bibe gelek zulm kirin. Mesela ‘îsyaneke biçuk, em Dêrsimê bibêjin, Ustad jî di mektubê xwe de dibêje, bi navê “Kutuderesi” gundê çiyayên “Kutuderesi” hebu. Ji ber ku werğî nedabûn, emir ji Enqerê tê dibê “Temamê wan bikujin.” Heta Yuzbaşîyekî Kurd ji Meletya şevêkê behşkir. Go hevaleyê minî yuzbaşî bi çavê xwe dîtiye. Xelqê beydayê di nav surekî-xaniyekî de kom dikin. Pîrek, zar û zêç û extîyar teva kom dikin. Gazyağî li dorê kirin û agir berdanê. Heta go pîrekekê zarokê di himbêza xwe de ji bo ku neşewite avête derve. Yuzbaşî ji destê neferekî tufenk girt û sunguyê tê çikand û avête nav agir. Yanî ev tiştên wanê gelek bûne.

Mesela li dora Sason, Bidlîs û Wardo de ‘îsyaneke biçuk çêdibe. Bi navê “Tepeleme harekati” hatine bi hezaran însan kuştine.

Mesela di **“Geliyê Zila”** da du cenderme ji ber ku namusî kirine, ji bo namusê hatine kuştin. Emir hatîye “Temamê wan bikujin.” Pênc-şes hezar însan kuştine. Dibêjin heta mehekê di çem de xwîn herikî ye.

Ev hadîseyên wiha tev kombûn, kombûn, kombûn... Ewanê ku ‘îsyan kirine di destê wan da ev çêbûne. Feqet evanê ku evan zulma kirine ne heqîqî Turk in. Ustad wisa dibêje. Heta Ustad dibê “Min gelek zêde û kur tefekkur kir, ê ku ez êşandim, ê ku eza û cefa dane min qet ji wan yekî Turk tunebu.” Ma’lesef evanê ku îdara hukumatê xistine dest xwe gelekê wan ne Turk bû.

Sed hezar însanê Kurmanca di van ‘îsyanê biçuk da hatîye kuştin. Îşte evana di dest vanê ku aniha “aşîrî” hareket dikin de kombûn. Lakîn em dibêjin ev xeta û zulma mezin ne ji Turka ye. Turkê musulmanin, em ji wan re hurmet dikin. Em wana qebl dikin, ewana jî me qebl dikin. Turk ê heqîqî, bîlxasse ê ku Rîsale-î Nûr xwendibin, ema ê ku rast xwendibin, xweş xwendibin.

Belê, weke ku Tirk jî dibêjin: “Yê ku dikeve behrê xwe tavêje mar” Milletê Kurd jî kete nav behra zulmê û mezlumîyetê, xwe avête Qominizmê û felsefên din yê geyr-î Îslamî.

Ewê xelas bibin însaallah. Lewra di tîyeta wan de, di fitreta wan de Îslam heye. Ji geynî Îslamê tu tiştek tune.

Ji boy hişyarkirina milletê Kurd, xelasîya wanî ji zulmê û naskirina rîyên rast û yên çep, çi wezîfe bi ser me dikevin?

Berya her tiştî lazim e ku îmana bi Xwedê, îmana bi

axretê, îmana bi Quranê... Yanî şes erkanê îmanê eqlî û mentiqî were qebulkirin. Heger evêna bi suretekî heqîqî kete qelbê wan êdî nikarin te’essuba cahilî bikin. Berî her tiştî Rîsale-î Nûr lazim e ez dibêjim. Xwendina wêya, neşra wêya. Her wekî ku hun di kovara xwe de maqalên Ustad Bediuzzaman didin. Lazim e ku zirara te’essuba cahilî bê fêmkirin.



Abdulkadir Badilli

Min bixwe **“Asar-i Bedî’iyye”** ciyên ku derheqê Kurmanca de ye bi qelesa sor nîşan kirin û da başbeqan. Wî jî teşekkur kir.

Hun jî dizanin ku di zimanê Kurmancî de Televizyon, radyo, qezete, kovar û weşanên din bi pêşve diçin. Di vê sazîkirin û pêşveçûnê de bingeh û hessasiyeten me divê çibin?

Xettê hareketê me, li gorî mulahazayên min, ewwel divê derheqê îmanê, rîsaleta pêxember

û îmana bi axretê hebe. Di pişt wan da divê tiştên exlaqî hebe. Weke derheqê milliyetê de. Çewa ewê milliyet çêbibê. A bi zirar û bê zirar çewa ye? Divê evana em bi tertîb bînine ziman. Însaallah ev wezîfe wê di zemanekî şunda gelek tesîr û fêde çêbibin.

Di nav Kurdan de jî, ji boy belavkirina elfaba latînî xebat tene kirin. Di muhafezekirina elfabê de mesuliyeten me çi ne?

Însaallah li ciyên wek Kurdistanî Iraqê elfabe ji xetê ‘Erebî naguhere latînî. Belê li Tirkî xetê resmî Latînî ye. Ji-ber vê em mecburin bi herfê latînî binvîsîn. Belê îlla li gor îmla a berê. Gelek kitêbên bi Kurdî hatine nivîsandin.

Îro divê meriv pêşîya ya **“Uyduruk”** yanî a sunî bigire. Di elfabê de, di îmla ê da. Di van dergîyan de divê ku meriv elfaba ji teref Xelîl Xeyalî ve hatîye berhevkerin, bi pêşve bide. Yên ku îro çêdikin li gor serê xwe çêdikin.

Em dizanin ku we “Küçük Sözler” a Seydayê Bedi’uzzaman, bi navê “Peyvên Biçuk” ve gerandîye Kurdî. Armanca we di vê wergerê de çibu?

Ji ber ku hinek evanê ehlê medresa dibêjin “Ev bi Tirkî ye, ne tiştek e, divê bi ‘Erebî be” min jî bi xetê ‘Erebî çêkir, min go belkî bi zimanê xweyî Kurmancî bixweynin. Rîsale-î Nûr bixweynin.

Elhemdulillah îro ciwanên Kurdistanê dixweynin. Ustad gotîye heger ku Rîsale-î nûr di nav Kurdan de înkîşaf bibe ewê pir tiştekî mezin bibe. Çaya me xwendina Rîsale-î Nûr e.

Axir, tewsiyên we li me çine?

Ez we tebrîk dikim. Bişuglîn. Ji bo Xwedê... Miwafiqiyet bibe yan nebe, tê bişuglî. Li gor niyeta meyî xalis Xwedê te’ala ewê tesîr nesîb bike. Îro çênebe wê sibe çêbibe. Ez we tebrîk dikim, pîroz dikim.



Dê û bavê me:

Hz. Adem û Hewwa

Jiyan
Abdulcelîl Dilşad

Hz. Hewwa û Adem (Selamên Xweda li wan be)... Dê û bavê însaniyetê... Di cennetê de dest bi heyata xwe kirin... Belê piştî demekê, Xweda ew şandine dinyayê...

Dunya... Ciyê kul û derda... Ciyê toba dê û bavê me... Ciyê girî û 'îbadetên wan... De ka em serîkî li heyata dê û bavê xwe xin:

Xwedayê te'ala pêxember Adem (s.x.l.) û jina wî Hewa jiber ku ji meraq û endîşenakî li dijraberê fermana Rebbê xwe tevgiryan, ji cennetê avêt der û şiyand serê erdê. Ewan li serê vî erdê bûn cotkar û jiyana wan êdî wisa berdewam kir. Ji piştî dûrmayîna cennetê vir da, ewan tu car bi tevayî dilşad nebûn. Pirr caran xwarina wan tune bû, ji ber ku herêma ew tê da dijyan, pirr ne berdar bû; ax û erdên wê herême ku bêne ajotinê ne berdar bu û karê wan jî pirr çetîn û bi zor û zehmet bu. Jîyîna wan gellekî dijwar bû. Pêwîst bu ku wan axa zevîyên xwe, bi xwe cot bikirana, zad, genim û h.w.d bajotana û biçînîyana. Ne tevî ne jî hewcarê wan hebû. Gerek wan hacetên xwe yê girîng bi xwe çêbikirana. Yanê heyata wan êdî bi vî awayî pêk dihat.

Wî demê ser dinê pirr darê mezin, çiyayên bilind û zinar û kaşên xeter hebûn. Deşt û çîya, newal û gelîya tev bê kes bu. Yanê heçî ku mirov be, bê Hz. Adem (s.x.l.) û jina wî ya Hewa kesek nînbu. Dîsa em karin bibêjin kesê ku m'ena bide vê dinyayê û biçerixîne û wê dinyayê veguherîne nînbu. Mirov li her der û

cîh û alîyê dinyayê de dengê heywanên wehşî û hov ku li daristanan dijyan rastê ve dihat. Hz. Adem (s.x.l.) û Hewa hundirê şikeftê da li ser çiyayekî bilind rûdiniştin. Lêbelê wana şikeftê da jî mîna li Cenneta Xwedê bawerdêrî, emîntî û dilşahîti nedîtin. Ji bo parîkî nan bi sa'etan kar dikirin û zor-zehmet didîtin. Pirr caran dema cennetê dihat bîra wan û ewna jî pê re gellek xemgîn dibûn û yek caran jî li ser sedema ji cennetê der avêtina xwe difikirîyan û raman dibun. Paşê jî **"Êdî poşmanî feydê nade. Em veqerine Rebbê xwe û dinyaya xwe. Dem dema veqerîna Rebbê xwe ye"** gotin. Pê re veqerîyan berê xwe dan heyat û Jiyan li ser dinyayê. Ji lew ku Rebbê 'aleman jî gotibu: **"Tu û Hewwa demekî li ruyê dinê bimeynin."**

Bi vê rewşê pir sal hatin û çûn. Wana tim û tim Xwedê ra dû'a dikirin ku bila Ew gunehê wan biborîne, 'efû bike û jîyîna malbata wan hinekê hêsan bike. Xwedê jî ser vî gaziya wana tesellî û şênahî û dilşadiyê da wan. Bi vê rewşê roj bi roj derbas dibu û dibihurîya. Rojekî Xwedayê te'ala nesib kir, lawikek ji Hewa yê ra bû û navê wî jî **"Qabil"** danîn. Adem (s.x.l.) û Hewa her roj sibê hettanî êvarê ji bona xwe û zarokê xwe xwarinê digerîyan.

Salekî dû re Hewa lawikekê din anî dinê û navê wî jî **"Habil"** lê kirin. Belê Hz. Adem (s.x.l.) û Hewa bi herdû zarokên xwe pirr kêfxweş bûn û destengîyên xwe ji bîra xwe kirin. Jiyan wan êdî gellekî hatîbû guhartinê. Wana her weki viya êdî bi dil û can û bi hêz kar dikirin. Herdû law mezin bûn û bûn du xortên jêhatî...

Endîşenakî: Meraklîlîkla
Dijraberê: Aykırı
H.w.d(Her wekî din) :
Ve sair

Biçerixîne: Evirip çevirme
Bawerdêrî: Güvenlik
Destengî: Sıkıntı

Îmamê Însaniyetê Hz. Îbrahîm ('Eleyhîsselam)



Ji însanê ewil û Pêxemberê ewil, ji Adem ('eleyhîsselam) heta Pêxemberê dawî Muḥammed (s.x.l), Rebbê 'alemê ji her milletîre Pêxember şandîye. Ev mijar di Quran a Kerîm da wiha derbas dibe: **“Bi tehqîq, me ji temamê milletare Pêxemberne ku digotin ‘evdîtiya Xweda bikin û xwe ji hebandina şeytan bi hefdînin- me şand.”** (Nahl, 36)

Ev Pêxember çiqas wezîfa wan di belavkirina da'wa Îslamê da wekhevî bun jî, lêbelê li cem xweda qedrê wan cihê cihê ye. Qedrê wan liser hev in. Hinek ji wan xwedî suḥufin, weke Şît ('eleyhîsselam) hinek ji wan xwedî kîtabin; wekî Îsa ('eleyhîsselam) hinek ji wan ne xwedî suḥuf û ne xwedî kîtabin wekî Zekerîya ('eleyhîsselam) Hinek ji van Pêxembera jî ulu-l 'ezm in. Ev Pêxember: Nuḥ ('eleyhîsselam), Îbrahîm ('eleyhîsselam), Musa ('eleyhîsselam), Îsa ('eleyhîsselam) û Muḥammed ('eleyhîsselat û wesselam) in.

Lêbelê Pêxemberek heye ku, qedrê wî û cîyê wî li cem Xweda cihê ye. Rebbê 'alemê bi wesfne wiha wî dipesinîne ku ti Pêxember bivî rengî ne hatine pesinandin. Meqamekî wiha daye vî Pêxemberî ku ev meqam ne daye ti Pêxemberî. Rast e! Heyat û Jiyana temamê Pêxembera ji mere nimune û mîsal e, bes rebbê 'alemê di Quran a pîroz de bitenê jibo vî Pêxemberî gotiye; ey Muḥammed çewa ku heyat u Jiyana vî Pêxemberî ji ummeta tere nimune û mîsal e, ji tere jî nimune û mîsale. Bala xwe bidnê, Pêxemberê axir zeman en Pêxemberê mezin, rebbê 'alemê dibêje; ey Muḥammed jibo te û ummeta te di Îbrahîm de mîsal heye. **“Di Îbrahîm û di ê pêra**

de ji were mîsalne xweşik hene” (Mumteḥîne, 4)

Dîsa Rebbê 'alemê bitenê ji vî Pêxemberîra gotiye ezê te bikme îmamê însaniyetê. Ne îmamê însanê zemanê wî bitenê, îmamê însaniyetê. **“Çi zemanê rebbê te Îbrahîm bi hinek kelîma îmtîḥan kir. Ewî jî (tiştê jê hatibune xwestin) bê kêmanî anî cî. (wê demê xweda ji Îbrahîm re) go: bê guman ezê te ji însana re bikme îmam.”** (Beqere, 124) Rebbê 'alemê bi tenê ji wî re gotiye tu dostê minî. Îbrahîm Xelîlullah. Xelîl bi ma'na dost e. Bê guman îmamî ya wî heta roja me hatiye. Îro 'îbadeta hecê bi tevahî sunneta Îbrahîm Pêxember e.

Meznantîya Îbrahîm Pêxember, bi meznantîya îman, 'ezm, îrade, sebr, cesaret û fedekarîya wî ve girêdaye. Qeḥremanîya wî, serhildan û berxwedana wî ya ku li hemberê Nemrud nîşan da, di tarîxê de ji temamê da'wetvanê Îslamêre nimune û mestere ye. Û heta roja qiyametê jî ewê wiha be. Ewî digel razîbuna şewitandina nava agir bixwe jî, razî ne bu bisertewandina li hemberî kafîra. Li hember zalimê Nemrud bi en dengê xweyî bilind bang dikir dîgo **“Laîlaheîllallah.”** Ji qewmê xwere, ku dinava wan de bavê wî jî hebu, jiber ku bêbawerbun neyartîya xwe î'lan dikir. **“Ewana ji qewmê xwere digotin: em ji we û wanê ku hun ji geynî xweda, dihebînîn dûr in. Em we nasakin. Heta hun baweriyê bi wî xwedayê ku tenê ye, neyin, dinavbera me û we de seraqet neyartî û nefret heye.”**

Lêbelê en wesfê wîyê mezin ku ew jî bixwere mezkirîye eve ku, ewî jibo pêk anîna emrê rebbê xwe, ji serjêkirina kurê xwe paşve negerîya. Dûrketina ji Yusuf, digel ku Pêxemberbu jî Yaqub Pêxember korkiribu. Hun ḥîsab bikin, emrê serjêkirina kurê Îbrahîm, Îsma'îl, çiqas zor e. Jixwe her wekî di ayeta Quranê da jî hatiye daxuyanîkirin; Îbrahîm ('eleyhîsselam) nîkarîbu liser piştê dirêjke. Wî liser devê wî dirêjdike. Jibo xatrê li çavê wî ne meyzêne. Da ku lê newe rehmê. **“Herdû jî teslîm bun, û dema wî liser enya wî dirêjkir.”** (Saffat, 103) Heçku jibo hatina Îsma'îl nêzî sed salî sekinîbu. Lêbelê ew jî nebu manî'ê pêkanîna emrê rebbê wî.

Mezinantîya Îbrahîm Pêxember, bêguman ne bi van tenê ye. Hê belkî bi seda ewsafê wî yê ku wî mezin dîkin hene. Ziman ewê bi betile ji anîna ji jimarandina wan. Lêbelê ew dîsa xelasnabin. Meriv wê demê çêtir fêmdike ku, çima xweda wî kirîye îmamê însaniyetê...

*Rehber û pêxemberê heq ta ebed Mûhemmed e
Xatema pêxemberaye ya Mûhemmed Mûstafa*

*Her ew e mizgîna Mûsa Dawûd û 'Îsa ê Mesîh
Her ew e Dû'a Xelîlî ya Mûhemmed Mûstafa*

*Dînê Îslam dînê cîhan dînê her pêxemberan
Xaliqê heq pê tamam kir jê re ew kir qasid e*

*Mû'cizê wî bê jimar in, hin ji wan jî sermed in
Vaye Quran her dem û an mîslê rojê şahid e*

*Ê ji dil pê bûne bawer bûne dilşad serfiraz
Hem li dunya hem li ûxra pê gihaştin meqsed e*

*Çareya azadiya me jar û mezlûmê dunyayê
Şer' û te'lîmê Mûhemmed em bikin rê-w mesned e*


*Şîreta Mizgîn ev e ji bo xelqê mezlûmên cîhan
Tev Mûhemmed bikin Rehber wî bikin ser murşid e*

*Wek pelên dar û kulilkan û tamamê zerreyan
Sallî Ya Rebbî we Sellîm ser Nebiyê sermed e*

*Hemd û Şukr û meth û pesn û hem sena ên 'alemê
Tev bî carek ê Xweda ne ew îlahê Ewhed e*

Seydayê Mela Mizgîn

Rehber û Pêxemberê Heq



خَاصَّةً مِنَ السَّلَامِيَّةِ

Xwedayê min

Ey dilovantirê ji dilovana!

Dilê xwe tenê ji Te re vedikim. Huzn û kederê xwe tenê ji Te re dibejim bidilovanî.

Xwedayê min!

Ti zanî ku ji Te pêve kesî min tine. Heger Tu bibe kesê min, kesî dinê naxwazim. Lewra Tu ji dê û bavê me bi-rahmtir e ji me re.

Ya Zulcelal!

Xweşikî... Hakîmî... Tav ji ber eşqa Te dikizirê û agir dibarîne. Hîv ji ber cemala Te nûr diberiqîne. Çem tim û daîm li Te digerin. Taht ji xesÿeta Te diqelişin û digindirin ji zinara. Zerrat û seyyarat ji ber eşqa Te perwaz dibin wek Mewlewîya. Yek lem'akî rehma Te ye ku Te daye dayik u makeya. Ji ber wê rehma Te xwe li ser çêlik û ferxikê xwe feda dikin. Ti derîyê rehma xwe venekî ka kîjan derî heye ku em herin?

Îlahî! Ku gunehê min têne bîra min, çokê min dişkên.

Ey Xwedayê minî Rahîm! Tu bidî xatirê van sitêrkê çavê min... Tu bidî xatirê hiskirina xwe... Tu bidî xatirê "ismî E'zem" a xwe û Quran a Hakîmî... Tu bidî xatirê ronîya çava sallallahu 'aleyhî wesellem... Ez bi qurbana Te bim. Min 'efuke... Teqwa û ma'rîfeta xwe û muhâbbeta xwe ji dilê min dernexe.

Xwedayê minî Rahîm û Hakîm!

Gunehên min gelek û gelek. Habîbê Te gotîye "Kî gunehê xwe bijmêre û li xwe mikur were (tobe bike) Xwedayê Te'ala wê wî 'efuke." **Îlahî!** Gunehên min nayên hedd û hisabê. Ka ezê kîjanê bêjim? Hingî min toba xwe xirakirîyê êdî ruyem nemaye. Nikarim bijmêrim. 'Emelê minî salîh û bi îxlas jî nizamim ku wê van guneha binuximîne yan na... 'Emelê ku bi îxlas jî min kirîye paşî bi xwodfuruşî îxlasa wî mi jêbirîye û min 'emelê xwe hedimandîye. **Îlahî!** Her çiças 'emelê minî ku ez peşkeşî Te bikim tunebêjî, Tu bidî xatirê ku min azadîya xwe li ser Te kirîye... Mi zarok û mal û malbat li ser Te kirîye... E zanim... Ku Te carekî hez ji yekî bikî hew jê digeyidî. Lewra Tu xwedîyê wefayêyî. Dîsa e zanim ku gunehê însanekî weke erd û asîmana mezinbin jî ku carekî tenê jiber tîrsa Te yek peşkekî sitêrkê çava rijandibe Tu cahnimê ebedîyen ji wî re heram dikî.

Medet îlahî! Medet ey ê ku her halê meyî veşartî û eşkere zane! Divê heyama ku ez ji Te dîr ketime kes bi hewara min de nehat ji Te pêve. Derîyê rehm û ihsana Te ji timamê 'evdê Te re vekirîye. Lutf û kerema Te li ser min weke baranê, dibare û dibare. Bê jimar Te min hifizkirîye ji gunehê çepel û derbê neyara.

Ey Rebbê minî 'Ezîz û Celîl! Ê bê xeta û qîsur tuyî. Ê ku zilmî li nefsa xwe kirîye ez im... Ê ku ji emrê te derketîye ez... Ey rebbê meyî ku ti wextî terka me nekirîye! Sebr û sebatê bide me û me ji van kûll u derda ji şerrê kafîr û mu-nafîqa û şerrê hesuda xilaske.

Xwedayê min! Ez baş zanim ku gunehên min bi qasî tamamê behra biherimîne zêdetir e... Cî girtî û qewîn in. Nexweşîyê dilê min ji êşa webayê û ji êşa zirav tahluketir e. **Ya Rebbî!** Tu tenê 'ebdê xweyî salîh û welî 'efubikî, ka ê weka min, herine kîjan derîyê? Ma qey ji derîyê Te pêve derî hene? **Îlahî!** 'Evdê teyî salîh ku 'emelê xweyî bi îxlas bînin ziman destê xwe ji Te re vekin... Ê bi naz bêjin... Tu her armanca wan pêk tînî. Lewra 'evdê teyî bi teqwa çi çaxî destê xwe ji Te re vekirine Te vala nevegerandîye. Weke Bedûzzeman gotîye: "**H**eqê min ne naz e, nîyaz e." Lewra ê ku naz û sîtema ji Te re bikin encex welîyê Te ne. 'Emekî minî bi îxlasî ez nizamim ku pêşkeşî Te bikim... Ji bo rîza û hizkirina Te hunda nekim... Ê ti ji min negeyidî. Tenê dikarim hizjêkirina Hebîbê Te sallallahu 'aleyhî wesellem pêşkeşî Te bikim. Qelbê min Tu ji min çêtir nasdikî û hizkirin û dostanîya hizba Te di roja teng de... Hîcreta hizba te bi zarukî... Dîyarîya mal û can ji bo dîne Te. Hiskirina dostê Te û neyartîya dijminê Te...

Xwedayê minî delal! Te van girtîgahê tarî, cemidî û zingargirtî çewa ji min re ronî kirîye... Bi xelweta xwe û ta'et û îbadeta xwe bi min şêrîn kirîye... Şêrîntirê ji qesr û qonağa... Hetta şehadetê Tu ji dilê min vê helawêta ma'rîfeta xwe û muhâbbeta xwe dernexî!

Van çavê ku ji siterika tije buye û ruyê bi hecalet binêre yek carekî! Destê min bernede Îlahî! Ê tevî îman û şehadetê min bibe huzura xwe. Amîn.

Xefkê Li ber Xort û Keçên Kurda (4)

Dûrkirina Ji ‘Emelê Salih

Ferzê Îslamê tev ‘emelê salih in. Îslamê çî ferz kiribe, pêk anîna hemîya dibe ‘emelê salih. Wek: limêj, rojî, zikat û hecc...

‘Emelê salih him bedena meriva him jî ruhê meriva xweyî dike. Bê çawa xwarin bedenê xweyî dike û dibe sedema hêz û qewetê, her wiha ‘emelê salih jî ji beden û me’newiyata însan re dibe sedema hêz û qewetê.

Belkî em ne diferqiyê de bin; lêbelê em vêya baş bizanibin ku ‘emelê salih maddîyyat û me’newiyata me xweyî dikê û ji nebaşî û xerabîya diparêze.


Xweda tiştê ku fêdê bide meriva, ferz kirîye. Bêguman Xweda ne hewceyî zikr û ‘îbadetê me ye. Jixwe ê ku jê re zikr û ‘îbadet dikin hene. Melaîket ti carî ji ‘îbadetkirina Xweda ‘uf nabin. Ji ber vê ‘îbadetê ku li ser însan hatine ferz kirin ji bo xêra însan in. Fêdê wan, însan dibîn in.

Dûrketina ji heram, nebaşî û neqencîya jî dikeve çerçova ‘emelê salih de. Du tiştê dijê hev nayne cîyekî. Cîyê ku ‘emelê salih têkevîyê xerabî û heramî di wir da nasekin e. Sekna wan ne mimkin e. ‘Emelê salih heramî û nebaşîyê tehammul nake. Ji ber vê ‘emelê salih Jiyanê pak û paqij dike. Ji qirrêj û gemarê dûr dike, tiştê ku Jiyanê xera dikin ji holê radike. Wek; dizî, zina, qetl. bêedebî, bêexlaqî û zilm û zorê... ‘Emelê salih dihinek merivan de bi carekê de; di hinek merivan de jî hêdî hêdî dibe astengeke qewî û dikeve hember heramî û nebaşîya... Xwedîyê xwe wek ava heyatê pak û paqij dike. Dema Jiyan ji heramî û nebaşîya paqij dibe, kêf û xweşî şîn tê, û bextewarî ava dibe. Xweda ‘ezze we celê di Quran a pîroz de wiha ferman dike:

“Hemî însan dixisarê da ne, lêbelê ew kesê ku îmanê tînin û ‘emele salih dikin, heqqî û sebrê tawsîyeyî hev dikin ne dixisarê da ne.” (Suretê ‘Esr)

Xweda ‘emelê salih piştî îmanê zikir kirye. Ji vê tê xwiya ku piştî îmanê a muhîm, ‘emelê salih e. ‘Emelê salih sedema xelasîyê ye. Ev xelasî ne bitenê li axretê ye. Belê him li axretê him jî li dinyê ye. Pêşî dinya xilas dibe pişt re jî axret. Kesê ji ‘emelê salih dûrin; yanî ew kesê ku ferzê Îslamê pêk naynin, pêşî dinya xwe, pişt re jî axreta xwe xira dikin. Jiyanê wan bi heram û nebaşîya tije dibe. Wek wî kesê di nav çirav û pîsîyê de hey ji xwe nîne ye. Kesê ku ji ‘emelê salih dure, buye leystika şeytan û hevalê wî. Çawa dixwazin bi wî alî ve diçe.

Şeytan û hevalê wî, tim û daîm xefka li ber misilma-



na divedin, yek ji van xefkan jî dûrkirina wanî ji ‘emelê salih e. Bi gelek şiklê xapa tên. Mesela ji hinka ra dibên: *“Dilê te paqij e. Ma tê çî ji limêj û rojîyê bike. Deka hê ti ciwanî, ‘emrê te çîye, hinekî kêfa Jiyanê derxe di pişt ra tê limêj bikê û rojî bigrê a niha hê zuye.”*

Dîsa dibên: *“Heta em bîndest bin limêj û rojî li ser me neferz in...”* Bi gelek şiklê cê êrîşê didin ku misilmanna ji ‘emelê salih dûr bikin. Êrîşê mezin didine keç û xorta. Keçkanî û xortanîyê bikartînin û bi vî awayî dixwazin wan bixapînin.

Gelî keç û xorta! Guhdarê me bin. Em qencîya we dixwazin. Ti cari xerabîya we naxwazin. Xilasîya dinyê û axretê bi îman û ‘emelê salih e. ‘Emelê salih wek rohnayî û germayîya rojê ye. Him xwe rohnî û germ dike him jî der û dora xwe... Jiyanê biedeb û exlaqê xweşik, bi hêya û terbiyeka bedew û bihuzur û bextewariyê dixemlîn e. ‘Emelê salih dibe tava û heyva tarîtiya kufr û zilmê. Dûrketina ji ‘emelê salih tehluqa ketna nav tarîtiya kufr û zilmê tîne. Xweda hafiz, ketna nav kifr û zilmê jî mal xerabûna dinyê û axretê ye. Mirin wê kengî werê ne bellu ye. Li xortanî û pîrbûnê nameyzêne. Ji ber vê hey ji xefkê dijmina hebin û xwe bi ‘emelê salih bixemlînin.



Gur, Li Dora Me ne

Heta kerî hebe ew ê gur jî hebin. Jiyana û çêre ne tişteki hêsan e. Digel xweşî û başiyan, xerabî û taluke jî hene. Jiber vê yeke, divê şivan jî cîyê xwe zanibe, kerî jî cîyê xwe... Da ku Jiyana xwe dinav rehetî û şahiyê de bidomînin.

Neyarê şivan û pez, di serî de gur in. Jiber vê, lazim e liber vî neyarî gëflet çênebe, tedbîr bêne danîn. Lewra domandina Jiyane, çêre, şîr, goşt, mû û dewlemendî ne erzan e. Şixwe, gur, ê wezîfa xwe bike û dike jî... Lê em?

Şivanê şivana Hezretî Muhammed, salât û selamên xweda lê bin, di gotineke xwe de ummeta xwe, yanî kerîyê xwe li hember vî dijminî haydar kirîye. Digel haydarkirina miqatebuna dijmin, çara xelasiyê jî nîşan daye.

Naxwe, de ka em guh bidne şivanê 'alemê: **“Şeytan gurê însan e. Çewa mîya ji kerîyê xwe dur bikeve, gur wê dixwe, şeytan jî, yê ji cema'et û komela İslamê dûr bikeve dixwe. Nebe! Nebe! Ji cema'etê veneqetin. Bi mizgeft û cema'etêre bin.”** (Ahmed, Taberanî, Tirmîzî)

Dîsa kerem kirîye: **“Lazim e hun cema'et bin. Ji weqetandin û tenêbunê hifza xwe bikin. Bêgoman,**

kî bitenê be şeytan pêre ye. Ji duduyê ku, jiboy xweda hatine bal hev, dūr e.” (Tirmîzî, Ahmed, Hakîm)

Gelî kerîyê resulê xweda! Lazim e em baş guh bidne van gotin, şiyarî û tewsiya. Lewra çewa gurê pez heyata pez tehdît dike, şeytan jî heyata me zaryê Âdem 'eleyhisselam tehdît dike. Belê gur heyata pezî dinyayê tehdît dike. Lê Şeytan!... Ma dinya tenê? Belkî heyata mey dinya û axretê tehdît dike. Lewra em baş dizanin ku heyata heyatê, li dinya û axretê; naskirina xweda û resulê xweda ye, bicîanîna emrê xweda û ji dūrketina nehya ye.

Çara xelasiyê ji gura çîye? Bihevrebun e, biratiye, cema'etbun e, camî û mizgeft in. Lewra, evana însan mihafeze dikin. Xweda û resulê xweda bibîra însan tînin, wezîfa wîyî li dinyayê pê didine zanîn û dibne wesîla nêzîkbuna xweda... Piştî însan van tedbîra bistîne, însaallah ewê ji gur û gura mihafeze bibe, wê nikaribin nêzîkî wî bibe. Lewra, ewê dora wî, bi nûra îmanê û teqwayê hatibe pêçandin...

Madem heqîqet û a rastîn ev e! Gelî însana! Werin em heyata xwe mihafeze bikin. Li dinya û axretê rîya şahiyê nasbikin û bikevne vê rîya selamet. Xweda, me di vê riyê de muweffeq bike. Wesselam...

“Bawerîya ‘ebdekî rast nabe, heta dilê wî rast nebe, dilê wî jî rast nabe heta zimanê wî rast nebe” (Îmam Ahmed) Wek vê hedîsê me gelek hedîs û bêj biwer par kirin li ser vê mijarê.

Xwedayê Te’âla jî di suretê Mûlk ayeta 13a de li ser gotinê wiha ferman kirye: **“Dixwazin gotinê xwe bi dizî bêjin; dixwazin bi heşkere bêjin. Ew (c.c) tiştê di dila de zane”** (Îbnî ‘Abbas dibê: ev ayet di heqê mûşrika de nazil buye, lewra wan behsa Resul ê Xweda dikirin û dev davêtnê, Cebrail jî tiştê wan, ji Resul ê Xweda re digot. Jiber wê mûşrika ji hevra gotin wexta hun peyivîn bi dizî bi peyivin bila Rebbê Muhammed nebihîze, li ser vê Xweda xeber da go: “Tu tişt ji min nayê veşartin” Safwetût Tefasîr mûlk, 13)

“Ev xîtab ji tevî însana re ye; yanê gelî mirovan hun dixwazin gotinê xwe, bêjê xwe bi dizî bêjin, hun dixwazin heşkere bêjin. Veşêrin jî hun heşkere jî bikin wekhev e. Xweda zane. Tiştê veşartî û di nîyetadeye jî zane. Tiştê ku di qelba de derbas dibe û ê ku weswese dide zane.” (Safwetût tefasîr mûlk, 13)

Dîsa di Quran a Kerîm suretê Kaf ayeta 18a de wiha ferman dike: **“Mirov ji qencî û xerabîyê çi bêje muhaqqeq meleiketek çav lê ye û gotinê wî qeyd dike”** Xweda rast gotîye...

Îca ka em binêrin bê mûfesîra li ser vê ayetê çi gotine. Îbn-î ‘Abbas wilo dibêjê: *“Ji xêr û şer çi dibêje dinivîsêne.”* (Muxtasar-i İbn Kesîr, 3/374) Hesen Besrî jî dibêje: *“Wexta kurê Adem dimrê deftera wî tê pêçan û roja qîyametê jêr tê gotin: kitêba xwe bixwên îro bi hesabdarî û bi pirsyanî nefsa te ji te re bes e.”* (İsra sûresî, 17/14, Bahr, 8/124, Muhammed Alî Sabunî, safwetût Tefasîr, Ensar Neşrîyat:6/163-164)

Mewdufî Xweda jê razîbe, di “Tefhîmûl-Quran” da li ser vê ayetê wiha dibêje: *“Yanê ji alîkê em tevî hal û herket û fikrê însan rasterast zanin. Ji alyêdi dû melaiket hatîye şandin ser însan. Ewana yekbiyek gotinê qeyd dikin. Qet ne gotinek û herketekî însan ji nivîsandina wan xelas*



Ziman û Zimanê Da'wetvanê Îslamê - IV. Her Tişt Tê Qeydkirin

gotinê xwe ê li xwe guhdarî bike. Wê bi çavê xwe li hal û herketê xwe ê binêre. Hem ne mûmkûne ku însan tiştê kirîye û gotîye înkâr bike. Belê di vê hewceye ev jî bê fêhm kirin.

Me carek din fêhm kir ku ne bêjek ne galgalek ne halek ne hewalek qet winda nabe, hur û gir, qencî û neqencî çi her tiştê em dikin û dibên tê qeyd kirin. Jibo ku roja axretê şahîdtîyê li ser me bike. Tû kes ji şahîdtîya azayê xwe xelas nabe, tû xerabî bêceza tû qencî bê mûkafat nabe. Ew çax em karin bêjin ku ji xêrê her tiştê em dibêjin yar e, yaran e; ji neqencî û xerabîyê her tiştê em dibên dijmin û neyar e.

Erê me baş fêhmkir ku hem bi melaiketê xwe her tiştê qeyd dike û hem jî Xwedayê mezin bi ‘ilm û qudreta xwenî bê dawî her an û hîn li me dimeyêze, li me guhdar dike. Madem em her daîm di bin nerîna Xweda de ne û her hal û gotinê me tê qeyd kirin ew çag tiştê ku li hemberî Xweda stuyê me xwar bike û me rûreş bike em nekin û nebêjin.

Peyva dawî Xweda peyvê me bike wesîla hişyarbuna milletê me. Spartîyê Xweda bin. Xweda yar û alîkarê me teva be.

nabe.” Yanê wexta ‘edaleta Xweda ji însan hesab û pirs bê kirin, li hember ku Xweda zane bê însan çikiryê, dîsa jî jî bo ku tevî hal û gotinê wî qeyd bike û piştra bîne ber çavê wî li ser şahîdtîyê bike dû heb melaiket wê bibe şahîd. Em nizanin bê ê qeyd kirna wan melaiketa çewa be. Belê tiştê em jê fêmdikin cîyê însan têde dijîyî û radibe û rudinê dewsa hal û herket û gotinê însan têde çêdibe. Jiber wê Jiyân û gotinê însan bêgûherandin êbê ber çavê însan.

Însan ‘eynî karî bi alet û ‘edawatnî kêm tîne meydanê. Belê bêşûphe melaiketê Xweda hewceyî wan ‘edewata nakin. Wûcud û bedena însan û her tiştê dora wî hal û herket û gotinê însan di xwe de bêgûherandin qeyd dike wek teybê yan wek filmekê. Kurê Adem bê çi gotibe roja qîyametê ê bi dengê xwe bi



Mêvan û Ma'zuban

Xwedayê Rebbê 'alemê, xwedî litf û keremê ye. Qencî kirye. Qencî daye. Qencî hildaye. Rehm û bereketa xwe, li camêr û qencê riza xwe re daxistîye. Rast û durust, merd û comerd, 'adil û bi gîret, li ba Xweda qedirbilind in. Xweda bi wan 'edalet qaîm, xweşî û hizur daîm kirye. Mezlum û mumina bi delîl, fîtnekar û sextekara jî, zelîl kirye.

Kî kare wesfê gernasa, pesnê mêrxasa biqedîne? Kesê Xweda xwest, qencî û xêrê dixwaze. Xêr xêrê tîne. Li çend der û devera digêrîne. Qeza û bela diqewrîne.

Millet li ser mêvanîyê, nav daye bi ma'zubanîyê. Herçî padîşah û wezîr, maqul û camêr û mîr, pesnê xwe dane bi qencî û mêvanperwerîyê. Hinek bûne merselle, hinek jî destan. Jixwe encax ji bo Xweda be, dibe layiqê pesn û helbestan. Milletê me ji ma'zubanîyê pir hîskirye. Mêvanê Xweda hewandîye. Bi tiştê ji dest qedîya, qencî û camêrî bexşandîye.

Çawa heqqê misluman li ser misluman heye, heqqê cîran jî li ser cîran heye. Heqq û hiquq, biratî û cîrantî, dostanî û mêvanî û ma'zubanî, heger li gor razîbûna xwe be, hem Xweda razîye, hem jî Resulê wî. Pêxemberê me Hezretî Muhammed (s.x.l) dibêje: **"Kesê tîr rakeve, cîranê wî jî birçibe, nejmeye."** De îja em li halê xwe bifikirin. Qet nebe hema meriv kare birçî û belengazê der û dora xwe, sağke û bipirse. Li ser vîya tê gotin **"Ji qurbana heta qurbana, goşt neketîye**

nav dev û dirana."

Her çiqas mêvan bi qismetê xwe re tê, lê ev nabe ku her wext û bê seruber be. Ma'zuban ji mêvanperwerîya xwe, mêvan jî, ji mêvantîya xwe mesul in. Heger di heqqê xwe de bin, dû'a ê herduwa li ba Xweda meqbul in.

Li ser vê merselê dibêjin: Rojekî yek diçe mêvanîyê. Rojek, du roj, heftekek mêvan naçe. Mehek derbas dibe, lê ji mêvan tu nîşanê çûnê xuya nabe. Zilam û jina xwe lê dinhêrin wiha nabe. Radibin dişewirin. Bi henekî ewê pevbiçin. Roja din sibehê, zilam bîna xwe li jina xwe teng dike. Pê re diğeyde. Jinik jî çend peyva dike. Zilam xwe lê radikşîne û dibêje *"Bi vî sibeha oğira ewê mêvanê me tê de here, ezê litexim."* Mêvan merselê fêhm dike û hema xwe davêje nav merselê, dibêje: *"Bi vî zexîra emê zivistanê bi hev re bixun, te lê nexist."*

Hey mêvanê çavnebar! Ewqas jî nebu. Qencî neke xerabî. Dosta neke cewabî. Dû re tê poşman bibî. Mêvanî bi ser sê roja keve, ji isul û 'adet derdikeve.

Heger tu çû mêvanîyê, peyv û parîyê xwe, dirêj neke. Xwedî malê sergêj neke. Hal xatir û mihebbet xweş e, ser de behsa Xweda û Hebîbê wî, xwestir e. Heger tu karibe dest vala nere, bixêr ala vegere. Bila ji bo Xweda, mêvan ji mêvan razî be, ma'zuban ji herduwa razî be. Xweda jî ji wan razî be.



Kîbr (Quretî)

Quretî ne exlaqekî Îslamî ye. Ji lew ew jî nexweşiyêke qelbî ye. Xaliqê mezin di pirê ayeta de însanê qure zemm kirîye.

“Bi rastî xweda, ji wan kesê ku xwe mezin dibînin û heqqiyê qebl nakin, hez nake.” (Nahl, 23) **“Qesem be wana di nefsa xwe de meznatî û înyad kirin. Bi harîtkî mezin ji heddê xwe derketin.”** (Baqara, 34) **“Ê ku ji quretîya xwe ji min re ‘îbadet nake û ruyê xwe bizivîrîne, muheqqeq wê bi zelilî here cehenemê.”** (Mumînun, 60) **“Lêbelê îblîs li ber xwe da û ji kibra xwe nehat xwarê. Ji xwe ew, ji kafira bu.”** (Baqara, 34) **“Ji xweda re ‘îbadet bikin û jê re şirîka çenekin; paşî ji bav û dîya xwe re, ji merivê xwe re, ji sêwîya re, ji feqîra re, ji cînarê nêzik û dûr re, ji hevalê xwe re, ji ê ku di rê de mane û ê ku dibin destê we de ne... Ji teva re qencî bikin. Xweda ji kesê qure û pozbilind qet hez nake.”** (Nîsa, 36) **“Wek wayê qure, ti jî ruyê xwe ji însana nevegerîne! Li ser ruyê erdê bi quretî birêve nemeşe! Lewra xweda ji wan kesê ku xwe mezin dibînin û pesnê xwe didin, heznake! Di rêveçuna xwe de mutewazî be! Bi dengê bilind xeber nede!”** (Loqman, 18)

Resulê xweda (s.x.l) di derheqê kibrê de wiha gohtîye: *“Di qelbê kî de wek bizrê xerdelê kibir hebe, ew naçe cennetê. Û di qelbê kî de jî wek bizrê xerdelê îman hebe, ew jî naçe cehenemê.”* (Muslîm) Di hedîseka din de: *“Ê ku kibrê dîkin wê roja qîyametê wek bizrê tov li erdê bêne reşandin û bi vî*

şeklî ewê heşr bibin. Ewê di bin piya de bi pelçiqin, paşî wa dişînin cehenemê. Agîrê dijwar dor li wan digre û wa hişk zeft dike. Xwarin û vexwarina wan ji herîya “habel” ê ye. Habel, avekî zere ji cesedê ehlê cehenemê diherike.” (Muslîm-Buharî)

Îmamê Ğezalî (r.x.l) di kîteba xwe ya “Îhya” ê de wiha behsa vê meselê dike: *“Celebê kibrê sisê ne. Kibra li hember xweda. Kibra li hember pêxembera û kibra li hember ‘ebdê xweda.*

Kibra li hember xweda ewe ku wek Nemrud û Fir’ewn û Haman a ne.. Ev û ê wek vana di her demî de înkara xweda kirine û ji xwedê re serî hildane. Ev celebê kibrê, bêhtir bed û xerab e. Di vê dewrê de xwedîyê vê kibrê pirin.

Kibra ku li hember pêxembera jî hatîye kirin, wek muşrîkê Mekkê û wek Yahudîyê Medîne û yên dora Medîne... Wek Ebu Cehîl, wek Welîdê kurê Muğîre û wek wêrisê wayê vê dewrê.

Kibra ku li hember ‘ebdê xweda tê kirin; ev celebê kibrê jî bi pirê sebaba tê kirin.

Wek ‘alimê qure ku bi ‘ilmê xwe kibrê dîkin. Ew bi ‘izzeta ‘ilmê nefsa xwe mezin dîkin. Xelqê ‘ewam biçuk dibînin û bi nezara cahila li wan dinhêrin. Yek di hurmet û hizmetê de qusur bike hêrs dibin. Jêkirî wê xelq helak bibe; lêbelê ewê xelas bibe. Ew zen dike ku li cem xweda ji xelqê bi qîymettir e.

Sebebek jî ewe ku bi emel û îbadet tê kirin. Zahfêkî zahid û 'abid hene ku dixwazin di qelbê xelqê de cî bigrin. Ew jî ji rezaleta nefsa mezin û ji kibrê ne dîr in. Dixwazin ku xelq timî herne zîyaretîya wan. Dixwazin ku xelq wa te'zîm bikin, îhtîyacîyê wan bibînin û wa ji ehlê teqwayê bi hesabînin. Heger ji xelqê va tiştê kêm bibînin hêrs dibin û di qelbê wa de teqasîkî çêdibe û ji zuhd û îbadetê sar dibin.

Sebebek jî ewe ku însan bi nesebê xwe, an bi eşîra xwe, an bi cemaata xwe, an jî bi örguta xwe quretî dike. Ê di vê rewşê de be heq-niheq timî te'essuba ehlê xwe dike.

Wek vana sebebê dî jî ewin ku hinek însan bi delalîya xwe quretî dikin. Ev celep, ekserî di nav pîreka de xuya dibe. Hinek însan bi maldarîya xwe quretî dikin û hinek jî bi heval û hogirê der û dora xwe quretî dikin.

Xwedîyê kibrê cirnexweş û xuntehle. Lewra çî çag qîmeta wî li gor hinek dî zêde bibe, û an jî bibe xwedîye meqamkî, an bibe berpirsîyarê wezîfêkî, cîvatekî, an cema'etekî, pozê wî bilind dibe û nefsa wî mezin dibe, ê bin destê xwe biçuk dibîne û dibe ku carna jî tinazê xwe pê dike. Wî, ji nefsa xwe dîr dike. Tenezzul nake pê re runê, pê re bimeşe an jî pê re xwarinê bixwe. Heger kibra wî lê zêdeke dixwaze ku ê bindestê wî di hizura wî de şîpya bisekine.

Xwedîye kibrê dixwaze ku xelq qîmetê bidinê û hurmetê nîşandin. Here cîvatekî dixwaze tev ji ber ve rabin pîya û cîhê xweş û bilind bidin wî. We'z û nesîhetê kesî li ser nefsa xwe qebl nake. Yekî ku cewaba wî bide zora wî diçe. Şefqetê nîşan nade, minnetê dike. Xwe bi aqil, xelqê cahil û ehmêq dibîne. Dixwaze xizmet jê re bê kirin.

Ê ku di nefsa wî de quretî hebe, nikare tewazuyê bike, nikare kînê ji dilê xwe bavêje, nikare hêrsa xwe bixwe, nikare serê xwe ji heqîyê re bitewîne, nikare terka hesed û sebê bike. Loma **"Ê ku qedere giraniya bizrê xerdelê jî kibir di qelbe wî de hebe naçe cennetê"**

Lebat û 'emelê ku ji kibrê tene meydanê pir in. Di vê mijara kibrê de însanê 'alim û xewas jî helak bune. Însanê zahid û abid jî kêm ji kibrê xelas bune. Xwedîyê kibrê, ger çiqas xwe di nefsa xwe de mezin bibîne jî, a rast û ji dil ewe ku di çavê xelqê de bi vî exlaqê xwe biçuk û xuntahl dibe.

Hat zanîn ku kibir jî, nexweşînek dijwar e û afatek mezin e. Xwedîyê xwe tuxe cehennemê û dike mustehqê ghezab û 'ezabê xwedê.

Me hêvîye ji rebbê xwe ku çiqas musulmanê bi nexweşîna ma'newî û maddî ve merezdarin, ji teveka re şîfa bişîne. 'Îzzeta Îslamê û musulmana serdest bike. Selamê xweda li ser tevekî musulmanê dinyayê be. Bi xêr û selamet bimînin.

Zemm : Kötülemek
Tengasi : Darlık-Sıkıntı
Hez : Sevme
Rewş : Durum-Hal
Meş : Yürüyüş
Te'essub : Hişk Bawerî
Pesn : Övme-Övgü
Maldari : Zenginlik
Bizr : Tohum
Cirnexweş : Huysuz-Gıcık
Pîpîfîn : Şişinmek(Surat Asma)
Berpirsîyar : Sorumlu
Reşandin : Serpmek-Saçmak

Tinaz : Alay Etmek
Pelçiqîn : Ezilmek
Şîpîya : Ayakta
Hişk : Sert-Sıkı
Tev : Hepsi
Zef : Yakalama
Lebat : Hareket
Celeb : Çeşit-Kısım
Mijar : Konu
Bed : Kötü-Çirkin
(r.x.l) : Rahma Xweda Lê Be.
Hêrs : Öfke-Kızgınlık
Te'zîm : Hebandin

Ax Dayê



*Dayê birîna me kure nalinê me çûn 'ezmana
 Van zalima vê dînyayê li me kirne wek zîndana
 Her roj dirêjin xwîna me, li çar teref, li meydana
 Ax dayê birîndarim ez çare tûne li vê birînê ax...*

*Xapandin keç û xortên me revandin ji xwer malê me
 Agir dan bağ û bexçê me kûştin şêx û 'alimê me
 Birîna me pîr kûr buye qêrîne li 'ezmanê me
 Ax dayê çîbkim bê zarim çare tûne li vê birînê ax...*

*Em dixwazin biratî û aşîti hebe-l nav ûmmetê
 Mezlum û müsted'ef jî serfirazbin bi se'adetê
 Herkesî gîretkêş be d-rêya Quran û Îslamiyetê
 Ax dayê tiştêk-j dest nayê çare tûne-li vê birînê*

*Dirêjin xweynê û dimijin îsrail rus û 'emriqa
 Li filistin li cezayir-l afganistan u-l çeçenya
 Malê kû-j xwere dabun hev sotin tevî van zalima
 Dayê hezînim dibêm çare tûne li vê birînê*

*Heye çare eya hezîn rabe îdî tû xwe karke
 Çare eve mûmîn hemî bicvin bi yek cema'ete
 Cehdê bikin bi zalimar ger here mal û kuflete
 Umîda xwe nebire-j xwedayê rebbê 'alemê ye*

Huseyin YALÇIN



“Bira pozê wî bişewite!”

Bi navê Xweda ê Rehman û Rahîm

“Xweda yê te ferman kiriye ku hun îbadetê wî tene bikin û digel dê û bavên xwe qenc bin. Vêca heke yek ji wan (dê-bav) yan jî herdu li cem te kal bibin, ji bo wan “of” nebêje, wan ne êşine û ji bo wan xeberê xweş û germ bêje. Ji bo wan, ji dilovanî xwe nerm bike û milê xwe ji wan re deyne û bibêje: “Xwedayê min! Dema ez biçukbum çawa ku wan ez xwedî kirim û dilovanî li min kirin her wisa ti jî dilovaniya xwe li wan bike” (Îsra, 23-24)

Ji Ebu Hureyre (r.‘e) hatiye riwayetkirin ku; rojekê yek tê ba Resulullah (‘aleyhîsselam) û wiha dipîrse. “Însanê ku ez pê re hevaldariyê bikim û sohbet û xizmeta wî bikim, ê pir layiq kî ye?” Resulullah ‘aleyhîsselam li ser vê pirsê wî wiha cewab da: **“A pir layiq, diya te ye”** Ewî kesî go: “Piştî wê kî ye?” Resulullah ‘aleyhîsselam dîsa go: **“Diya te ye”** Ewî kesî go: “Di-pey wê re kî ye?” Resulullah ‘aleyhîsselam go: **“Diya te ye”** Ewî cara çara pirsî: “Di-pey wê re kî ye?” Resulullah ‘aleyhîsselam vê neqle go: **“Bavê te ye”** (Muslîm)

Muğire b. Şu‘be ji Resulullah ‘aleyhîsselam wiha rîwayet kiriye: **“Bêgoman Xweda bi neqencî mi’amela dê û bavan li ser we heram kiriye.”** (Buxarî)

Ji van ayetê Quran a pîroz û hedîsê Resulullah ‘aleyhîsselam tê fêmê ku; Îslamiyet pir ehemmiyet daye wezîfa ewladayî ku li hember dê û bavan. Digel di Quran a pîroz de û digel di hedîsê şêrîn da; pirê cara dipey baweriya Xweda û wezîfa însanî ‘ebdîtiyê de, dilovantîya însanî li hember dê û bavan û **“Her dem li hember dê û bavê xwe bi qencî bê mi’amele kirin”** tê.

Evêya wazîfe ye ji însan re. Jiber vê digel di ayetê Quranê de û digel ji di hedîsê Resulullah ‘aleyhîsselam û kitêbê Îslamê de, bi navê **“Birr-ul walideyn”** hatiye navdan. Evêya jî dide nişandan ku; ji însana re/mumina re dipey bawerî û ‘ebdîtiya ji xweda re wezîfa wîyî diduya evêya ye. Yani dilovantiya li hem ber dê û bavan e... Lewra;

1. Însan piştî ku di welide mezinbuna wî, a bedenî û ruhî; nî‘met û lutfeka Xweda ye. Di-pey re jî fedekarî

û gorîtîya dê û bavan çêdibe. Lewra Xweda ê Te‘ala dê û bav kiriye sebeb û wesîte ku zaruya werîne dinyê. Ji ber vê zaru hetta ku mezin dibe, dê û bav bi terbiya wî re ‘eleqedar dibin.

2. Xweda ê Te‘ala, li vê dinyê wextê ku li însan lutfekê dike û nî‘meta didê ne di ber tiştê de dide ‘evdê xwe. Dê û bav jî gava ku qencyekê bi zaruyê xwe dikan, ne di ber menfe‘et û hêviyekê de dikan.

3. Xweda ê Te‘ala **“Rahman-ud dunya”** e. Yanî li dinyê ‘evdê wî çî mumin bin, çî jî kafir bin, li wan nî‘met dike. ‘Evdê wî çî çîqas gunehkar be jî, nî‘metê xwe jê nabire û dide. Dê û bav jî, zaruyê wan çîqas nebaş bin jî, himaye û piştana xwe ji wan kêmanakin...

Bele! Evana tev bi me didine fêmkirin ku bê çima îbadatê Xweda û mi‘ameleyeka baş bi dê û bavan re dipey hev re tîn.

Ustad Bediuzzeman (rehmeta Xweda lê be) di **“Rîsaleya Extîyanan”** de, di derheqê vê meselê de wiha dibêje: **“Belê! Di dinyê de heqîqeta mezin, şefqet û gorîtîya dê û bava, li hember zaruya ye. Jiber vê, bi şekleki mezin, li hember vê gorîtîya xwe hurmeta mezin para wan dikeve. Lewra ewana, jîna xwe bi kêfxweşî ji bo jîna zaruyê xwe feda dikan/serf dikan. Mademkî hal wiha ye; însanê ku însaniyeta xwe hunda nekiriye û nebuye cenewar, wezîfa ku li serê ferz e ev e ku, gereke ji wan dostê muhterem û sadiq re bi îxlasî hurmet bikin û ji dilê safî xizmeta wan bikin û razîbuna wan qezenc bikin û dile wan xweş bikin.”**

Resulullah ‘aleyhîsselam di derheqê wan însanê ku dê û bavê wan extîyar in û jiber ku wezîfa xwe li hember wan nayine cî û jiber vê jî nakevine cennetê de wiha kerem kiriye. Lewra dê û bav, dibine cenneta ewlad jî, dibine ceħennema wî jî.

Ji Ebu Hureyre (Xweda jê razî be) hatiye riwayetkirin. **“Rojekê Resulullah ‘aleyhîsselam “Bira pozê wî bişewite! Bira pozê wî bişewite! Bira pozê wî bişewite!”** Me pirsî: “Ey Resulê Xweda! Bira pozê kî bişewite?” Resulullah ‘aleyhîsselam wiha go: **“Ewê ku extiyariya dê û bavê xwe yan jî, ya yekî ji wan dibîne û nakeve cennetê (bira pozê wî bişewite)”** (Muslîm)

Sebr û Nimêj

“Ey gelî muminê bi sebrê û nimêjê alîkarîyê ji Xweda dixwazin, bêguman Xwedayê Te’ala bi xweyê sebrê râ ye”

Xweda ê Te’ala di surê Begere ayeta 153ya de qala sebrê û nimêjê dikê. Şehîd Seyyîd Qutub(r. ‘enhu) ev ayeta mubarek pir xweşik tefsir kirîye. Em bi hev re lê guhdari bikin:

“Sebr di Quran a Kerîm de pir tê carî kirin; ji ber ku Xwedayê Te’ala çêtr zanê ku wextê mirov di nav fisq û ficurê de di rîya rast de li ser heqîyê bi meşin û li ser rûyê erdê mirova da’weftî bibal rîya Xweda bikin bê wê çiqas gîret lazim bê û wê çiqasî leqayî zehmetîyê bibin û wê çiqas ji wa re manî derkevin ji ber vê yekê sebr di Quranê de pir hatîye carî kirin.


Ev gîret dixwazê ku mirov hêrs nebê, bi şiklekî pir zêde xwînsar bê, daîm seferberkirine kanîyê qewetê, dixwazê û ji bo daxilbuna xaina û riyê bazdanê re gerek pir jîr bê. Li hember va teva mutleqa sebr lazim e.

Ji bo dewam kirina ‘ibadetê sebr... Ji bo ku mirov ji guneha dîr bimîne sebr... Ji bo ku mirov karibê bi wan kesê ku, rîya mirov digêhênê Xwedê dibirin, re cihadê bikê, sebr...Li hember texlîd, dafik û dolavgerê dijmin sebr...Li hember derengmayina serfîrazî û serkeftinê sebr...Li hember dirêjbuna mesafê ku gerek mirov jê bi bihurê sebr...Li hember belabun û qewet standina bawarîyê tewş sebr...Li hember hindîkbuna dosta û destgira sebr...Li hember dirêjbuna rîya dur û bi sitirî sebr...Li hember wijdanê şematok sebr...Li hember dilê heyirî û xurifi sebr...Û li hember êşê çivok (Rîykâr) û bêbextan sebr... Her wiha heke wextê hedefa ku mirov bi gihîyê dirêjbibê û ta’da û tengasî zêde bibin û di holê de qût û heval tinabin, wî wextî wê sebr za’îf bibê; an wê sebra mirov xelas bibê. Ji ber vê yekê Xweda ê Te’ala nimêj û sebr bi hev ra zikir kirîye û anîne balhev ji ber ku nimêj kanîyeke ku naçikê û quteke ku xelas nabe û ew qûteke ku kanîya qewetê nû dikê, û qewetê didê dil, û bi xêra wê tayê sebrê dirêj dibê, û qalin dibê, ji bo ku ne qetê û peyra jî dîlxweşi, kêf û huzurê dide dil, û ewletî pê anîn û ‘azmê dide sebrê.

Ji ber ku mirov ‘aciz û za’îfe, û quweta wî heta bi cîhekîye, û li hember ta’de û zordestîyê za’îf e, mutlaq îhtiyacîya wî bi alîkarîya Xweda heye, gerek alîkarîyê ji Xweda bixwazê.

Çi wextê li pêşberî quwetteke neyarê Îslameyî veşartî an eşkere Werê û wextê di bin têkoşina ku li hember fesadê û zalîmê har de, dimênê ... Û wextê

fêmkir ku li hember ‘emrê xweyî kin rêya ku pêde herê û hedefa ku dixwazê bigihîyê hê pir heye û lê bu şev, hê rê dûre û ‘emr, li ber xalasîyê ye û tiştêk derdest ne kirîya... Û wextê dît ku xerabî belabuyîye û quwet standîye û li



pêşberî wê xerabîyê çiqasî diçê qencî kêm dibê û di pêş de jî ti ronahîyê nebînê û di rê de ti ‘işaret tine ne... Ha di wî halê wisa da qiymetê nimêjê derdikevê. Nimêj têkilîke rasterast e di navbeyna ‘evdê fanî û Rabbê ‘alî da ye. Nimêj; tiştêki wisa ye ku nivê havîni, naverojê li ber germê, ba kî cemidîye, dilopek ji barana baharê ye, siha darê ye, Nimêj ji dilê şikestî re destê şefqetê ye...Ji ber ku nimêj wiha ye wextê ku Pêxemberê me (sallallahu ‘aleyhi wesellem) dîldeng dibu ji muezinê xwe Hz. Bilal re digo: **“Ey Bilal bi nimêjê dilê me xweşkê”** Çawa ku wextê Pêxemberê me (sallallahu ‘aleyhi wesellem) dikete tengasîyê ji bo ku bêhtir bighê Xwedê ji her car behtir nimêj dikir.

Îslam, sazûmaneke ‘ibadeta ye di ‘ibadetê de pir sir veşartîne. Siren ji ê nimej; Nimêj qutê rê ye, ji ruh ra kanîya enerjîyê ye, cîla dil e... Kengî em li pêşberî binbarîtîyeke gran werin, nimêj, ji dil re dibê mifta ku wê binbarîtîyê bi kêf û xweşî û selamet derbaskê. Ji ber vê yekê wextê ku misliman dikevê dîltengîyê Xweda ê Te’ala wî berhêli sebrê û nimêjê dikê:

Bêguman Xweda ê Te’ala, bi xweyê sebrê re ye, alîkarîyê bi wan re dikê, ‘azma ku liberxwe bidin didê wa. Qeweta wan zêde dikê, bi wan re dibê heval, rîya ku pê de diçin wa bitenê nahêle, û wa bi xwe bi xwe nahêlê, tam tersê wê wextê rîya wan dirêj dibê ‘ezma wan zêde dikê. Xweda ê Te’ala di serê ayetê de bi gotîneke xweş “Ey gelî mumina” xîtap dikê û bi wê gotîna xweş domdikê **“Bêguman Xweda ê Te’ala bi xweyê sebrê re ye”** û bi mizgînîke ku dilê mirova xweş dikê û cesaretê didê mirov û diqedînê.

Heta carek din em bibne mêvanê we, bimênin di xêr û xweşîyê de. Emanetî Xweda bin.

(Li ser medhê Rîsale ê Nûr û Seyda Bedî'uzzaman hatîye gohtin)



Mela Ali Zila el-'Ilmi

Çavê xwe dî vê 'alema nûrê de megîr vek
Roj nabe bi çav girtinê şev yazîge ev dek

Bes puf meke vê nûra xweda, roj e ne lempa
Na temre çîqa puf dîkê ew geş dîbe bê şek

Ser çavê te 'ewr û 'erma xudbînî te'essub
Ser sem' û dil û 'eqlê te, teqlideki tev zeng

Van aletê xerbende tu pê roja heqîqet
Nabînî, xiyal tu zendike, pur yanîşî pê kenk

Cem'a te mukesser bi qulubê xwe yê şetta
Ew jî bi vê teşxîsê ne razîne bi aheng

Erbabê 'ilim ehlê 'aqil ehlê heqîqet
Eşhabê qulub tev li te xwey nefret û dil teng

Ev nûr û rîsalat ê nucum kewkebê îman
Nabîne hutamiyyu enaniyyu ceban reng

Ustad ê bedî' nûra wî 'eql û dilê sağlem
Tev kirne qeubul 'aşiq û mestanene lê beng

Wî hefsed û pênçî bi jîmar ayetê îman
Tefsîl û beyan kir nedî kes xarîqe ev reng

Weqta ku wî Quran û hedîs, lewhê wucud xwend
Nûra wê dî her cî de vekîr medrese da deng

Wî sur û husun qel'e ê vê felsefa kufrê
Tev zêr û zeber kir çî 'ecêb nûre cihan ceng

Bê hedd û hisab, pencerê tewhîda îlahî
Ayatê wucuda wî vekîr, 'alem ê heq beng

Esrar û mu'emma ê wucud, tilsîm ê îman
Her mesel ê Îslamê bedî' keşfe, bi sed reng

Munkîr buye teslim, tune yek çarekî jê ra
Lê kor ê muqellîd bi 'înad ê tike teng teng

Ruhbanî bibe tabî'ê burhan ê Quran
Ev fitne li kevra nekeve kengî dîbe keng

Mêjok ê murîd 'ebd ê lefiz kole ê cah mal
La yercî'u 'en zalike, la yubsîru za 'enk

Mehdî jî ku bê, nabe jî vî terzî xwe bê xwar
Şe'ranî û Şeyxê 'Erebî daye me ev deng

Ehîlami yê nefsanî çawa-b xwaze dibîne
Edğasî yê xewnokî hukum saqîte tev zeng

Te'wil û ne te'bir tune jê ra ewe jê ra
Wek dem'ê nîfaqê kirye tur û 'esaleng

Ya reb me bi cah mal ê dinê şe'se'a zahir
De'wa rijê se'ya vala nekî şermende û bi keng

Hifza me-j her bîd'ê delalet bikî daîm
Me-j 'ilm û 'emel şer'a şerîf dîr nekî yek lîng

Dek: hîle

Pê kenk: Pê tê kenîn

Cem'a te mukesser bi qulubê xwe yê şetta:

Cema'eta tu tèdeye şikandîye û bi qelbê xwe jî belawela ne

Bi aheng: Hesret

Nucum: Sîtêrk

Hutamî: Put û pertalê dinyayê

Enanî: Enaniyet

Ceban: Tîrs

Lê beng: Gazîkirin

Lewhê wucud: Kitêba kaînatê

Mu'emma: Tîştên veşartî

Mêjok: Ê ku dimije

La yercî'u 'en zalike, la yubsîru za 'enk: Ji vî halê xwe nazîvirin, vê qenciyê ji te nabîne

Ehîlami yê nefsanî: Di nefsa wî de çî hebe wî tîştî di xew de dibîne

Edğasî yê xewnokî hukum saqîte tev zeng: Yanî xewnê tevlîhev, bêhukm in

Wek dem' ê nîfaqê kirye tur û 'esaleng: Weke demlayê nîfaqê û xistiye turîkê xwe û qeyd li lingê xwe xistiye

De'wa rijê: De'wa bê run û bê xwê, kelê

Bi keng: Yê ku pê tê kenîn

Hîkaya Padîşah û Wezîr

Di demekî de padîşah û wezîrekî bawermend hebuye. Wezîr di her hereket û tevgerê de, di her mesele û buyerê ku bi serê wî de hatibuna hîkmetek derdixist. Digo: **“Miheqqeq di vê meselê de jî hîkmetek heye.”** Bi vî hawî wezîr ji padîşahê xwe re jî wilo bu. Wexta buyerê, tiştêk bi serê padîşah ve bihata wezîr digo: **“Miheqqeq di vir de jî hîkmetek heye.”**

Rojekê tilîka padîşah jêdibe. Canê padîşah pir diêşe û hem diqahire hem jî ‘aciz dibe. Lêbelê dîsa weke her car wezîrê wîyê bawermend ji gotina xwe namîne paş û dîsa dibêje: **“Padîşahê min! Miheqqeq di vê jêkirina tiliya te de jî hîkmetek heye.”** Padîşah jixwe êşiyabu, ‘acizbubu; bi vê gotina wezîr bêtir qehîrî û ‘acizbû û go: **“Ma derdê te jî ne bes e. Tu dibêje di her tiştî de hîkmet heye. Ka çi hîkmet heye? Ezê te bavêjim hepsê û ji te xelas bim.”** Padîşah fermanî leşkerê xwe dike û dibêje: **“Vîya bavên zindanê.”** Leşker dikevin bin çengê wezîr di nav xwe re dikin û wî dibin zindanê. Wezîr hê di rê de di nav milê leşkera da ye bi ser padîşah de dizivire û ji padîşah re wiha dibêje: **“Di vê girtina min de jî hîkmetek heye”** Padîşah şaş dimîne. Dibê: **“Ev însan diçe hepsê jî, dev ji gotina xwe bernade”**

Wezîr dikeve hepsê demeke dirêj di hepsê da dimîne.

Piştî demeke dirêj weke her carî; ku ji exlaq û ‘adetê padîşahbu çûna nêçirê. Rojekî padîşah û tevî heyeta xwe derdikevin nêçirê. Bi çolê da, di nav dar û bera, kevir û zevîyan da dimeşin. Diçin cîkî dûr û tenha. Li wê derê merivxur (yamyam) dora wan digrin û nahêlin yek ji wan bireve. Yeko yeko wan zeft dikin û yeko yeko wan dixun. Dor tê padîşah... Mêzekirin ku tiliyê padîşah qutkirîne û padîşah naxwin. *(Weke hun jî dizanin ku ji exlaq û tebî’etê merivxurabu ku; ji nêçir, yan ji însanê ku bixwin divê ku békêmasî bûna. ‘Eyn weke heywanê têne qurbankirin çewa divê békêmasî bin.)*

Ji ber ku tiliyê padîşah jêkirîbun, kêmasî tê da hebu wî nexwarin. Padîşah bikêf û şahî tê malê û wezîr ji zindanê derdixe û gazî dike ku wî binin. Kêf û şahî û teşekkurê xwe pêşî wezîr dike û jê re dibêje: **“Belê weke te bu. Di her tiştêkî de hîkmetek heye. Tiştê bê hîkmet Xweda nake. Min hîkmeta ku tiliyê min hate jêkirin, hê fêmkir û qedrê gotina te hê ez dizanim. Feqet hê min hîkmeta wê gotina te ya di rîya hepsê de ku te go: “divê de jî hîkmetek heye.” min fêm nekir. ‘Ecêba hîkmetê wê çibu?”** Wezîr dibê: **“Belê, di wir de jî hîkmetek hebu. Lewra ez ne ketibuma hepsê vêga merivxura ez jî xwaribum. Çimkî ez merivêk temambum, di wucuda min de kêmasî tunebu. Vêga ez xwarê wan bum. Bi ketina minî hepsê, ez hatim parêstin û sitarkirin. Hîkmetê vî jî ev bu. Demek, wexta tiliya te hate jêkirin ji bo di pêş da merivxur te nexun û tu bêy muhâfezekirin, û ez jî dipêş de bême sitrandin, ez bi te xistim hepsê.”**

Di xwendin û bihîstina vê hîkayê de hîkmetin hene

Gelî xwendevanê hêja! Belkî me ev serpêhatî pir dirêj kir û me serê we gelkî êşand. Heqqê xwe helal kin; belkî di vê dirêjîyê de jî hîkmetek hebu. Lê vêga ez nizamim. Di pêş da belkî aşîkar bibe. Lê ev jî rastî heqîqetkî ye. Di tevê heyata me da, hema hema herroj em rast tèn. Gava hadîsak bi serê me ve tê: bela, musîbet; yan tiştî ku em naxwazin, em ne qehîrin ‘aciz nebin. Bêhna xwe firekin û bibêjin **“Miheqqeq di vê de jî hîkmet heye.** Wiha rengê ketina me musulmana jî îro di hepsê de û sekna me ya li zindanê miheqqeq hîkmetek pir mezin tê de heye û gelek hîkmetê wê jî em aniha li ber çavê xwe dibînin jî. Di pêşerojê de wê gelek hîkmetê mezin bêne xuyakirin. Xweda me tevekî musulmana bike zana û me bi gerîne ji wan kesê bi çavê hîkmetê li her tiştî dinêrin. Ya rebbî! Dawîya ‘umrê me teva, li ser Îslam û îman û Quranê sabit bihêlî. Em ji te ferehî û îmanê dixwazin. Amîn amîn amîn...



Allah sehergaha ezel



Melayê Cizîrî

Allah sehergaha ezel, yelmumê 'îşqê şu'le da
Nûra cemala lem yezel, zatê tecellaya xwe da

Zatê tecella bû lî zat, bêism û asar û sîfat
Sîrrê hûrufên 'alîyat, xef bû dî sitr û perde da

Zatê muqeddes bû wucûd, coşîş nedabû behrê cûd
Wesf û îdafat û quyud, yek ji tecellayê neda

Husn û cematê xwest evîn, vêkra dî yek zati civîn
Nûra qedîm bu 'îşq û vîn, wan lêkî naz û 'îşwe da

Husn û mehebbet her hebû, Heq 'aşîqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû, neql û riwayet pê we da

Ew nûr e dayî şewq û tav 'alem xweyabû ma dî nav
Berqên xwe avêtin bilav reng rengî berq û lem'e da

Me'nayê 'îşqê bêm çî ye, lew mîn bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye, lamî' dî mîr-ata me da

Husn û mehebbet zatek in, me'sûq û 'aşîq latek in
Lê suret û mîr-atek in, her yek dî me'nayê xwe da

Ger dilber û wer 'aşîq in 'arif dî vê da sadîq in
Ayîneyê nûra Heq in cîh cîh dî wan da cîlwe da

...

Çendî bêxeml û rewneq in, tezyîn ji husna mutleq in
Têk cîlweyê nûra heq in, 'îşqa ezel pê şêwe da

Husn û cemat û 'îşqê ye, aram dî perdê da neye
Mehebûbê lew hetta heye, nabit dî perde-w xilwe da

Mehebûb û xûb û dilberan bigrê lî wan heftê deran
Dê xwe j-şîbak û penceran zahir bikin d-her 'erdê da

Lefz û 'îbaret came ye, mehebûbê me'na bi xwe ye
Lê xemlê husnek zêde ye, lewra bi husnê zîbe da

Çarê hilin yarê bibîn, ne d-perdeya tarê bibîn
Sed carî er karî bibîn, gul wê dî nêva buxçe da

Behra wucûdê coşî hat, nûrek tenezzul bû ji zat
Hatîn te'eyyun têk sîfat, eşya zuhur 'ilmîyye da

Eşya dî 'ilmê bûn zuhur, isman ji feyza "ism ê Nûr"
Teqwîmî bestîn bêqusûr hukmê sîfatê seb'e da

Coşîş ku da deryaya cûd, d-ayîneya "ism ê Wedud"
Carek tecella bû wucud, fûrek ji nûrê jê veda

Wildan û hûr û ger perê, şîrîn û mehebûbên berê
Hemyan ji husna Xawerê, nûre dî wan yek zerre da

Nûrâ ji nura Ahmedi, sirra sîfatên sermedi
D-ayîneya zatê xwe dî, keşfa kemalatê xwe da

Ew bû qelem ew bû 'eqil, lew pê hedîsê da neqil
Deryayê 'ilm ew bû şugîl, tefsîlê 'ilmê cumle da

Ev reng tecella kir Subbûh, saqî ji şehkasa futûh
Mey rêhte cama 'eqil û rûh, roj bû dî qewse qubbe da

Ayîneê zatê yek in, lew dilber û latê yek in
Vêkra dî mîr-atê yek in, hem taze taze 'îşwe da

Her yek ji feyza ismekî, tèn sûreta tilîsmekî
Lew me'neya her cîsmekî, pertew ji nûrê lê veda

Dê sîrrê tewlîdê bibêm, ne-b wehm û teqlîdê bibêm
Me'na ji tewhîdê bibêm, dil vê edayê şehde da

Hay û hûya subbûhîyan, reqs û semaya qudsîyan
Teşbihê cewqa sofîyan, feryad û zîkr û lerze da

Miqdar û şîklê hendesî, kêmezêde yek pê nahesî
Teswir dîkir lîqlîdesî, hetta bi sethê sufle da

Ew yek bi yek xalî nehî, bê hîkmetek 'alî nehî
Ger van surek halî nehî, ew reqs çîra mestane da

Mestane govendê dîkin, reqsê lî dor fîndê dîkin
Qesta şekerxendê dîkin, le'lan ji gewher xende da

Tên bayê çerx û lewleban, tedwir û seyra kewkeban
Şe'se'nîya roz û şeban, dolabê her tê jê seda

Hîn suflewî bazî dîkin, hîn meylê evrazi dîkin
Xweş reqsek şehbazî dîkin, sergeşte ne d-halê xwe da

Her hey-et û her cîsmekî, her ferd û new' û qîsmekî
Rûh wî dî destê ismekî, mayî dî qebze-w pence da

Ew cezme dayî merkezan, ey dil ji ber şewq û lezan
Hîkmet bi qanûnê bîzan, ehlê dil ev jê gufte da

Feyyadê 'ilmê min ledun, pey pey ji behra kan û kun
Geh geh bi ustadê sexun, wî gewherek nasufte da

Însan ber e 'alem durext, sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn îqbal û bext, dewlet ji bala tale da

Ehşen ji vî nezmê letîf, çendî subuk hatî xefîf
Mehbûb bi destê xwe-y şerîf, neqdê me muhr û sikke da

Ehşen ji vî wed'i Mela, eşkal û ewsafên hela
Lew dil bi wan bû muhtela cezbe-w celale-d sine da



(Ev qesîda hanî muhteşem,
ji ber ku pir dirêj bû, ji teref
me ve hatiye kurtkirin û em
vê behra me'rifetê bi şahî
teqdîm dîkin)

Yelmumê 'îşqê: aşk mumu
Coşîş nedabû: Henüz coşup
taşmamıştı

Behrê cûd: Cömertlik denizi
Wesf û îdâfat û quyud: Vasîf,
izafet ve kayıtlarıyla

Vîn: Aşk

Lêki: Birbirlerine işvellenmek

Bilav: Dört bir yana

Çeşm: Göz

**'Eksa cemalek safî ye lami'
di mir'ata me da:** Aşk, safî
güzelliğin ruh aynamızda
parıltısıdır.

Çendî: Her ne kadar

**Têk cilweyê nûra heq in,
'îşqa ezêl pê şewê da:** Hak
nurunun cilvesidir tümüyle,
onlarda işvellenî ezeli aşk

Aram: Rahat, huzur

Deran: Kapılar

Came: Görüntü

Çarê: Perde

Têk: Bütün

Rêhte: Döktü

İqlîdes: Öklit

Find: Mum, Güneş

Evraz: Yüksekler

Însan ber e 'alem durext:

İnsan meyvedir, alem ağaç

Subuk: Hızlı





Tifik

Xalê Salo, rojek ji rojên zivistanê, ji sibehê heta êvarê li vî pîyê tifikê runişt. Roja din li wî pîyê din runişt. Ket xewn û xeyalan. Jixwera nihirand û got; **“Hey gidî dinya derewîn! Ez do li ku bum, ez îro li ku me?”**

Di wî demî da tifik dilê malan bun. Çawa ku dil nebe, Jiyana mirovan nabe, weha ku tifik neba Jiyana malan jî nedibu. Jixwe dema ku pîrekan nifir dikirin, digotin; **“Ucağê te kor be, tifika te sar be, duxan ji taqa te ne çe”** Yanî di malbata te da kesek ê sağ nemîne, her kes bimore. (Xweda biparêze)

Tifika rohnayî didan hindurê malan di şevên tarî da bi şewqa agirên xwe. Hem rohnayî didan qelban jî bi sohbetên ku tînê kirin li dor wan; ê olî, exlaqî û ‘ilmî û hem dersa Quran a pîroz. (Dilê wî şad, cihê wî cennet be) Rahmetî Hecî Bekir her êvar li malekî liber tifikêkî şîret ê dînî û ders û te’lîma Quran a pîroz û Jiyana li gorî Îslamê pêşberî gundîyan dikir; tevî ku qedexebu.

Hem tifikan hidurê malan germ jî dikirin, bi tîna agirê xwe û germa heskirin û xatir girtina dinav malîyan da.

Sal diwazdeh meh bikaranîn bi tifikê dihate kirin. Şorba sibehê li ser tifikê dikeliya, ava destnimêjê liser germ dibu. Nan liser tifikê dihate pahtin, şîr liser dikeliya. Navrojê hêk û dims liser tifikê diqeliya, êvaran girar û tîrşik dikeliya. Roj hebu kartol û binard (şêlim) dinav tirafa wîda dibirijî. Goşt û birinc liser tifikê dihate kelandin û mewlud liber dihate xwendin. Meta min a biçuk wê gavê ne zewicîbu, qizek li mala bavê xwebu hindur malê dimalte û gemara xwe di avête tifikê. Yanî tifik ji paqijîyêra jî alîkar bu.

Bikêr hatinek tifikê a din jî hebu; ku cîh li mirovekî teng bûba, minak leşker dor li xanî pêça ba rêya revê di pixêrî û taqê ra dida firaran. Ez dibêjim bikêr hatina herî giringtir ev bu. Min gelek caran bihîstîye ku firaran xwe bi vî hawayî xelas kirine.

Piştî me pez û dewar êm kirin, heywan tev bi cîh

kîrin, şîva şevê jî xwar, malbat tev li dora tifikê dicivîya. Ku mêvan nebana piştî ku ders xelas bun, bavpîrê min dest bi gotina çîrokan dikir. Her çîrok belkî se’etek, belki se’et û nîvek. Gelek caran serê me liser çoka wî, em bi xew ve diçûn, dawya çîroka wî me seh nedikir. Her şev bi hêvîya guhdarî kirina dawya buyerê, me çîroka berê dixwest, belê dîsa dawya buyerê ne dihate û em bi xew ve diçûn.

Hin şevan malbat xwe bixwe û gêmginbu. Çaven her yekî jî me li agir, û hişen me li ‘alema xeyalan di gerîyan. Kalê min bîra xortaniya xwe dikir. Cotkarî, palevan, şivan, zewêdi, gêre, şigre, pez, rez, nahtorî, mahsere, xwedî kirina malbata giran, du jin, deh diwazdeh zarok, tevî akrebe, mirov, dost û ehaban û hem mêvan û gêdanan. Xortaniya xwe û extîyarî ya xwe dida ber hev, şênaya dora xwe a berê û bi tenê mana îroj difikiri, (li ba wî bi dostayî îroj bi tenê maye tifik) û hêstran bê hemd di çavanra diavête der. Pîra min mala bavê xwe qîzaniya xwe, xeyalên xwe ê zaroktiyê hesretên ku di dila da mane û halê hazir dida ber hev û ew jî bi dizî digirîya. Dê û bavê min jî xeyal jibo pêşerojê dikirin. Hinek li xeyalên pêşerojê, hinek li hesretên paşerojê...

Ez jî îroj hesretan dikêşim. Hesreta serkeftina doza pîroz. Hesreta nesla îmanê. Hesreta Qasidê Xweda. Hesreta her du Huseyn û her du Selheddînan. û hesreta tifikê.

Tifik îro jî hene. Belê ji wanra tê gotin şomîne. Hem şomin û hem bê yomin. Bixwe mirîne duxan ji taq û pixêrî yên wan naçin. Ewê çawa bibin dilên malan û Jiyanê bidin wan?

Tifik çûye derê malê, telewîzyon hatîye hindur. Yar çûye der, neyar hatîye hindur. Ar ê dinyê çûye der, arê axretê hatîye hindur. Xweda, pêgirtîyê doza pîroz gişa biparêze ji arê axretê ku arduyê wî kevir û însanin. (Amîn)

Ma Bi Dunya Nêxapeyî

Dunya ma rê cayê îmtîhanêk a. Qey axîretî mezre'êk a... Dunya fanî ya, ebedî nîya. Hem dunya qey ehlê îmanî ğaye nîya, belkî qey xelasîyê axiretî sebebêk a...

Dunya, qey ehlê îmanî xanêk a. Însan zî rêvî yo, yeno ena xani de tay maneno. Misafirê ena xanî yo... Ba'dî îstîrehetiyê xo keweno rayîr û şino menzîlê xo. Yanî şino 'esil welatê xo, şino axîret...

Şîyayîşê xo de barê dunya nêgêno, belkî barê axîretî gêno we...

Xemlê dunya însanî ra weş û rind aseno. Lakîn je'rê ê, însanî mirêneno... Kam bi dunya bixapeyo, yo daîm vinî keno. Heskerdîşê dunya biko vernîyê heskerdîşê axîretî; însan pê şino helake. Bi eno heskerdîşî, însan Homay keno xo vîra û şino dalalet...

Dunya; hem Quran, hem zî vatişanê Peyxemberê ma (a.s.v.) de ameyo zemkerdîşî: "Ey Hebibê min vace: Meta'ê dunya tay çiko. Axîret, qey ehlê teqwa hina xeyrêno..." (Nîsa: 77)

"Kam ke nêwazo leqey ma bo, bi heyatê dunya razî bo, bi ena (dunya) kêfweş bo û ayetanê ma ra bêxeber bo... Qey inê, bedelê kesbê inê de meskenê agirî esto." (Yûnûs: 7-8)

"Her nefes te'mê (lezzetê) mergî vînenê. Rocê qîyametî de ecrê şima bê noxan ko bideyo şima. Kam, adir ra bêro durkerdîş û daxilê Cennetî bo, bê şek yo xelesiya wo. Heyatê dunya, meta'êk o ke însan pê xapêyeno." (Al-Îmran:185)

"Allah, kamî rî bivazo rizqo zêde dano, kamî rî zî biwazo rizqo tay dano. Ê, qey heyatê dunya kêfweş bî. Halbukî heyatê dunya, bedelê axîretî de meta'êke tay o." (Ra'd: 26)

"Wexta ke Homa, 'Ebdêke xo hesbikero, ê dunya ra mihafeze keno. Zey şima ra tenêk, nêweşê xo rî werdişê aw men' bikero." (Tîrmîzi)

"Sereyê her xeta, heskerdîşê dunya wo. Wexta ti çike zehf hes bikerê; eno heskerdîş, to keno kor û kerr." (Ebu Davûd)

"Dunya; zîndanê mu'mînî û cennetê kafîrî ya..." (Muslîm-Tîrmîzî)

Belê, temamê enê vatişan ra yeno fam kerdişî; gere ehlê îmanî, heyatê xo qey ena dunya yê fanî rê heder nêkerê. Lewra ena dunya tu wext warê ehlê îmanî nêbîya. Her însan wextê mergê xo de terkê ena dunya keno. Însanî ke mirenê, xo de mal û mulkê ena dunya nêbenê... Çend mitro kafen û 'emelê xo xo de benê...

Dunya; meydanê mucadeleyê îman û kufîrî yo. Eno

mucadele heta Rocê Qiyametî ko dewam bikero... Bi eno mucadele ehlê îmanî huzurê Homayî de qedr û qîymet gênî. Bi topkerdişê mal û peran merdim nêreseno meqamêke.

Hem gere ma merg nêkerê xo vîra. Xemlê dunya wa ma nêbero ğeflet. Dunya bi xeml û lehwiyatê xo zehf tenan xapêna wo û berdo helake. Ba'dî mergî çî ma rê lazîmo se gere ma tedarîkê ê bivînî. Zey ehlê dunya ma xo nêkerî fedayê dunya... Meraqê ma hina zehf qey axiretî bo... Eger bedelê axiretî de ma zewqê dunya dima bikewê, a gami ma benî esîrê şeytanî. Eno halet zî ma rê berê zelîlî ko akero...

Welhasil, gere ma hêşyar bê, bi dunya nêxapeyî. Merg û axîret daîm bîyarî vîrî xo... Hukm û nusretê Homayî biwazî... Mutî'ê emrê Allahî bî... Qey axîretî, ma dunyaya xo feda bikerî... Ena dunya zî bi 'edaletê Îslamî şa bikerî... Ma meydan, zalîman û fasiqan ra nêverdî...

Allah, ma hemine şerrê şeytanî û heskerdîşê dunya ra mihafeza bikero...





Ehlê Quran

zi Allah(c.c) ê sê fesat vejên yin ra hes nêkeno; o kufir ki sere raşni qefelno weşiyê Homa nişina. Ellah (c.c.), 'ebdi tena xo rî emir keno; bê xo ra ber tu kesî ra 'îbadet emir nêkeno. Semed viractiş reya emr Homayî di pê nîyazê: "Ma tena to rî (pê ita'at) 'ebdî kenî û tena to ra ardim wazenî." (Surreya Fatîha: Ayeta 5) zano ki nimaj yew mîraç, însan her had xo ra, pîsî ra, gunon ra durî tepêşen.

Ehlê Quran zano ki hendê imkan, quwet, zihmi xo emrê holî, menkerdişê xirabî yew farîza wa. Ê kafir û munafiq ki Ellah û pêxemberî rî herb kerd a yini di cîhad, gilê îbadet.

Ehlê Quran semed cay ardiş û însanan ra vatiş emir Ellah ser pê can, sarê xo; pê 'eşq û şevk xebityenî. Semed îxlâs 'emelanê xo ser Ellahî ra ardim vazenî. Duaya xo yi rî kenî. Çendek gune û xeta kerd, yin ser pê zon tobeyê, pê zer weşey hawelyen Yi.

Qurano Kerîm, o zon ki fam kenî, o aqil ki şik fînenî ci, o ruh ki pê bîn veş, a zera ki pê 'eşq xo ra şina vahy Homa yini rî pêşkeş keno. Ina ser Ehlê Quran berzî û rindeya Quranî fam kenî. A holî ki yena heskerdiş, qabul kerdiş; a vêşî ki raştî û reya dana fikrê însanî Quran eya emir keno. Ina emir kerdiş semed mumînan yew lutuf û hîkmetê Homa yo.

Herkes gore darax xo Quran fam keno, gore nasîb, fam kerdiş, aql û 'ilmê xo îdrak Quran ser xebatyeno. Quran di ayetê 'ûmumî, xususî, muhkem, mutesabîh, akerdeyî, qefelnayey estî. Ayetê 'umumî goreyê awam ra, xususî goreyê rêzanan ra. Bêşek Ellah(c.c.), her çî en hol zano. Homa ma mumîno sifrê hidayetî di gorey eşkerdiş yin nasîbê yin dano.

Wayîrê îmanî her zêr, vext sifrê Quran di runişt basîret yi beno a; ber dilê yi sirr wete 'alemê ma'na ra beno a; hîkmet ci ra mal vînbayîş ra vejen beno yew îkramo pîl. Mumîn ina ser, hinî pê ewnîyayîşê Homayî ewnîno 'alem ra, 'eslê viraştîş her çî, her yew viraştî ra. Ina îkram pê ino ayetan ci ra hewelyenî mana "xeyr ameyîş!" ser:

Hemd kerdinê ma bi tamam serê Ellah ra. Salât, pêxemberê ma ser. Selam, ser mumînan û ê kezerrê xo dayo Quran.

Na sohbetî, ma qaîlî ser Ehlê Quranî de virazî. Ê sey mektebê Îslamî di, kursiyê vahyî di dersê xo gênî. Pê nîmet hîdayet ser ê sey daîreyê Heq de heme pêro pîya Ehlê Quran. Resulullah (s.a.v), qalê xo mubarek di vano: **"Bîla şuphe mîyanê insanan de Ehlê Ellahî estî."** Eşhaban yi ra (s.a.v) pers kerd: "Ê kam î?" Pêxemberê Ellahî cevab da: **"Ehlê Ellah, xas 'ebdê Ellahê ki ê tena Ehlê Quran î."**

Ehlê Quran mumîn zano ki, Ellah (c.c.) Homa yo, viraştux o, wayîrê heme çî yo. Ellah (c.c.), pê hêzani û quwetê xo eşkeno heme çî bîyaro ca. Reyna yin yaqîn kerd ki 'ebdê Ellahî, wayîrê 'ecziyetî yo, yê heme zayıfî ser viraziyê, her daîm muhtacê Homayê xo yî. Semedê dunya û axîretî, dîne xo mukemmel wecinayo, projeyê ina bextiyarî Quranî di pê nurê ayetan xet kerd. Ina projê mojnana yin reya îsîqamet, pê helal û heram viraziyena. Bestinê Quran mumîn îman ano ina ser; Homa û Pêxemberî rî îtaat est o, îsyan çino.

Heskerdişê nimajî Ehlê Quran zano ki, wayêr ê ber-

“Yi, Quran heqê wendiş yi ra ser wanenî û iman Quran anî.” (Baqara: 121)

“Mumîn ê kesî ki wext sey ayetê Ellahî ameyî wendiş, imanê yin zêdiyeno; yi bê Rab xo ra ber paşte, zer hîraye xo nêdanê coy.” (Enfal: 2)

“Wextêk Ma yew qafileyê cin, semedê goşdariyê Quran to rî şirawit. Wext qafileyê cin ameyî cayê to (yewbînan ra va): ‘Qisey mekên, goşdarî bikên!’ ba’dê qediyayîşê wendişê Quran, her yew qawmê xo rî pêhesnayîş ser gêray a.” (Eh̄kaf:29)

“...ameyişê ser mumînan ra, ayetê (Homa’yî) îmanê yin keno zêde û yin resneno mijdanan.” (Tewbe: 124)

“ ‘Eceba o kes ki semedê axîretê xo (bêemrê Ellah ra) dūr tepîşeno û reh̄mê Rabbê xo wazeno; beno sey kesêko înkarkerdox? (Ya) Pêxember mi vaj: ‘Ê kes ki zanayox o beno sey nêzonayox?’ Heqîqet, tenya wayîr aqil ino pê heq fikir kenê.” (Zumer: 9)

“Ê (mumîn), benayti ters û hêvî Rabbê xo rê du’a û ‘ebdî kenî.” (Secde: 16)

Ina ayeti mojneno ma rî Ehlê Quran, binê çakon Pêxemberî di pê edep nişoyn ro dersê îman, îslam, îhsan, îxlas, ‘emelê salih̄ gênî. Ina manzarê mumînan sey yew tablo xo mojnena çiman. Çimî zî pê heskerdiş, heyret ina tablo nazar kenî.

Resulê Ellah (silam Ellah yi ser) tay hedisanê xo di beh̄sê Ehlê Quranî keno: “**Ehlê Quran, dostê Ellah o û yi miyan mileti di rêzan ‘ebd Ellah.**”

Îbn-î Mes’ud wina vat: “Şima ra yew semed durum xo va biwani Quran. Eger o kes Quran ra hes keno se, Ellah ra zî hes keno. Eger Quran ra hes nêkeno se Ellah ra zî hes nêkeno yeno zanayîş.”

Ebu Muhammed Sehl wina vat: “ ‘elametê îmanî, heskerdişê Ellahî yo. ‘Elametê heskerdişê Ellahî heskerdişê Quran o. ‘Elametê heskerdişê Quranî, heskerdişê Hz. Pêxemberî yo (silam Ellah yi ser). ‘Elametê heskerdişê Pêxemberî, tabî’ê yi wa. ‘Elametê tabî’ê yi gera malê dunya ra zerr nêdayîş ser şîyayîşo”

Ehlê Quran ra yew mumîn vat: “Rojêk zerra mi ra qayilî vendişê Quran zêdeya. Labelê beynati ra roj şî, mi Quran nêvend. Ba’dê ina ser o vengo nimitê mi ra wina va: ‘Eger ti mi ra hes kenî se, çi to kitabê mi terikna û ti yê mah̄zun verda yo? Ti zerrê (Quran) yi di ikaz kerdiş mi kîbariye nê vînênî?”

Mektebê îrfanî di yew ‘arif pê ‘îcazê zanayîş ser reya heqî di pê ‘eşq mil çoti ser vano: “Yew murîd hêto waştîş xo her çî Quranî di nêdî; kemî û zêdi Quran zere yi ra nêdî se; pê Homayê xo zerr weşî nêbi wo û zerrê xo ‘ebdon ra nêke se nêbeno heq yew murîd.”

Bizanê: Ehlê Quran rêzanê Ehlê Cennet î.

Goştarî bikên! Tutanê xo ino hîri çî ser terbiye bikê:

1- Wendişê Quran,

2- Hes kerdişê Hz. Muhammed (silam Ellah yi ser)

3- Hes kerdişê Ehlê Beyt.



Muhammed Seydan

Kêynaya Şenik û Xelasî

Pê nameyê Homay... Hemdo pîl ay Homay rî bo ki, Yi ma xelq kerd, ma musulman kerd û ma kerd ummetê Muhammedî ra... Selat û selam ay Pêxemberî rî bo ke, mîyanê mexluqatî di en (tewr) bi şeref û qatê Homay di en wayîrê qîymêt o yo... Uca ra pey selat û selam ki ay Pêxember, eşhaban yî û heta roca qîyamet ay ki yi teqîb kenî yîn ser di bibo...

Ez şima di yew meseleyêk qal keno, şima zî goş xo bidên ci. Spanya di yew hepîxanêk beno ki, uca di en giran cezaya şîyasî dîyena însanan. Pîyê yew kêynaya şeniki zî ena hepîxane di mehkum beno. Semedo ki pîyê xo zîyaret bika, her peynîya hefteyî de ena kêynaya şenik û maya xo şinê hepîxane.

Rocê ki reyna semedê zîyaretê pîyê xo, ena kêynaya şenik û maya xo şinê hepîxane. Ena kêynaya şenik semedê pîyê xo yew resim virazena û xo di bena hepîxane. Feqet hepîxane di eno hewa yew qaîdeyêk esto: Ay çîyo ki xelasnayîş ano vîrê însanî nêgênî zerre o nêdanî mehkuman, vanî yasax o. Semedo ki ay resim di milçikî estê, gârdîyan qebul nêkeno û gêno cadi ay resim parçe keno. Kêynaya şenik zaf xo teqnena û gereyê ay gârdîyanan pî xo di kena. Pîyê kêynaya şenik zî ti ra vano: “Çik nêbeno kêynaya mi, xo meteqni. Ti ko rêyna viraza. Feqet ena paş ay çîyo ki ti virazena dîqçet biki, tamam?”.

Kêynaya şenik yewna zîyareti di pîyê xo rî yew resim virazena û xo di bena. Ena paş herindêy milçikan di yew dar û ser di nuxtanê şîyayanê şenikan virazena. Pîyê ya ewnêno resim ra o keyfê yî yeno, ti ra perseno vano: “Hmmm!

Ena çend weş yew dar a. Enê nuxteyê şîyayanê şenikî ki ha serdê çinayê, fitqal ê?”. Kêynaya şenik xo çewt kena û goşê pîyê xo ra hêdî vana: “Hşşşş hêdî bi pîyê mi! Milçikî ha mîyanê dari di nimite yî û ay nuxteyî zî çimê milçikan ê”.

Eno semed ra ma vanî ki, çiray çew nişkeno mîyanê însanan ra fikrê xelasîyê veco. Çimkî eno fitratê însanan di esto. Homay însanan ena ça viraşto. Însan eno ya eşkerano ya zî nimitkî. Feqet fitratê însan xelasnayîş sif wazeno. Homa en heqîqî xelasnayîş nesîbê ma, şima û pêro musulmanan biko! Amîn... Emanê Homay bibê, Esselamû ‘aleykum we reh̄metullâhî we berekatûhû...



Kam O Huseyn?

*"Kam o Huseyn ke, 'alem ey rî diwane beno
No çî rojo ke, no gan ey rî perwane beno?" **

* * *

*Gulîstan de gul, sey reyhan sey sumbul o Huseyn
Gul rî yew bulbul, dermanê derd û kul o Huseyn*

*Îmamo namdar, warisê pêxember o Huseyn
'Egîdo kerrar, qey ummetî rehber o Huseyn*

*Vengo zanaye, lacê menba'ê 'ilm o Huseyn
Qelbo şiknaye, karê edeb û hîlm o Huseyn*

*Warê pank neseb, îsmetê Fatima yo Huseyn
Qêriya Zeyneb, feryadê wayka ma yo Huseyn*

*Şêrê meydan o, zalim rî Zulfiqar o Huseyn
Serey xo dano, Îslam de ma rî rar o Huseyn*

*'Esayê Mûsa, Fîr'ewnan rî ejder o Huseyn
Nefesê 'Îsa, mezlûman rî sîper o Huseyn*

*Zulumat de nûr, hemberê tağûtan o Huseyn
Mîsalê sebir, şiknayoxê pûtan o Huseyn*

*Çilay Qur'an o, tarî ra serbestî yo Huseyn
Sulh û eman o, xelasê bindestî yo Huseyn*

*Sêne de îman, her roj de 'Aşûra yo Huseyn
Hesretê çiman, her ca de Kerbela yo Huseyn*

10 Muharrem 1429

* "Kimdir Huseyn ki alem ona divane olup
Bu ne şemdir ki canlar ona pervane olup?"

(Cafer Bayar)

Bîlal Nêribij

و عاصي . فيدا براداي تي و شيطانتي ي ددنيای ده ژ انسانره پچکي هيه . انسان چقاس بهتر ببه شيطان خوه بهتر آزاد و بکيرهاتي دینه د بسبب کو معنا آزادي ژبير دکه خوه بهتر د سلامتې ده دینه ؛ حتا کو عذابي خودا نه بينه هشيار نابه . انسان بحيوانتي ژ واسطې تطميني لذت دستينه د بسبب کو بي شرفي ژخوره زرار ناحسينه ژهلاک بونا انسانيتا خوه زوق دستينه .

کسي کو معنا آزادي ژوحي هين نکه دحياتا شيطاني و حيواني ده د ناخا فسادي ده لدورا هف دچو تي . ژوي تري کو چقاس کاربه نفسا خوه تطمين بکه هوقاس سربسته د آزاده ، سرخويه و خلاص بوييه . ژوي تري اي کو زماني وي درواحي ديه او آزاده د اي کو سينوري ولاتي وي بلويه او بيتر آزاده د اي کو حلال و حرام ژيره نه درده و ظلمي دکه او بهتر بهتر آزاده . حال باو حال نيرينا بفي شکلي حياتي نيرينا قومونيزمي يه ، اکفري يه او بندستي و زليتي و رزليتي يه . چکو دولي عربي جورکي شاهنشاهيا روما و انگليزن . دناف روما و انگلزده ژي تمامي انسانا دو صنف بون : يا کوله بون يا ژي نه کوله بون ، ياني اصیل بون . پشني حربا عموميا ددوا کو دولي عربي بهف کتن فان ملتي دي - تفي ملتي اسلامي - سينور سرخوبونا خوي جغرافي آشکار کرن . دولي عربي ژبو کو ربا سرخوبونا حقيقي لقان دولان بگرن و بشکلکي نو وان ژخوره بکن کوله بناقي «حر يت» و «سرخوبون» و «مدنيتي» قومونيزمي لناف

وان بلاکرن و وان بي هش کرن . ايرو لکردستان بناقي «خلاصياگل» آزمانجا کو دخوانن بجي بينن : ببلاکرن قومونيزمي ارتدادا قومي کرده - نعوذ بالله - ژبو کو کردا بکن کوله . لورا اي کو عبدتي ژرب عالمي ره نکه مجبور ژکولداراره بکه . سبي تفلهقيا دنيا مي ايرو ژي دو تشتن : يک ؛ کولداري (امپريالست) کفنو نو نا خوانن کو ملتي دنياي آزاديا حقيقي ياني اسلامي فيم بکن . ددو ؛ رابونکه بقوته لهمبر کولدارا .

سرخوبون و آزادي ، ناسکرنا تشتي کو ژانسانيتا مه ره لازم . عبوديتا ژرب عالمي ره و هاييونا حلال و حرام هم ژبو ظمتکرنا و حشيتيامه يه هم ژي ژبو فم کرنامي حياتي يه لسر رو ارضي . اف ژي خوداي تعالي بوحي بيه دايه زانين . تشتي کو ام بوحي هين دکن خلاصيا مه تامين دکن . خلاصيامه افه کو ام خوه ناس بکن ، وظيفي خوه بجي بينن و حدي خوه زانين . ژوحي پيغه توري بيه ناده زانين کو کامي چاوا بين انسان و گرك ام چه بکن و گرك ام چه نکن . ژبر في قرآن و سنة علمي سرخوبوني يه ؛ اسلام ديني استقلال و فيم کرنا آزادي و خلاصي يه . لوما کو روزي پينج جارا تي گاڙي کرن : «حي على الصلاة حي على الفلاح» ورن لميرکن ورن خلاص بين .

تفي سلام و هيقييا دعای امانت خودا بن .

شارزا : آيدن ، منور

شاهنشاهي : امپرتوري ، قراليت

آزادی و سربستییه .

خُودِي مَه د خُودِي كَاءِنَاتِي يَه كُو اُو ژِي رَبِي
عَالِي يَه . مَزِنِي مَه ژِي فَخْرًا كَاءِنَاتِي رَسُولِي اَكْرَمَه
صَلَى اللّٰهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ . بِسَبَبِ كُو د «سَرخُوبُونِي» دَه
مَعْنَا اطَاعَتُ و بِيْعَتِي هِيَه اُو خَلَاصِي و رِحْتِي ژِي د
اطَاعَتُ و بِيْعَتِي دِيَه اُو چَاغ سَرخُوبُونُ و خَلَاصِيَامَه
ژِي د اطَاعَتَا رَبِي عَالِي و رَسُولِي وَي دِيَه .



سَرخُوبُونُ و آزادی نَاسِكِرْنَا تَشْتِي كُو
ژَانَسَانِيَتَا مَه رَه لَازِمَن . عُبُودِيَتَا ژَرَب
عَالِي رَه و هَآيِبُونَا لِحْلَالُ و حَرَامُ هَم ژَبُو
ظَمْتِكِرْنَا وَحَشِيَتِيَامَه يَه هَم ژِي ژَبُو فَم
كِرْنَامِي حِيَاتِي يَه لِسَر رُو اَرْضِي . اَف ژِي
خُودَايِ تَعَالِي بُوْحِي بِمَه دَايَه زَانِين .

«كَسِي كُو اطَاعَا خُودِي و رَسُولِي وَي بَكَه اُو دِكْهِيژَه
خَلَاصِيَكُ مَزِن (مُرَادَا خُوَه و رِظَا آخُودِي)» - احز
اب : ۷۱ -

آيْت و حَدِيثِي كُو دَلَالَتِي سَرَفِي خَلَاصِي
دِكْنُ گَلِكْن . دَه اِيژَا اُو تَشْتِي كُو رَبِي عَالِي ژَبُونَا
سَرخُوبُونُ و خَلَاصِي بَانَسَانُ دَايَه نَاسُ كِرْنُ اِي
كُو ژَبِيرِبَكَه و لَبَر رَاَبَه وَي بَبَه بَرَادَايِ و شَيْطَانُ

كُو تَرْجَمَه كِرْنَه گُوتَنَه ”حُرِيَت“ . دِنَافُ كُرْدَادَه
ژِي دَعَصْرًا پَآشِي دَه گُوتِنَا ”آزادي“ ي بُوِيَه تَرْجَمَا
گُوتِنَا حُرِيَتُ و فَا ن گُوتِنِي آوُرُوپَايَايَه . ژَبَرَفِي
يَكِي ژُگُوتِنَا ”آزادي“ و ”حُرِيَت“ رَه مَعْنَكِي
سِيَاسِي و فُلْسَفِي هِيَه . بَاعْتِبَارَفِي مَعْنَايِ ژِي گُوتِنَا
آزادي لِهَمْبَر فِكْرُ و فَهْمُ و فِرَاسْتَا اِسْلَامِي يَه .
دَاصلَدَه ”آزاد“ بَمَعْنَا

عَفُو كِرْنَه . گُوتِي گُوتِنُ ”خُودَاتَه آزادَكَه“ مَعْنَا وَي
يَانِي ، خُودَا تَه عَفُو بَكَه . گُوتِنَا ”سَرَبَسْت“ ژِي ،
يَكْبُوي ژ ”سَر“ و ”بَسْتَه“ . بَسْت بَمَعْنَا گَرِيْدَانَه .
”سَرَبَسْت“ ، اِي كُو سَرِي وَي هَاتِيَه گَرِيْدَانُ .
حَيَوَانَا كُو سَرِي خُوَه ژِين نِير دَرخَه ژِيرَه نَاي گُوتِنُ
سَرَبَسْت ، تِي گُوتِنُ بَرَادَايِ . اِنْسَانِي كُو ژُگُوتِنَا
خُودِيُو مَزِنِي خُوَه دَرَكْفَه سَطُوِي خُوَه ژِنِيرِي تِفَا
قِي دَرْدَخَه ، ژَفِي كَسِيرَه اِيْدِي نَاي گُوتِنُ سَرَبَسْت
، بَلَكِي تِي گُوتِنُ ”بَرَادَايِ ، اَشْقِيَا ، عَاصِي“ ،
ژ اِمْكَانُ و نِعْمَتِي تِفَاقِي مَحْرُومُ دَبَه . اَف اِنْسَانُ
پَشْتِي كُو زِفْرِي بِيَالُ مَزِنِي خُوَفَه اُو خُوَه تَسْلِيمِي
قَيْدُ و شَرْطَا كَر ، كُو مَزِنِي وَي ژِي وَي قَبُولُ كِرْنُ
وي عَفُو دِكْنُ ؛ يَانِي وَي آزاد دِكْنُ اُو اُو ژِي اِيْدِي
دَبَه سَرَبَسْت ، ژِنِعْمَتِي تِفَاقِي وَي يَكِيْتِي اِسْتِفَادَه
دِكَه . اُو چَاغ د ”آزادي“ و ”سَرَبَسْتِي“ دَه مَعْنَا
اطَاعَتُ و بِيْعَتِي هِيَه . خَلَاصِي ژِي د اطَاعَتِي دِيَه .
يَانِي خَلَاصِي و رِحْتِي نَه د بَرَادَايَتِي دِيَه ، دِاطَاعَتُ
و تَسْلِمُوبُونِي دِيَه . ژَبَرَفِي يَكِي ، آزادي كُو بَمَعْنَا
عَفُو كِرْنَه اُو سَرَبَسْتِي كُو بَمَعْنَا كِتْنَا بِن اَمْرَه ، اَف
هَرْدُو كَلِمَه مَعْنَا ”سَرخُوبُون“ نَه . سَرخُوبُونُ ؛

عَبْدُ الصَّمَدِ حَلْمِي

سَرخُوبُونُ وَ آزادی

من يطع الله ورسوله فقد فاز فوزاً عظيماً (احزاب: ۲۳)

«كسى كُو اطاعا خودى ورسولى وى بگه او دگهيژه
مُرادا خواه وپارگه پُر ژرطا خودى تعالى»

بريا هر تشتى ام باش دزانن كو اسلام زانبون و فيم
كونا آزادي يه. لي بلي ام دنرن وان كسى كو
«آزادى» و «سرخوبون» و «سربستى» لزمانى خواه
لفانده زهيا غربيا و زهيا وان كسى كو غرين
ژفكرو حياتا اسلامى ره. دگل فى اف سوال زي تي
بر زهنا مرف: گلو عبوديتا ژرب عالمى ره او زياناداء
را شرعى ده و هاييونا لجال و حرام دبه مانعى آزادي
وسربستى يان نا؟ دقى كوام دقى مسلى ده زيده
ترو باساسى بفيرن:

خصوصاً كسى كودوري اسلامى نه گوتنا «آزادى»
لزمانى خودلفين. چكود عصرا نوزداده (۱۹)
شارزاي تركا، كو پرى وان بحيرانا اوروپابون،
گوتنا freedom يان زي liberty او انگليزي كو ديژن

liberté فرانسيا كو ديژن

Bihar | 2010

مِرْن نَه زَوَال

ژَبُو وَي چُونِينَه جِهَات و مَكَان نَه مَانْدُ و مِثْلُ
و نَه هَمَتَا نِيشَان

لَوِيرَا نَه بُورِينَه وَقْت و زَمَان نَه سَال و نَه مَاه و
نَه حِين و نَه آن

أَبْد دِي هَبِيْتِنِ اَزَل هَر هَبِيَه دِدُنِيَا وُ عَقْبَا خُدَايِي
مَه يَه

أَوِي آفْرَانْدِنِ اَم و جُمْلَه خَلْق نَهْن غَيْرِي وَي قَطْ
چُو خَالِقِ بَحَقْ

يَانِي خُدَا يَكَه هَقَالِينِ وَي نِينِ، ژِ خُدَاتِي نَاكْفَه
عَزَل نَابَه، مِرْن ژِيرَه تُنَه (كِيمَاسِي لِي پِيدَا نَابِن). ژِيرَه
أَلِيَان (كِيلِك) أَوْ جِه نِينِ، ژِيرَه أَمَثَالُ و هَمَكُوفُ
و نِيشَان نِينِ. دَسَر وَي دَه زَمَان؛ نَه سَال، نَه مَه
(هَيْفُ)، نَه كَافُ و نَه سَانِيَه دَرَبَاسُ نَبُونَه وُ دَرَبَاسُ
نَابِن. ژَبَرِي فَه هَبِيَه وُ وَي هَر هَبَه. هَم دِدُنِيَايِي دَه هَم
دَاخَرْتِي دَه خُدَايِي مَه يَه. مَه وُ تَمَامِي مَخْلُوقَانِ وَي
آفْرَانْدِيَه (چِي كَرِيَه). بَعِيَرِ ژَوِي تُو خَالِقِي حَق نِينِ.

شِيخُ عَبْدُ الرَّحْمَنِ آخْتِي لَأَوِي شِيخُ حَسَنِ نُورَانِي
ژِي – خُدَا مَقَامِي وَأَنْ عَالِي بَكَه – دِ ”رَوْضَةُ النَّعِيمَا“
خَوَه دَه وُهَا كُوتِيَه:

”بَا زَمَانِ دِدْمُ شَاهِدِي دِلْ تَبَا كُومَعْبُودِي بِلْحَقْ
نَهْنِ جُزْ خُدَا“

”مَنْزَه ژَنْقَشُ و نُقُوشِي خُدَا مُبَرَّآ ژِ عَيْبُ و
قُصُورِي خُدَا“

يَانِي اَز بَزَمَانِي خَوَه شَاهِدِي دِدْمُ تَقِي كُو دِلِي مِّنْ
ژِي بَاوَرِ دِكَه كُو بَعِيَرِي ژِ خُدَا كَسَكِي بَحَقِي عِبَادَتْ

ژِيرَه بِيْتَه كِرْنُ تُنَه. خُدَا عَزَّ وَجَلَّ ژِ نَقْشُ و نِيشَانَا
مَنْزَهَه، شَكْلُ و شَمَالِينِ خُدَا عَزَّ وَجَلَّ تَنْ. هَم خُدَا
عَزَّ وَجَلَّ ژِ عَيْبُ و قُصُورَانِ ژِي پَاكُ و بِيرِي يَه.

سَيِّدَا مَلَا أَحْمَدُ حِلْمِيي قُوغِي ژِي – خُدَا رَحْمَا
خَوَه لِيكَه – دِ عَقِيدَا خَوَه دَه وُهَا دَبِيْزَه: ”خُدَا أَوْ ذَاتِي

پَاكِي بِي مِثْلَه. يَانِي پَاقِزِي ژِهْمِي عَيْبُ و نُقُصَانِيَانَه
وُ كَسِي وَكُ وَي تُنَه. تَمَامِي خَوْبِي عَقْلَانُ و زَانَايِنُ

مَاهِرُ دِحَقِيقَتَا ذَاتِي وَيْدَه حَيْرِينَه. نَأْفِي وَي آلله، خَالِقُ
و حَاكِمِي هَمِي مَخْلُوقَايَه، تَفُّ مُحْتَاجِي وَيْنَه أَوْ نَه

مُحْتَاجِي كَسِي يَه، فَاعَلِكِي مُخْتَارَه، چَه بَكَه بَكِيْفَا
خَوَه يَه، جِه و مَكَانُ ژِيرَه تُنَه، لِهَرُ دَرِي حَازِرَه. ژِرُوحِي

مَه نِيْزِيكْتِرِي مَه يَه. تَمَامِي صِفَاتِيْنِ كَمَالِيي تِيْدَه هَنَه
بَاوَرِيَا بَخُدَا چَوَا كُو سَبَبِي أَوْلَه ژَبُو خَلَاصِيَا اِنْسَانُ

دِرُورَا آخَرْتِي دَه وُهَا رَنْگَه سَرَكَانِيَا حُزُورُ و سَعَادَتَا
اِنْسَانَه دِدُنِيَايِي دَه. لَوَرَا خُدَا اِنْسَانُ لِكُورُ بَاوَرِيَا

تَوْحِيدِي خُلُقَانْدِيَه. دَمَا كُو دِلْ بَاوَرِي بِيْنَه وَظِيْفَاخَوَه
پِيكُ تِيْنَه وُ فَالَايِي تِيْدَه نَامِيْنَه. بَلِي كُو بَاوَرِي نِيْنَه ژَبَرُ

كُو جِهِي بَاوَرِيي فَالَا دِمِيْنَه دِخَوَازَه كُو وَي فَالَايِي
بِتَشْتَكِي تَزَه بَكَه. بَلِي هَيْهَات! تَشْتَكُ جِهِي بَاوَرِيي

نَاكْرَه. وَي دَمِي وَكَه وَسَائِطَا كُو ژِ مَجْرَايِي خَوَه ژِيرِيَا
خَوَه دَرَكْفَه رَاسْتُ و چَپْ لِبْنُ كُوْهِي تَشْتَنَا دِكْفَه حَتَا

كُو دَبَه سَبَبِي هَلَاكَا خُوْدِيي خَوَه.

أُسْتَاذُ بَدِيْعِ الزَّمَانِ رَحْمَةُ اللَّهِ عَلَيْهِ وُهَا دَبِيْزَه:
”كَسِي كُو خُدَا دِيْتَبَه وُ نَاسِكِرِيَه وَي هَر تَشْتُ بَدَسْتُ

خِسْتِيَه. بَلِي كَسِي كُو خُدَا نَدِيْتَبَه وُ نَاسِنَكِرِيَه وَي
تَشْتَكُ نَدِيْتِيَه، دَسْتَفَالَايَه. دِيْتَبَه ژِي بَلَا دِيْتِيَه.“

بَاوَرِيَا بِخُدا

عَبْدُ الْقُدُّوسِ حَلَمِي دِيَارِ بَكْرِي

وَصَفِينْ كَامِلْ، بِيرِي كِرِنَا وَي يَه زِهَمِي وَصَفِينْ
كِيمَاسِي، بَاوَرِيَا حَقِّي عِبَادَتِي يَه زَوِي بَتْنِي رَه، أُو
رِحْتِيَا دِلَه بِي بَاوَرِيَا بِي رِحْتِيَه كَه كُو أَثْرِينْ وَي دِ
ثِيَانَا اِنْسَانَدَه خُوِيَا دِبْنْ.

بَاوَرِيَا بِخُدا، بَاوَرِيَا بِيكُبُونَا خُدا وَ مُسْتَحَقُبُونَا
وِي بَتْنِي زِ بُو عِبَادَتِينْ هَمِي مَخْلُوقَانْ زِي
دِضْمِنِي خَوَه دَه (دِهْنَدِرِي خَوَه دَه) دِگَرَه.
يَانِي زِ بَاوَرِيَا بِخُدا تَعَالَى يَه بَاوَرِيَا بِيكِيْتِيَا وَي
وُ يَكِيْتِيَا الْوَهِيْتَا وَي وَ نَافْ وَ صَفْتِينْ وَي أُو
بَابْتِيَا وَي زَبُو طَاعَتِي هَمِي مَخْلُوقَانْ.

دِهْبُونَا خُدا تَعَالَى دَه تُو شَكُّ وَ شُبَهَه تَنْ. لَوْرَا
شَرِيْعَتْ، عَقْلْ، حِسْ وَ فِطْرَتَا اِنْسَانْ تَفْ دَلَالْتِي سَرْ
هَبُونَا خُدا تَعَالَى دِكْنْ.

زِ بَرْفِي يَكِي اَمْ مُؤْمِنْ بَاوَرِيَا وَهَا دِيِيژْنْ:

”خُدا هِيَه، يَكَه، بَتْنِي يَه، هَقَالْ وَ شَرِيكِينْ وَي
نِيْنَنْ، اَلِيكَارِبْنْ وَي نِيْنَنْ، نَه مُحْتَاجِي كَسِي يَه، هَزْ
كَسْ مُحْتَاجِي وَيَه. چَوَا كُو شَيْخْ اَحْمَدِي خَانِي
رَحْمَةُ اللّٰهِ عَلَيْهِ دِ عَقِيدَا خَوَه دَه دِيِيژَه:

خُدا يِيكَه بِي هَقْرِي وَي بِي هَقَالْ نَه مَعْرُولِيَه نَه



بَاوَرِيَا بِخُدا جَلَّ جَلَالُهُ اَسَاسْ وَ دَنْدِكا عَقِيدَا
اِسْلَامِي يَه. مَسْئَلِينْ عَقِيدِي بِي دِنِي تَفْ لِسَرْ بَاوَرِيَا
بِخُدا آقا دِبْنْ زِي شَاغْ بَرْدِدَنْ. بَاوَرِيَا بِخُدا تَصْدِيْقَا
قَطْعِي يَه بَهْبُونَا خُدا تَعَالَى، وَصِفْدَانَا وَي يَه بَهْمِي

Zaroka

bexçê

Çîroka Rovî û Gûr

Kesê mumin;
hez dike û rê
hezkirin. ku
hezneke û neyê
hezkirin xêr tê
de tune.
(Hz. Muhammed)

Salixdar salix didin, dibêjin rojek ji rojan salek ji salan, lê kes nizanî çî dewr û çî zeman... Gerdûn digere şev diqede roj vedigere ji roj helat. Çîya dikele berf dihele xalê rovî rasfî apê gur tê. Dibê:

-Selamun 'eleykum, merheba apê gur! Ka were em bibin heval û hogir.

Herdû dibin hogir çend roj û şev. Digerin li çol û çîya ji bo nêçîrê didin pey hev. Mixabin nêçîr xwiya nabit, zikbirçîne av dikşê ji dev. Virde diçin wê de diçin bi bez û rev. Rovî dibine wa li rasta girover perçekî goştê sor û zer. Zahir bê xwedî xwiyane lê qefek girêdane li ber. Zoq dibe lê çav, zik dikele dibê: ax çîye ev?

Hiş lê digere birafîye ji bir dike dibê:

-Apê gur.

-Ha rovî bira!

Rovî dibê:

-Tiriyê Hemedanî, qarpuzê Xorasanî çî xweşin. Lê ji wan xweşiktir, li vî milê grover perçekî goştê sor û zer heye. Tam layiqê devê te ye.

Gur dibê:

-Em hogir û birane. Ez dora xwe didim birayê xwe.

Rovî dibê:

-Xwedê ji te razî be bira, lê çî heyfe li gor 'adetê rovîyan em îro bi rojîne.

Gurê ji dek û dolaban bê xeber, lo dora dimê goşt dike fetl û ger. Yek, dido, sisê... Erişî goşt dike. Pê re dibe tep û repa wî. Gur dikeve qefê. Goşt dipeke nêk rovî. Rovî goşt didit ber geza. Gur dibê:

-Malmîrat! Ma tu ne bi rojîbû.

Rovî Dibê:

-Ez şaş nebim îro li me 'îd e.

Rovî di filite goştê xwe dixwe. Diranê gur di qefê de şikesfîne. Gur zariya ji rovî dike dibê:

-Ji xwe ez dimrim bi xêra xwe li diranê min binê re. Eger tu karî vê qefê li min veke.

Rovî dibê:

-Ne ez û ne jî bavê min em yek jî dirankêş nînin. Hem ez rovîme tu gurî de bi xatirê te. Rovî dide lotika diçe. Paşê jî nêçîrvan tên û gur dikujin. (Cevdet Karaman)

Çîrok: Hîkaye

Gerdûn: Dinya

Qef: Lapik, ango bi tirkî tuzak

Zoq: Vekirina çavan bi diqet



Du'a Dayikê

Rojekî Hz. Musa ('aleyhisselam) di'a dike û dibê: "Ya Rebbî! Cîranê minî li cennetê kîne? Ez hinka ji wan dixwazim nasbikim." Xweda ê Te'ala jî cewabê didîyê û jêr dibê: "Cîranekî teyî cennetê, li filan bajarî qesabiyê dikê. Tu bixwazî her wî bibîn."

Li ser vê Hz. Musa ('aleyhisselam) bi rê ket. Dema gihîşte wî bajarî çû cem wî qesabî, silav lê kir û jêr got: "Ez dixwazim îşev bibime mêvanê te, ma ti qe-bul dike?" Qesap got: "Ser serê min. Ji mêvanê Xweda re derîyê min her dem vekirîye."

varî bi hev re girtin û çûne mal. Derbasî hundir bûn, runiştin. Piştî wextekî qesap destur ji Hz. Musa ('aleyhisselam) xwest û got: "Heger ti desturê bi dê, ez dixwazim mêvaneka minî pir bi rûmet heye pêşî ez wê bi 'azimênim, piştî ezê te jî 'azimênim."

Rabu ser xwe û çû cem deydikekê ku di quncikeke mezê de hatibu çêkirin. Ji dêydikê pîrek derxist, binê wê paqij kir. Çilê wê guhert, xwarina wê dayê û zikê wê têr kir. Piştî wê cardin danî ciyê wê. Gava wê danî ciyê wê pîrê dibê xwe da tiştin minminand. Zilam jî li ser vê go: "Amîn."

Zilam îşê xwe xilaskir û vegeşîya cem mêvanê xwe Hz. Musa. ('aleyhisselam) Hz. Musa, pir 'acêbmayî mabû û gelekî meraq kirbû ku ev pîrek kîye û vî zilamî çima hewqas qedr û qiymet dabûyê, xizmet pir xweşik jêr kir bû. Hz. Musa 'aleyhisselam, ji zilam pirsî: "Ev kî bû ku te hewqas bi rûmet xizmet jêr kir." Zilam got: "Ew dayka min e. Wextekî, wê jî pir xizmet ji minre kirbû. Îro jî ez jêre xizmetê dikim." Hz. Musa: "Piştî te karê xwe xilas kir, pîrê tiştin gotin. Ew çibûn?"

Zilam: "Tiştê nebê dibêje. Tim û daîm piştî ez xizmeta wê diqedînim, ew jî dibê: "Xweda te li cennetê bike cîranê Hz. Musa." Ev tiştêkî ku nebê ye. Ez li kû, Hz. Musa 'aleyhisselam li kû. Ew dibê e jî dibê amîn."

Tiştê dîrî û bihîstî pir tesîr li Hz. Musa 'aleyhisselam kir. Ji zilam re got: "Mizgîn li te! Ez Musa me. Xweda xeber da min ku tu li cennetê cîranê minî."

Belê çîroka me li vir xilas bû.

Gelî zarokê hêja! Dê pir bi rumetin. Dilê daykê xwe nehêlin. Bîya wan bikin. Li deh-ma wan 'arsizîya nekin ku hun jî li cennetê bibne cîranê pêxembera.

Ji bo exlaqê
xweş temam
bikim, ez
hatime şandin.
(Hz. Muhammed)

Îman

Em zarokê musulmanin
Ne pêy şopa kâfiranin
Şeş şertê îmanê zanin
Me bi wan bawerî anîn

Xweda Rebbê me teva ye
Tevî rebbê 'alema ye
Îlahê Rezzaq, Rehîm e
Hem Xalik û hem Kerîm e

Em zanin ku melek hene
Belê ew ne ber çavane
Mezinê wan Cebrail e
Îsrafil, Mikail û Ezraîl e

Ji bo silh û 'edaletê
Bibîne cîhan se'adetê
Hatine j-mer pêxember
Hem suhuf û kitabê ekber

Vê dinyê şuxulê me çi be
Roja dîn hemî ber çavê me be
Belê heye roja dîn, axîret e
Ew roja hesabê îns û cîn

Em bawerîn ku qeder heq e
Xweda her 'emelê dîyar kirye
Û hem 'emelê qencî û ne qencî
Destê Xweda ê 'alema de ye...

'Eliyê Bazîdî

Deve û Ker

Fexreddîn Şemrexî

Deve çû ba kerê
Bun heval ser bênderê

Paşî herdu girêdan
Bar danîn ser pişta wan

Jihevre gotin derdê xwe
Revîyabun j-xwedyê xwe

Di rê de ker betilî
Tevî bar ew meğelî

Çîya û newal fitilîn
Bi meşê pir betilîn

Ker tevî bar rakirin
Ser pişta kerê kirin

Gihaştin ciyek zozanî
Tev zêrçin û şênkanî

Deve jî pir qehirî
B-hevalê xwe de qêrî

Ji şênkayî têr xwarin
Ava çema vexwarin

Jêre gote ey heval
Lotkan bidim l-vî newal

Piştî ew kêf û tirat
Zirrîna wî kerê hat

Kerê got min kir tu nek
Mi-l te kiribu henek

Ji devêre got: Heval!
Bizirim li vî newal?

Lê deve tu heq neda
Bi wê qehrê lotik da

Devê got: Eman zeman
Lê jêre nebu derman

Wê demê ker ketibu
Mejyê wî derketibu

Ker neseknî zirîya
Dengê wî jî torîya

Evêna zikir kirin
J-bo meriv bifikirin

Derbas dibu yek karwan
Dengê kerê çubu wan

Wexta meriv tiştêk kir
Divê meriv bifikir



Çivanok-Zûgotinok (Tekerlemeler)

Ferhad Bagasî

Rez û rez,
Rezvan û rez,
Heskîf û Tor,
Gundê li dor,
Hemî bi gor,
Heke ne bes,
Dîsa ez.

Libê libê liba tirî
Tirî gindirî di marê reş
Di gulê geş
"Mîr Xatun" e
Ez û te xweş

Sîr kutik sîyan kutik
Devê bavê gur kutik
Gurê bi çavekî
Daye pey min bi darekî
Ji bonî xatrê nanekî

"Xalê
Quto" bi
lingekî
Xwe danî ser êzingekî
Xwezîya şerrik daketa
"Xale Quto" binavketa
Kevrê pêşî li qahf keta

Ferhengok

Heskîf: Navê qezayêke Barmanê ye

Tor: Gundê torê, navê gundekî ye

Hemî bi gor: Têv bibne qurban

Zîwan: Giyayê şerîb, giyayê kovî

Kutik: Perçiqandin

Kutik(2): Lêdan, lêxistin

Yeku yek
teyrikê belek
Zaza bilbil
dermanê dil
Şekir û şema li ber çema
Çem çikçikî av tê nema
Ew zîwana li nav genima
Ew fîncana li dest
hakima

XAÇEPIRS

Jinekî Şertekî Îslamê	▼	Heyanek Perçê sal	▼	Heyat
◀		▼		▼
Sirekî Jimarek	▶			
◀			Notekî Deng	
Herfek	▶	Dayek (Cihê Lehi)	▶	
Zazakî Bawerî (Îman)	▶			

Jinekî : Kadınsı

Şertekî Îslamê : İslamın Bir Şartı

Jimarek : Bir Sayı

Herfek : Bir Harf

Perçê Sal : Yılın Parçası

Heyanek : Bir Hayvan

(Cihê Lehi) : Farklı Bir Lehçede

Notekî Deng : Bir Ses Notası

Sirekî : Sırayla

Muhammed ji me ra şand

Ew xwedyê mustaz'ef û feqîran
Ew Muhammed ê emîn û pir bi şan
Ew rebbê 'alemê Xweda ê mey xweşik
Muhammed ê delal şîrîn ji me ra şand

Bi sağî zarwê qîzîk dikuştin
Dayken delal bi huzn û kula dihiştin
Wexta rindî li ru erdê nehiştin
Xwedê Hebib ê delal ji me ra şand

Bi puta dîne derewîn çêkirin
Bi zulm û zorê ji xwe re kole çêkirin
Wexta ku beyreça kufrê hilkirin
Xwedê resulê delal ji me ra şand

Bixwîn e Hebib ê delal bixwîn e
Bi ayetan koka zulmê derxîn e
Emê di vê rê da hevalê te bin
Zafera Îslamê 'eynel yeqîn e

Mustafa Yeğîn (Dilok/Antep)



Dinyaye ne tu war e

Dinya ye derewîn e
Hezar salî 'emir bikî
Ji bil axin û nalinê
Tu sermaye pêde nakî

Ax lo dilo ma ne bes e
De wer gelek meylê nediyê

Dinya ye, ne ya ku yek piştê
bidyê

Tev qal û qîl û xir û cir e
Divê meriv pir şîyar bê
Dilê xwe qet pê xweş neke
Lewra dawîya 'emir
Qebra reş e
Dem dereng e 'esra teng e

Ax lo dilo ma nebese
Wer şîyar be ji wê xewê

Hey hozano tu bes bêje
Mu-b zimanê te ve nema
Tu pir dibêjî û bi cih nakî
Gazindarî bi vî rengî
Te nagihêne tu mirazê

Molla Hesen

Darê

Darê bi navça Mêrdîn ve
gîrêdayî ye. Gava ku hun
herin Darê, hun ê bibînin
ku bajarekî dîrokî di bin
enqazekê de maye. Û
hun ê şopa medeniyetek
mezin bibînin. Hun ê
qêrîna bibihîzin: qêrîna
dîrokê... Qêrîna erd ê...
Û hun ê li dengê bihîsin Û
hun ê bibînin surên ku ke-
vir jê diweşin...

Birkên avê, zîndana
bertewîl, surên ku li der-
dora wê peçayî, miz-
geft û mezelen wê bi
stuxarî bi hesirên çava li
we dinehêrî û bang li we
dike: **"Li min xwedî der-
kevin."**

Darê bajarekî Pers a
ye. Di pelên dîrokê de
dibêjin ji terefê "Dara
Yunaşîn" di biraka çîyê
de hatiye avakirin. Îro di
rewşa gundekî de ye. Ji
Mêrdîn 30 km dûr e. Piştî
xwe dayî çîyê. Peşîya wê
berîya Mezopotamya. Bi
salan berîya Mezopotam-
ya av daye, bi neh birken
xwe. Qanal ava kirine û ji
qanala av resrast î birkan
kirine. Ji birkan serrastî
berîyê kîrîne ji bo
erdan


av bidin.

Herba "Qiral Darîus" û
"Îskender" dîtiye. Û cih
stendîye. Û bi reva Darîus
girîyaye. Piştî şer, ji artêşa
Îskender re buye cih.

Hawîrdora Darê mezel
e. Medeniyetê ku li Darê
hukum kirine mezelê teva
li Darê heye. Bi hev re
herb kirine, hevdu kuştî-
ne û li kêleka hev bin erd
bune.

Bajarekî Persî Darê, ji
Mîtanîya re buye mal,
Eyyubî hatine, Roma de-
mek dîrej lê xwedî der-
ketiye. Lê kî hatibe jî,
li Darê şibaka rojê tim
vekirîye. Di sedsala 7an
de leşkerên musulmanê
'Ereb hatine, di a 15an
de dewleta Osmanî, îro jî
cumhuriyeta Tirkî...

Ji surên Darê kevir dîke-
vin. Darê bi qêrîn û ha-
war e. Darê di bin enqazê
de ye. Di zeman û me-
kan de Darê bang dike:
**Ez dîrok im, li min xwedî
derkevin...**(Mahmud B.)



Ji Xwendevana

Kîme Ez û Kîye Tu?

Rojek ji roja, kulmek axa reş bun ez û te
Li ber berf û barana, fatîs û babîsoka
Carna-l serê çiya bun, di nav lat û kevota
Carna-l binê behra bun, nav masî û beqbeqoka

Tijî bun ruwê 'erdê j-gur û şêr û pilinga
Heta bi mişk û mara, kew û kevok û qulinga
Ev çiyayê çikandî d-zikê 'erdê de wek sînga
Bubun mekanê tupîşk û mar û gumgumoka

Geh weqweq a roviya, geh pitepit a kunda
Li cihê van bajara, li mekanê van gunda
Qêrîna bilbil û kew, tev teyrê dengbilinda
Ku ro diçû ava, dibu sirsir a sirsiroka

Tev heyat kamil bubu, illa mabu yek qelem
Nebu gemxwarê kesî, şîrîk ê êş û elem
Nebu aqil û fikir, tarîxa re kir kerem
Û xuliqand xelife, pêşivanê seroka

Navê wî danî Adem, bavê min û tey pêşî
Emir da Ademî got, wezîfa te pêşkeşî
Zê 'alemê lê teng kim, ji bo secde nemeşî
Cin û melek tev çûne secde çûne ser çoka

Hingî fahmbu ev 'alem j-bo çi hat xuliqandin
Şu'ur kete dunyayê, fikir hate şuglandin
Qenc û xerab hat zanîn, çerx hate zivirandin
Me'ne-j 'alemêr çêbu, çû çagê pîr'eboka

Ûlle İblîs le'in, neçû secde tekebbur kir
Go çawa ew ji kulmek ax ez ji perengê agir
Heger zemanê min hebî, heta zemanê axir
Zê teva ji rê derxim, bikim wek qilaboka

Destûr da rebbê 'alî şîst kir hefsarê le'in
Go hurrî tu bê minnet wezna qama xwe bibîn
Kî ku biya te bike eger îns û eger Cîn
Zê la'netê lê bînim bavêmin bin barê toqa

Bîlal (Şehîd İbrahîm Xoca)

Pîştî van çav û gava, dest û pê û zimana
Min xistî xizmeta wî, temam 'erd û 'ezmana
Hê ji biya min neke, bide pey we şeytana
Zê bavêmin nav perenga agir ê-b şewatoka

Ha ewî tu bira, tu eşrefê 'alema
Tu xelifê xwedayî, Ademekî ji Adema
Wezîfa te tu paqîjkî, ji dunyayê senema
Biqelîne şeytana, tu wan bine ser çoka

Pîştî evqa şerefa, ku da min û te Xweda
Em jê gerin bidin pey, dîvê pût û tağuta
Nebin 'evdê Xweda em, bibin torê baruta
Wê dil bigrin min û te, heta bi de û zaroka

Hema bira tu bifikir, ev çi hale tu têda
Gotin û xwe bifikir, kulmek ax e goştê te
Ha kulmek ax ha heftê kilo ziblê seyê te
Eslê min û te ev e, ne xewn e ne çiroka

Çima tu ne 'evdê Xweda, îro lê 'evdê Lenîn
Te destê resul berda, da dîv milletê çav şîn
Qey dixwazê bibê wey, diqtatorê Stalin
Yan Hitler û Mussolin, Marks Engels Kemaloka

Bîlal! Ev e ji bo te yan xelef û yan kelef
Yan hukmê xaliq bixwaz, şeytan bera bikeve sef
Hingê bibê Ademek mislê resulê selef
Yan tê bibe kulmek ax, li bin piyê seroka



Em zelîlin em feqîrîn, ya Resulallah meded
Em esîrîn pîr heqîrîn, ya Hebibellah meded

Derdê me derdek 'ecîb e, sed hewar nîne mûcîb e
Ne dewa û ne tebîb e, ya Resulallah meded

Derdê me derdek ğedar e, çar teref bûne neyar e
Hey hewar sed car hewar e, ya Resulallah meded

Barê me barek giran e, melce û mewa neman e
Me ne sebr û ne hedan e, ya Resulallah meded

Can û dil bûne birîn e, melhem û derman tunîn e
Karê me şîn û girîn e, ya Resulallah meded

Rûreş in em şermîkarîn, em bi nefsê qet nikarîn
Tevde 'eyb û tevde 'ar in, ya Resulallah meded

Xewf û tîrsa me nemaye, 'emelê me tev rîya ye
Zulmeta qelban xuya ye, ya Hebibellah meded

Me ne şer' û ne terîq e, me ne ehwal û heqîq e
Me ne zewq û ne rehîq e, ya Resulallah meded

Wacîbatê şer'ê rabun, munkerat tevde xuya bun
Pîr sebeb şêx û mela bun, ya Hebibellah meded

We'z û îrşad nakîn tesîr, me ne şerm e me ne îksîr
Me ne qaîd me ne tedbîr, ya Resulallah meded

Me ne dunya me ne dîn e, kes bî ehwalê me nîn e
Qelb û dil bûne birîn e, ya Hebibellah meded

'Edl û ta'et tevde rabun, zulm û 'isyan tev xuya bûn
Resm û ehwal tev fena bûn, ya Resulallah meded

Wey lî wî rih biqusîn e, rih û sinbêla-b mekîne
Ser zelût xel wî bibîn e, ya Hebibellah meded

Sofiyan ewrad hilandin, 'aliman tev 'ilm mirandin
Radyo telfîzyon civandin, ya Resulallah meded

Kanî ew adab û te'lîm, kanî ew îxlas û teslîm
Tev bûne terfî' û termîm, ya Hebibellah meded

Ya rebbî ev çî zeman e, dost jî keskî re neman e
Tevde bûne hîlevan e, ya Resulallah meded

Her çî sofî bûne zalîm, her çî zalîm bûne kazîm
Tev dibêjîn dîn nelazîm, ya Hebibellah meded

'Adet û exlaq neman e, qîz û pîrek bê heya ne
Bav û mêr bûne geda ne, ya Resulallah meded

Ğîret û namûs nema ye, paq û çeng û sîng xuya ye
Ferq û temyîz qet nema ye, ya Hebibellah meded

Reqs û kexxane xuya bûn, sînem û meqhî lîha bûn
Meysîr û meşreb dîda bûn, ya Resulallah meded

Ev çî kîzb û çî xîyanet, ev çî zulm û çî qîyamet
Ev çî tefrîq û 'edawet, ya Hebibellah meded

Her çî mezlum bûne mehdum, kî feqîr e maye mehrum
Her çî fadîl maye mehmum, ya Resulallah meded

Kengî carek em bibînîn, şûr lî ser van bihejinîn
Hukmê şer'ê dîs bibînîn, ya Hebibellah meded

Dîne me dînek buha ye, qaîde me Mustafa ye
Can û mal kirye fîda ye, ya Resulallah meded

Husn û zenna me qewînîn, hukmê şer'ê dem bibînîn
Serîyan em bifîrînîn, ya Resulallah meded

Seneda me pîr qewîn e, rebbê me rebbek Mu'in e
Ya reb imdadê bîşîne, ya Resulallah meded

Ya rebbî tu bî Mustafa kî, hukmê şer'ê pîr zû rakî
Me jî vî halî xelaskî, ya Hebibellah meded

Ez 'Alaüddîne dîn im, ya rebbî daîm hezîn im
Tevde derd im tev birîn im, ya Resulallah meded

Ev zemanek pîr ğerîb e, barê me barek 'ecîb e
Kanî Şah kanî Hebib e, ya Resulallah meded

Ger bibînîm dî heyatê, hukmê Quranê dîhatê
Dê bidîm ruh dî xelatê, ya Resulallah meded

Melce ê me Mustafa ye, himmeta wî pîr xuya ye
Karê me daîm wiha ye, ya Hebibellah meded

Ez dexîlê Xeznewî me, şahê Tağî-w Neclê wî me
Ez nebîm 'ar û 'eqîm e, ya Resulallah meded

Min jî ber feqr û neçarî, hatîme qesda dîyarî
Bûm dexîlê al û yarî, ya Hebibellah meded

Min yeqîn kir tevî 'eyban, vî dexîlî nade şerman
Xatîrê van çav û 'eynan, ya Resulallah meded

Şêx Alaüddîne Xeznewî

